

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

bîrnebûn

hejmar 81 | 2021



*Rastîyên ku kovara Bîrnebûnê li hemberî
jîbîrbûn û jîbîrkerî pêşkêş kirine...*
Mehmet Bayrak

Aborîya kurdên Anatoliya Navîn
S. B. Xell

Dîroka novelê û çend problemên wê
Hesenê Metê

Jana zimên
Mem Xelîkan

*Curukî,
xezîneya keşfnekirî*
Ihsan Türkmen

Dengê bavê min!
Hayrettin Güven

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 81 / 2021

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikaili, Seyfi Dogan, S. B. Xell,
Mehmet Bayrak, İhsan Türkmen, Mûlla Evîndar,
Adem Özgür, Mem Xelikan, Hesenê Metê,
Hizir Akbîna, Hizir Ateş, Hayrettin Güven,
Seyîdxan Anter, Nuh Ateş, Ehmed Milan,
Mehtab İdeli, Xizan Şilan, Feridun, Berivan Keskin,
İbrahim Korkmaz, Muzaffer Özgür, Rojvan Enes

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apectryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Bîrnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyay

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 10 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK - Almanyay 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baski: Apec-Tryck AB



Kurd û keşîşê ortodoksê ermen, 1873

Wêneyê berga pêşîn: Bekir Dari

Ez kêfxweş im! Êbat: 100 X 60 cm multîmix li ser hesin(sac)

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Ma fê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tînin, sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên veegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

Ali Çiftçi, <i>Ji birnebûnê</i>	4
M. Bayrak, <i>Rastiyên ku kovara Birnebûnê li hemberi jibîrbûnê pêşkêş kirine</i>	5
S. B. Xell, <i>Aboriya kurdên Anatoliya Navin</i>	12
Ali Çiftçi, <i>Şerê Cîbanê yê Yekem, komkujîya ermenîyan û kurd</i>	16
Îbrahîm Korkmaz, <i>Hecîyê Kêzikê</i>	24
Îhsan Türkmen, <i>Vîjdana Mexmikê</i>	28
Hesenê Metê, <i>Dîroka novelê û çend problemên wê</i>	31
Wolfgang Borshert, <i>Wegera ji zimanê almanî: Nuh Ateş, Nan</i>	37
Mem Xelikan, <i>Çend çarin</i>	39
Mem Xelikan, <i>Jana zimên</i>	40
Seyfi Dogan, <i>Helebce</i>	44
Dr. Mikailî, <i>Klamên şinê ji gundî Mikaila/Polatli</i>	45
Îhsan Türkmen, <i>Curukî xezîneya keşfnekirî</i>	47
Adem Özgür, <i>Ji xortekî Altîlarê kitêbeka lêkolînî</i>	50
Adem Özgür, <i>Bi Hamo Celikan re li ser muzikê</i>	52
Seyfi Dogan, <i>Qerfo, quto</i>	55
Ferîdun, <i>Henek</i>	56
Seyfi Dogan, <i>Helbest</i>	58
Hızır Akbina, <i>Etê</i>	59
Hizir Ateş, <i>Henek/Yaranî</i>	61
Hayrettîn Güven, <i>Dengê bavê min!</i>	63
Mûlla Evîndar, <i>Wênename, Holik</i>	67
Berîvan Keskin, <i>Senfoniya mirinê</i>	68
Mûlla Evîndar, <i>kurmancî</i>	69
Ehmed Milan, <i>Ji çarinên Omer Xeyam</i>	70
Mehtab Îdelî Hevpeyvîn "Hemû zmanên Kurdî ji Proto-Kurdî tîn û Proto-Kurdî 3770 salî ye" ..	72
Seyidxan Anter <i>Tiliya di kunmozê de!</i>	80
Xizan Şîlan, <i>Rêya dirêj</i>	82
Xizan Şîlan, <i>Rojên xurbetê</i>	83
Rojvan Enes, <i>Peyvê di xwedî hejmar in</i>	84
Muzaffer Özgür, <i>Cotek guli</i>	85

Ji bîrnebûnê

Xwendevanên birêz, pandemîya ku 2019an li Cîhanê belav bû, helbet li me jî tesîreka xwe ya mezin bû, ji derveyî tesîra li jiyana civakî, aborî me jî nas, dost, heval û hogirên xwe mixabin wenda kirin. Piraniya wan nas û hezkiriyên me bê xatirxweştin ji nav me bar kirin çûn! Em li vir di destpêkê de ji malbatên wan re dibêin: serî we sax be, êşa we êşa me ye jî! Xuyaye bi destpêkirina derzîya li hember pandemîya Covid-19an rewşa dunyayê ber bi aramiyekê ve diçe. Em hêvî dikin herkes berpirsiyariya xwe bizanibe da nebin sebeba belavbûna vê sawê!

Kovara me jî 1996-97an vir ve heta niha 80 hejmar hatin weşandin, li ser hev 8 cild kovar amade ne. Di van 24-25 salan de, li xerîbîyê qasî ku ji me hat, me cîh û warên kurdên Anatoliyayê, dirok, serpêhatî û folklorê ji herêmê di van hejmaran de berhev kirin û parastin.

Di van salên dawî de hejmara kesên bi kurdî dinivîstin zêde bûne û em vê di nav rupelên kovarê de jî her sal dibînin ku kesên, ciwan ê ku bi kurdî dinivîstin li nav hevkarên kovarê de cîh girtine. Ev jî helbet me dilşa dike û em hêvî dikin ev pêşdaçûyîna her berdewam be!

Kovar, bi taybetî jî yên wek kovara me ku her bi alikariya xêrxwazan ve tê weşandin bi xwendevanên xwe ve pêş dikeve û ji wan enerjîya xwe werdigre. Li kovarê xwedîderketin, belavkirin û xwendina kovarê dê enerjîyeka din bide hevkarên kovarê. Îro li piraniya welatên Ewropayê jî her gundekî Anatoliyayê insanên me bi cîh bûne. Em bi hêvî ne ku insanên me dê hîn zêde xwedî li kovarê derkevin û ji bo hîn zêde bê belavkirin daku bikaribe bigihê her malekê!

Mehmet Bayrak bi munesebeta 50-saliya nivîskariya xwe bi sernivîsa *Rastîyên ku kovara Bîrnebûnê li hemberî jîbîrbûn û jîbîrkirinê pêşkêş kirine...* li ser giringîya *Bîrnebûnê* nivîsiye.

Me jî bo bîranîna komkujîyên li hember xelkê ermenî û yên din ku di salên 1915-25an de pêk hatine bi ser nivîsa *Şerê Cîhanê yê Yekem,*

komkujîya ermenîyan û kurd jî çavkaniyên dirokî lêkolîneka kurt nivîsiye.

S. B. Xell li ser *Aboriya kurdên Anatoliya Navîn*, Îbrahîm Korkmaz, li ser kalê xwe *Hecîyê Kêzikê*, Îhsan Türkmen kurteserpêhatîyek bi sernivîsa *Vîjdana Mexmîkê*, Hesenê Metê di debareyê novelê de bi ser nivîsa *Dîroka novelê û çend problemên wê*, Nuh Ateş kurtehikeye bi almanî ya Wolfgang Borchert jî almanî bi navê *Nan wergerandiye* kurmancî.


Mem Xelikan, bi kurtenovela *Jana zimên* û bi helbesta *Çend çarîn*, Dr. Mikailî ji Polatliyê jî gundî Mikaila du *kilamên şînê* berhev kiriye. Îhsan Türkmen bi sernivîsa *Curukî, xezîneya keşfnekirî* berhemên rehmetyê Osman Alabay ku wek kitêb hatine çapkirin û bi navê *Destana Qamişê Qul* dide naskirin.

Adem Özgür, Hecî Çevîk û Hemo Celikan bi hevpeyvînên xwe herdu xort û berhemên wan bi me dide naskirin. Seyfî Dogan bi helbest, kurtehelbestên bi navê *qerfo, quto*, Ferîdun bi sê henekan, Hîzîr Akbîna bi helbesta *Etê*, Hîzîr Ateş bi *henek/yaranîyên xwe*, Hayrettin Güven bi sernivîsa *Dengê bavê min!* rêzenivîsek, bîranîn û diyaloga bavê xwe dest pê kiriye. Mûlla Evîndar *Wênename*, Holik, Berîvan Keskin *Senfoniya mirinê*, Ehmed Milan bi wergera ji farisî ji *çarînên Omer Xeyam*, Mehtab Îdelî bi birêz Beyhan Şahîn re li ser du berhemên wî, dîtî û gotinên wî yên li ser zimanê kurdî sohbeteke kiriye.

Seyîdxan Anter bi ser nivîsa *Tilîya di kunmozê de!* kitêba Amed Tîgrîs a bi navê *Mala Zalê û Teyrê Sîmir* dide nasîn. Xîzan Şîlan bi sernivîsa *Rêya dirêj û Rojên xurbetê*, Rojvan Enes bi helbesta *Peyv êdî xwedî hejmar in*, Muzaffer Özgür bi sernivîsa *Cotek gulî ku heketa jiyana malbata xwe ye* ev hejmara hatiye dagirtin.

Bi hêvîya ku ev hejmar jî li gor dilê we be bimînin di xêr û xweşîyê de heta hejmara bê!

Ali Çiftçi



Ji bona 50-saliya nivîskariya xwe Mehmet Bayrak ev nivîs ji kovara Bîrnebûnê re amade kiriye. Em li vir li ser navê hevkarên kovarê birêz Mehmet Bayrak di xizmeta wî ya 50 saliyê de nivîskariya wî pîroz dikin û nivîsa wî bi wergera kurmancî bi we xwendevanên rêzdar re parve dikin.

Red.

Rastîyên ku kovara Bîrnebûnê li hemberî jibîrbûn û jibîrkirinê pêşkêş kirine...

Mehmet Bayrak

Dibistanek ji bo civaka kurdên Anatoliya Navîn: Bîrnebûn

Di nav heft wargehên sereke yên erdnîgariya me de civata kurdên Anatoliya Navîn yek ji wan e. Bîrnebûn, kovara hunerî, dîrokî, erdnîgarî, wêje û çandî ya civaka kurdên Anatoliya Navîn, gava di payîza navîn ya sala 1996an de dest bi weşana xwe kir, li ser pêşnîyara hevalên redaksiyonê, dema ku min nivîsa wek manîfêstoya kovarê amade kir, (bi tirkî: "Çıkarken") min ev

tişt gotibû: "Weşanek periyodîk dê li ser civata kurdên Anatoliya Navîn di her aliyê civatê de û bi cîhereng re mijûl bibe, dê ne tenê nîrxên çandî yên ku vê civatê afirandine û li ber wendebûyîna ne rizgar bike, herweha ew ê di heman demê de bibe alîkarê xurtkirina nasnameya neteweyî ya vê civakê. Dîroka cîh û war, siyasî û civakî ya civaka kurdên Anatoliya Navîn; cîhê erdnîgarî, ziman, ol, bawerî û pêkhatiya çandî; huner û wêjeya devkî û nivîskî; kevneşopî û adet; berhemên etnografîk û folklorîk;

pêkhateya eşîrî û mezin; çavkanîyên dîrokî yên nivîskî û devkî; avahîya civakî û siyasî; koçberîyên navxweyî û derveyî; mijarên cihêreng ên wekî rewşa aborî û têkiliyên wê yên bi derûdorê re dê repertuara vê serdemê çêbike. ”
(*Bîrnebûn*, hejmar: 1/1997)

Û min lê zêde dikir: «*Ger Bîrnebûn ji bo xizmeta van mebestan alîkarîyekê bike, ew ê bigihê armanca xwe...*»

Ji ber ku min dizanîbû lêkolînerên ciwan ên ku hewl didin li ser kurdan lêbikolin, yan ji dîroka Kurdistanê an jî ferhenga zimanê kurdî dest pê dikin, lê bêtir ku temelekî rind daynin kitêb dadigirtin. Ji ber vê yekê jî, di gotara derketinê de, ya ku min nivîsî, min ragihandibû ku dema kovar dest bi weşanê bike, ew ê ji yekîneyên herî piçûk dest pê bike, dê li wargehên kurdan, li ser dîrok, erdnîgarî, tevgerên koçberîyê, pêkhateya aborî, civakî û olî, damezrandina çand-wêjeyê bisekinin, bi gotinek din, ew ê fonksiyona «monografiya gundan» derxîne holê û veng jî bû. Heta wê demê li herêmên tenê du dengbêj/stranbêj hebûn, ev hejmar piştî bi dehan zêde bû. Dîsa, di destpêka kovarê de ji sedî 90ê gotarên kovarê bi tirkî, ji sedî 10 jî bi kurdî bûn. Ev rêje di pêvajoyê de berevajî bû. Ji ber vê yekê, weke

ji pêşketin û fêrbûna gelek stranbêj/dengbêjan re bû wesîle, herwiha di aliyê nivîsandina kurdî de jî alîkarî kir ku nivîskarên nû peyda bibin.

Ev hewildana me ya ku em çand û nasnameya kurdên Anatoliya Navîn binin hişmendîyê, me bi amadekarîyên kovara Bîrnebûnê di 1996an de dest pê kir. Di heman demê de ev bû wesîle ji bo însanên herêmê ku di şert û mercên xwe yên taybetî de, xwe rêxistinî bikin, komele û weqfên herêmî ava bikin. Ji ber vê yekê, di vê pêvajoyê de, ji bilî pêşketinên cûrbecûr yên hunermendan, gelek komeleyên herêmî yên li diasporayê û li welêt dihatin vekirin. Dema ku wextê me li hev dihat, em beşdarî çalakîyên wan jî dibûn. Bo nimûne, yek ji wan *Festîvala Çandî ya Göl-Sağê* bû. Ji ber ku min nikarîbû ez beşdarî wê bibim, min ev peyama jêrîn şandibû:

“Hevalên hêja, dostên hêja; mixabim, ez nikarim beşdarî şeva we bibim, her çendî me pêşwext li hev kiribû û min jî pir dixwest beşdar bibim, lê ez nikarim, ji ber ku ez neçar im beşdarî weşana zindî ya Roj TVê bibim.

Ez bawer dikim hewildana me ya hişmendîkirina çanda kurdên Anatoliya Navîn, ku me di sala 1996an de bi

çend hevalan ve, bi derxistina kovara Bîrnebûnê dest pê kir, dê bi wê şeva şênawîyê re berhemeka xwe ya din bide.

Bîrnebûn, wek kovara çandî ya kurdên Anatoliya Navîn di qada xwe de yekem kovar e ku însanên herêmê ji ber şert û mercên xwe yên taybet, xwe bi rêxistinîkirinê de wekî piştbazî xizmet kir. Eger îro gelek nivîskar û hunermendên nû ji nav kurdên Anatoliya Navîn derdikevine, bêguman destpêk û derketina vê kovarê pareka xwe ya mezin heye. Ji ber vê sedemê, parastina kovar û weşanên weha pir girîng e. Bi zêdebûna van weşanan û belavkirina rêxistinên herêmî re, ez bawer dikim ew ê di nav civata kurdên Anatoliya Navîn de ronesansek were jiyîn.

Bi van hest û ramanan, ez şeveka serketî û watedar ji we re dixwazim.

Bi silavên dostanîyê. 27ê gulana 2005an”

Yek ji wan tiştên ku ez pêşbînî dikim ev bû ku hevalên ku beşdarî van lêkolînên xwe yên nivîskî bûn, tevahîya xebatên xwe wek pirtûk weşandin û gihandin pir kesan. Kovar bi piranî li Ewropa dihat amadekirin û li Swêdê dihat çapkirin. Ji ber vê yekê, belavbûna li welêt diwartir dibû. Jina min hin hejmarên pêşîn bi derfetên xwe hildan û bi xwe re birin

li Ankarayê teslîmê pirtûkxaneyê Toplum Kitabevîyê kirin ...

Ji alîyê min ve, xebata min a li ser Eşîrên Kurdên elewî li navenda Torosan “**Îçtoroslar’da Alevi- Kürt Aşiretler**”, ku di 2006an de hate weşandin, bi reneki encama xebata min a li vir bû. Piranîya nivîskarên kovarê ji kurdên Anatoliya Navîn in: ez, Ozan Temeli û helbestvan-nivîskar Hüseyin Kalayci ji kurdên navenda Torosan bûn. Hevalên mîna Rohat Alakom ji hebûn, ku ew ji Qersê bû, lê têkilîya wan bi civata kurdên Anatoliya Navîn re hebûn.

Wekî ku min di bernamêyên belgefilmên nivîskî û devkî yên bi min re hatine çekirin de ji çend caran gotiye: piranîya civaka kurdên Anatoliya Navîn ji kurdên herêmên wek Meletîyê, Semsûr, Riha û Agirîyê pêk hatine. Yên ku ji parêzgehên Melatîyê û Semsûrê hatine piranî bi eslê xwe elewî ne. Yên din bi piranî, bi eslê xwe êzîdî bûne, lê piştê derbasî mezheba fermî ya dewletê bûne... (Derbarê naveroka kovarê û fonksiyona wê de, binêrin Seyîdxan Kurij: *Bîrnebûn*, Nû Roj, Hejmar: 19/1996; M. Bayrak: *Dengê berxwedana li hemberî jibîrbûn û jibîrkirinê: Bîrnebûn*, Hêvi, hejmar: 50/1997; Nesimi Aday: *Ji bo ku neyên*

jibîrkin *Bîrnebûn*, Nû Roj, Hejmar: 35/1997; Müslîk Çelik: *Çar kovarên wêjeyî li çiyayên Navendî yên Torosan* (Îç Orta Toroslar'da 4 Yazın Dergisi), Evrensel, 15 / 16.9.2007; M. Bayrak: *Bîrnebûn dibistanek e (Bîrnebûn Bir Okuldur)* hevpeyivîn ji hêla Özgür Celikanî, Bashaber, 26.10.2015 (*Kürt Bâtînişinde Kutsal Metinler içinde*, s. 787–790); Adem Özgür: *Bîrnebûn a Kurdên Anatoliya Navîn*, BasNuçe, hejmar: 89/2016; İbrahim Bulak: *Ansîklopedîya Kurdên Anatoliyê: Bîrnebûn*, Öz–Po, 8.4.2016; Rohat Alakom: *20 salîya Bîrnebûnê*, BasNûçe, hejmar: 36/2017).

Li dijî jibîrkinê ”Bîrnebûn” û ”monografiya gundan” ...

Weke ku İbrahim Bulak di roportaja bi xwedan û emekdarê kovarê, Ali Çiftçi re nivîsiye, Bîrnebûn bi gotineka din wek ”*ansîklopedî*” ye. Di vê kovarê de min bi salan bi nivîsên lêkolînî piştgirî kir. Her çend carinan min li ser kesayetiyên kurdên ji Anatoliya Navîn lêkolînên dîrokî kiribin jî, ez bêtir li ser herêma Navendî ya Torosan sekinîm. Ji hejmaraya yekem dest pê dike. Min bala xwe da pirtûkên gerê yên gerokên rojavayî ku berê li herêmê geriyan, qetliamên Osmanî yên ku li herêmê

qewimîn, berhemên folklorî û edebî yên herêmê û ştrûktûra eşîrî. Û min vana di pirtûka xwe de berhev kiriye, ya ku min li jor bi nav kir.

Ji ber ku di lîteratura zanistiyê de bêyi lêkolînên bi navê ”monografiya gundan” ne mumkun bû meriv vê herêma efsanewî, Navendiya Torosan fam bike, heta niha jî: sîftê di dewra osmanîyan de û dîv re jî di dema niha ya cumhuriyetê de pirlîstik hatine kirin û hîn jî tîn lîstin. Bi rastî, li vê herêmê gelek qetliam pêk hatin, beşek girîng a nifûsa vê herêmê ji baweriyên ne-îslamî ne. Bi plana *Şark Islahatê* re, ku bi dizî hate amadekirin û di 1925an de hate bicîkirin, ev herêma **Berferata** li rojavayê Firatê wekî herêma pêşîn hatibû hilbijartin ku were asîmîlekirin.

Herêma Navendiya Torosan (*İçtoroslar bölgesi*) navenda wê Meraş e û xeta Adıyaman/Semser-Melatîya-Sivas-Kayseri-Antep-Adanayê werdigire.

Herêmeke pirlîstîng e ku di dîrokê de bûye dergûşa gelek çand û şaristanîyan. Di lîteratura rojavayî de ev herêm wekî ”*Erdnîgarîya qewîman û çandan*” tê binavkirin. Lê bala xwe bide pirtûka ”*Dîrok û Erdnîgarîya Maraşê*” di sala 1923an de, di

yekemsala komarê de ji hêla Besim Atalay ji Uşakê, dîrektorê perwerdê ve hate weşandin ku wî demek dirêj ji wekî parlamenter kar dikir, lê ev pirtûk bi tevahî ji raberkirina vê rastîya dirokî û civakî dûr e. Li aliyê din, ji Elbistanê akademîsyen Prof. Dr. Refet Yinanç, Dr. M. her çend ew weşanek TTK bû, ji hêla cûntaya 12ê Îlonê ve hate qedexekirin, ji ber ku ew di dirokê de rastiyên herêmê radixe ber çavan.

Ji aliyek din ve, di sala 1979an de lêkolînerên alman Peter Andrews û Rudiger Benninghaus bi zimanê îngilîzî li Almanyayê bi navê *"Ethnic Groups in the Republic of Turkey"* (Komên Etnîkî li Komara Tirkîyeyê) lêkolînek weşandin. Di vê lêkolînê de li herêmê tenê nêzîkî 20 gundên kurdên elewî cih girtine. Di lêkolîna ku min di kovara *Bîrnebûnê* de weşand û di pirtûka xwe ya *"İçtoroslar'da Alevi Kürt Aşiretler"* (Eşîrên Kurdên Elewî li Navenda Torosan) (Ank. 2006) de ji cih girt, ev hejmar li ser bingeha gund û zozanan digihê 400î. Û lêkolîna bi zimanê îngilîzî ku min li jor bi nav kir di çapa xwe ya duyemîn a 2002an de ev heman zanyarî cih girt. Mixabin, berevajî encamên ku di pirtûka jorîn de hatî berhevkin,

di xebata bi navê doktorayê ya ku TTK di van salên dawî de weşandiye, hemû elewîyên Pazarcikê wekî *"turkmen"* hatin pêşkêş kirin!...

Rûmeta hevgirtina bi Med-TVê re ...

Min bi salan, di weşana sereke ya dîtîni û devkî ya Tirkîyeyê TRTê de kar kir. Wek rewşenbîrekî û kesekî ku girîngîya van sazîyan bi jîyanê fam kirî, min damezrandina televîzyona bi navê Med-TV ya kurdî bi heyrani pêşwazî dikir. Lêbelê, dewleta tirk, dît ku bandora televîzyonê di nav ranya giştî ya kurd de mezin e, dest bi êrişê kir û ji şikandina şanikên satelîtê yên li ser banîya bigrê heta hewildanên xwe yên navneteweyî ku vê organa weşanê bêdeng bike.

Di vê merheleyê de, parlamenterê HEPê yê berê Mahmut Kilinç, ku neçar bû biçe sirgûnê, bang dikir û hem ji bo pêşilêgirtina van êrişan û hem jî di siyaseta weşanê ya ku dê were şopandin de alîkariya min dixwest. Kilinç, di nameya ku wekî serokê lijneya şewirmendiyê di 7ê zivistana navîn a 1998an de şandiye, bi kurtî ev tişt digotin:

"Ez hîlbijartina we wekî endamê lijneya şewirmendiyê ya MedTVê pîroz dikim û di karê we de serkeftinê dix-

wazim. Rastîya ku weşanên MedTVê divê hîn dewlemend û bigihêjin asteka bi kalîtetir diyar e. Yek ji erkên herî bingeîn ên lijneya şewirmendiye ev e ku beşdarî pêkanîna vê hewcedariyê bibe. Ne hewce ye ku meriv behsa şert û mercên giran bike. Lêbelê, digel hemû zehmetiyan ku tene zanîn, di encama dilsoziyek mezin a gelê me de, MedTV bi berdevamiya weşana xwe gihistiye roja xwe ya îro. Bi rastî, ev sazî, hem ji bo şoreşa Kurdistanê bigihê armanca xwe û hem jî ji bo Tirkiyeka demokratîk û şaristanî fonksiyonek dirokî dibîne. Ya girîngtir, ew ne tenê ji ronakbiriya gelê Kurdistanê re xizmetê dike, di heman demê de dibe alîkar ji bo afirandina şert û mercên ku ji bo bi hev re jiyaneka aştiwaz a gelên li herêmê pêwîst e. Divê bername û projeyên nû bên kirin ku hêviyên ji wê dipên baştir pêk werin ... ”

Wek desteya şewirmend me wê demê çend civîn kiribûn û di rojnameya Hêviyê de girîngiya vê televîzyonê bi sernivîsa ”Wateya MedTVê ...” û di bin sernavê ”Nêrîn û pêşniyarên li ser weşanên kurdî” rapora ku min li ser daxwaza MedTVê amade kiribû di quncika rojnamê de cih dabû. (Binêrin M. Bayrak: *Pirsa*

kurd û çareserîya demokratîk; Özgü yay. Ank. 1999, r. 405–407).

Li vir bêguman, ne mumkun e ku meriv li ser girîngiya MedTVê û di derbarê ”Rapora raman û pêşniyarên weşanên ku divê bên kirin” de di stûneka rojnameyê de binivîsîne. Di raporê de; digel mijarên ku bêne vegotin, pêşniyarên li ser şopandina siyaseta redaksiyonê jî cih digirt. Ji ber vê yekê, di derbarê raporê de ji bo fikrek bê dayîn, em ê tenê beşa gotina pêşî û dawiyê bidin:

”Weşanên televîzyonî rêbaza weşangeriyê ya herî jêhatî ye ku mirovan heya nuha pêş xistiye. Ji ber vê yekê, televîzyon îro amûrê ragihandina girseyî ya devkî ya herî bibandor e. Ev taybetmendi ji ber ew hem amûreka ragihandinê ya ditînî û guhdariyê ye.

Ji bo xelkek bikaribe nasname û nixrên xwe yên neteweyî biparêze, bi cihbike û pêşbixe medyeya nivîskî û devkî amûrên herî bibandor in. Bêguman, pêdivî ye ku em amûr û alavên weşanê yên din, nemaze pirtûk û kasetan lê zêde bikin. Ji ber ku dema organek weşanê ya devkî mîna bandorek derbasdar tevdigere; weşanên mayînde yên din ên ku dikevin malekê û li pirtûkxaneyekê tene hîlanîn, her tim şopan li derûdora xwe dihêlin. (...)

Di van weşanan de nabe ku tu rêxistinek neteweyî ya kurd, sazî û kesên dost ji derve bihêlî. Ev hem ji bo argumana rêxistîkirina netewbûnê derketiye holê pêdivî ye, û hem ji ji bo pêbaweriyê. Ekran rûyê diyardeya weşanê ye ku li temaşevanên tê xuyakirin. Ev rû bi gelemperî ji hêla rojnemeyan û pêşkêşvanan ve tê temsîl kirin. Ji ber vê yekê, peyama we çiqas rast be, materyalê we çiqas bi heybet û balkêş be jî, eger "pêşkêşkirin» xirab be, hûn ê nekaribin ew sîda jê tê hêvîkirin, werbigirin! Ji ber vê yekê, pêdivî ye ku girîngîyek mezin hebe ji rojnemeyan û pêşkêşvanên ku pêşangeha weşana televîzyonê ne. Ji bo wê divê meriv li gel paşxaneyê çandî û destkeftên pîşeyî, her weha girîngîyeka mezin bide xuyakirina wan jî.

Eger çapemenîya kurd a devkî û nivîskî dixwaze bi têra xwe xizmeta gelê kurd bike, pêbawer û mayînde be, divê ew ne tenê îmaja ku ya tevgerekê ye bide, divê îsbat bikin ku ew organên weşanên neteweyî yên milkê gelê kurd in..."

Wegera ji tirkî: Ali Çiftçi



Ji berhemên M. Bayrak çend nimûne.

Aborîya kurdên Anatolîya Navîn

S. B. Xell

Li ser koçkirina kurdên Anatolîya Navîn hetanî niha pir fikir hatin gotin, gelek analîzên dîrokî, sosyolojîk hatin nivîsandin. Di vê dîroka nêzikî ya dused salî da jiyana civakî, aborî şûneka muhim digirê.

Çima şûnguhêrî kirin, çima ji Kurdistanê veqetîyan, bar kirin, çima mecbûrî koç kirin, debara xwe bi çi dikirin? Van pirsana tim heşên me meşxûl kirine. Niha nêzikî nivî kurdên Anatolîya Navîn (KAN) li Ewropayê dijîn, kurikên wan rojekê van pirsan meraq bikin, ya jî niha dipirsine: “Dê û bavên me bi çi awayî hatin, wexta bar kirin Ewropayê hal û debara, karûbarê wan çing bû?”

Di jiyana KAN da çar tişt balkêş in. Şivanî, hêştirvanî (devecilik), cotkarî, hîn paşê jî kamyongerî (kamyonculuk). Ez niha dixwazim li ser van çar tiştan dawestim. Di dest min da tu belgeyên resmî, nivisandî, statîkî tune. Ez dixwazim vê mijarê bi fikir, aşîniyat, dîtin û tecriba xwe tehlîl bikim.

Şivanî¹

Rind tê zanîn ku kurdên hatinî Anatolîya Navîn koçer bûn. Ji Semsûrê, ji Gahteyê, ya jî ji aliyê din î Feratê bi kerîyên pêz va bi rê ketin, hatin li çol û banîyên navbera Konyayê û Heymaneyê cih girtin. Va herema fereh û bexudan ji çêre û gera kerîyê pêz re bi kêr û musayit bû. Hin eşîret, ya jî pir merî û malbat xudan kerîyê pêz bûn. Eşîretên mezin li çol û banîyan belav bûn ji heywanên xwe re mexel, fêz û hevşo girtin. Eşîretên

hîn biçûk, ya jî yê ku ji eşîretên xwe veqetîyanî dihatin boyî şivanîyê li dor wan cih digirtin. Wek Dr. Mikailî nivisandî, dewleta Alî Osmanîyê ji ji vê wezîyetê memnûn bû. Him ji şerê li nav kurdan, di navbera yörük û kurdan, ji îsyanan xelas dibû, him jî ji van eşîretan bac/vergi (Dr. Mikailî) distand. Baş tê zanîn ku van kurdan boyî xwedîkirin, çêrandin û pirkirina pêz gelek jêhatî û hoste bûn. Di demeka kurt de, di ticareta pêz da jî xwe nimandin, bûn tedarîkdarên bazar û mezbaha Stenbolê. Kerîyên

¹ ço + ban farisî ço+ wan kurdi, ço : kalîn deşnek, şiv : ince deşnek

pêz dajotin Stenbolê û li wir difrotin. Wek tê gotin, xwedanê kerîyekî ji Încovê sewa kerîyê xwe yî berxan biha xwestîye negirtîye, ew kerîya salekê li dora Stenbolê çêrandîyê qert kiriye, bi wê malbatê re dibêjin “Mala Qerto/ Kartlar.”² Ji 1835an bi şunva jîyana şûnwarî/meskûn (mecburi iskan kanunu 1835) KAN bi alî zengînî û xwedîkirina pêz li vê heremê hetanî 1970–80an tim bi serdestî û li pêş e.

Hêştirvanî

Hêştirvanî boyî transportê wasayîteka girîng e, li dora 1930–40 hêdî hêdî ji holê radibe. Dîsa gund û eşîreten mezin, malbatên xwedîheyî xudan qenter in (qenterek 10 hêştirin). Ji qenteran karwan çêdikin. Ekserî ji gola xwê, xwê, ya jî dexl/tahil neqila rojavayê Tirkîyê dikirin, li vegeerê bi xwe re malê xwarînê (çîr, mûj, încîr, sabûn, helaw, mit) dianîn û difrotin. Xudan qenteran ji xwe re hêştirkêş radigirtin. Hêştirvanîyê kîngê, bi çi awayî dest pê kiriye em pir nizanin. Koçeran boyî barkirina xwe hêştir û ga helbet bi kar anîne, lê kîngê wek qezenc/karekî

dest pê dike ne bellî ye. Taybetî Gola Xwê teşwîq û sebebek e. Dihat gotin ku çend eşîretên kurdan (muhtemel Xelikî) bi leşkerên Îbrahîm Paşa³ re ji dora Heleb û Reqayê hatin cîhwara Konyayê û bi xwe re qenterên hêştiran anîn.

Cotkarî

Cotkarîya kurdan li vê çola fereh li dû mecbûrî iskanê, girtina şûnûwar li dora 1850 dest pê dike. Berê bi tîran û gayan erdê xam û bejî rakirine û rişandine, taqribên 1930/ 40 şunva bi hespan, bi pullux û makîneyan zevî çandine, çînine dûra bi traktor, makîneyên xerman û kayê, bi alet û cîhazên modern cotkarîya xwe berde-wam kirine. Ji ber îqlim û avûhewayaya ziwa giranîya wan li ser rişandina zad bûye. Malbatên ku bax û baxçeyên xwe heyî, pir caran merîyen vî karî bikin ji der anîne. Cotkarîya kurdan li herema Konyayê û Anqarê tim li jor bû, boyî wê jî kurd li piyasa esnaf û bazarê da bi dil û xatir bûn.

Bi erdrakirinê, cotkarîyê bi xwe re axatîyeka nû ji peyda kir. Axayên berê

² Malbata Kartan li Konyayê, heta li Turkîyê tê naskirin, hen dibêjin ew kalê me yî li Stenbolê pez qert kirî H. Ahmet Kart bû, hen jî dibêjin bave wî yanî bavkalê me gîştikan bû.

³ Îbrahîm paşa lawê Mehmet Ali paşayê Misirê (walî, ya jî hidiv) bû, Mehmet Ali li dijî Osmanliyan serî hilda, lawê xwe Îbrahîm bi leşkerekî / ordu mezin şand ser Stenbolê, inglîz û fransîz ketin navberê û mudahîl bûn, Îbrahîm paşa li nêzikî Konyayê sekinandin. Dibêjin hen kurd bi leşkerê re, ya jî li pişt vê seferê hatin Anatoliyê, min liser vê vegotin û kilam ji bihistin, pir jî ne emîn im, min va texminî nivîsand.

li hemberî Dewleta Osmanî ji bacê, îdara eşîretê û agahdarîyê mesûl bûn, serok û berpirsiyarên eşîretê bûn, zilm zordestî nedikirin. Axayê nû, ekserî bi fersenda Şêrê Cihanê yê Yekem qelew bûn, piştî xwe dan îdara cumhuryetê û siyasetmedaran, nêzikî 60–70 salî hukim ajotin. Hukumeta Menderes sewa van axana li hêla CHP bûn reforma erdan/Toprak reformu⁴, 1959 /60 qismen tatbîq kir, paşîya van anî. Van axana li Kurdistanê, li Turkîyê (ekserî lîrojawa, Ege) derketin holê, piranî li erdên Ermenî û Roman bûn xudan, bi piştgirtîya CHP qelew û xurt bûn li ser gelê xizan zilm û zordarî, derebegî kirin. Wek tê zanîn van axayên cumhûriyetê yê feodal li Kurdistanê xudan gund, li rojava Turkîyê, Çukurovayê li derên din xudan araziyez mezin bûn; pale û xebatkarên xwe ji Kurdistanê, ji goçmenan, ji tirkên Anatoliyê tîmîn dikirin. Va sîstema hîn ji ranebûyê.

⁴ Qanûna Reforma erdê/axê sala 1946 ji alî CHP va hat qabûl kirin, hedef û armanca Chp araziyez dor çemê Menderesê bû, Partiya Demokrat DP, li Anatoliya Navîn li dij axayên li alî Chp tatbîq kir.

⁵ Muhacereta kurdan ya yekemîn ji Serhedê (Van, Agirî, Erzurum) li dûw şerê nav Osmanîyan û Rusan bû, ya dudîyan ji li dûw şerê cihanê yekemîn dîsa ji van bajaran dibe, bi hezeran kurdên cihwarî /yerleşik tîm merkeza Konyayê bajar û gundên doralîya Konyayê, kurdan ji van hemwelatîyên wek mihacir bi nav dikirin. Balkêş e ku dewletê ew kurdên sirgûna Dersim û serhildana Şex Saîd (mutagallibe) neanîn mintîqa kurdên Anatoliya Navîn. Belkî ew ji siyaseteka asimilasyon û înkariyê bû. Mihacirên nas li Konyayê Riza oğulları, Ağrılılar, Halıcılar (Mehdi Halici / Cemşid Bender, Fevzi Halici (eski mebus) Mihaciran bi kurdên Anatoliyê re her tîkiliya xwe hebûn kurditiya xwe parastin, mixabin îroj piraniya wan asimilê bûne. Li ser asimilasyonê ferqîya van herdu koman/gruban civakî / sosyolojik çî ye ez dixazim caraka hîn cuda analiz bikim û binivîsim.

Axatîya li gundên Anatoliya navîn demeka pir nederê ajotibe jî, bi keser, girî û eş tê qalkirin. Axayê gundan xelkê xizan, bêkes, kurdên sirgûn û revîyên 93ê, kurdên ji Şêrê Cihanê Yekem revîyanî, yanî bi gotina hîngê mihacîr⁵ bindest kirine bêyî heq û hûquq şuxulandine, li wan zilm û zordarî kirine. Ji 1960an hetanî 1970 di karûbarê cotkarîyê da ked û bereket, livîn û pêşvaçûyîn xuya dike. Lê bi serûbanîya Ewropa û kamyonvanîyê va pêşvaçûyîn berjêr dadikeve.

Kamyonvanî/Neqliye/Şofertî

Kurdan li meslek û zeneatên destan wek dirûnkarî, hesinkerî, merengozi, dartraşî, berberî pir hewes nedikirin. Li pêşî ew karana ji ermenîyan re, paşê ji tirkan re mîna ku li cî hîştibûn. Belkî siyaseta dewletê li vî alî bû, nedixwest ma kurd li merkezan (Konya, Cihanbeyli, Haymana, Kulu, y.d.) bi hev digîhên, bi yek bin. Pir hendik kurdên diçûnî bajêr bi bezirganîyê/ticaretê re meşxûl dibûn,

va esnafên biçûk bazar û pîyase li cem gundiyeên xwe digirtin. Kurdan nedixwestin li bajaran jiyaneke belengaz û pêrîşan, xizan, bêyî kâr û xebat bijîn. Li van salan ji qeza û gundên tirkên koçeka mezin ber bî ekserî Stenbol û bajarên mezin dibe jî, kurdan ew tercîh nekiriye. Taybetî zikên xwe li gundên xwe têr dibû û debara xwe bi xwe dikirin, boyî vê jî şîyeseta asîmilasyonê di wan kar nekir. Lê li Konyayê jî gelê kurd nifûseke mezin digirt (mihacîrên 93 û 15ê, nifûsa Konyayê 200.000—250.000 kurdan tahmînî 20/ 30.000). Mihacîr hin berjêr, ji der dihatin hesibandin, belengazî, xizanî, qeraxa bajêr mayîn para wan bû. Taybetî van kurdan jî nedixwestin di debara xwe da bindest û pêrîşan bin, dixwestin li ser lingên xwe bin, boyî wê qîret dikirin ku li bazara genim, bazara sebze û mezbahê kar û xebatan bi dest xwe xin. (li 1965—66 navbera kurdan û bozkişîyan şerên mezin derketin. Rojnameyan hingê wek Dağlı /Doğulu kavgası lanse kirin û nivîsandin.)

Dîmen birêçûn û pêşvaçûyîna KANê girêdayîya rewşa tevayî Turkîyê ye. Her ku li Turkîyê cotkarî, ajaldarî, zîreat berjêr, ya jî paşda çû

serûbanîya koça Ewropayê, meraq û hewesa şoferîyê dest pê kir. Sermaya komprador çî awayî ekonomîya Turkîyê bin destê xwe xist, kir bin hukum û kontrola xwe. Ew mijareka tê zanîn û analîz û rexne bûye. Kurd jî bi ber vî bayî ketin. 1960 şunva Firma M.A.N. Mercedesê û çendikên din montajê xwe li Turkîyê vekirin û çekirin. KANê jî sermaye ji kerîyê pêz û cotkarîyê gihandî hev derbasî naqlîyê kirin, ji 1970ê şunva qezeyên wek Cihanbeyli, Kulu, Yunak bi piranîya kamyonan li Turkîyê nav dan, hetanî 1990î bi kamyon û tankeran (fuel-oil) neqlîyata ji Îranê û Iraqê dest şoferên KANê da bûn, ya jî paran wan di vî kârî da gelek xuya dikir. 1990î şunva sermaye û heyîya ji gundan birinî û dakirinî naqlîyatê helîya, teva bû. Pir xwedîkamyon destvala çerx bûn gundên xwe, ya jî şofer û kamyongerên ciwan dev dane Ewropayê. Sebaba êrîşa duyemîn û sêyemîn ya KANê ber bi Ewropayê yek jî va bû.

Min van dîtîn û tecrîbê xwe wek kurdekî ji aliyê Konyayê anî bîra xwe û xwest bi we re parva bikim, xasma neslên ciwan biçîkî agahdar bikim.

Şerê Cîhanê yê Yekem, komkujîya ermenîyan û kurd

Alî Çiftçî

Di 24ê bihara navîn a 1915an de polis û eskerên osmanîyan li Stenbola îro 600 rewşenbîrên ermenî digrên û gîştikan di heman demê de dikujin. Ev dibe deştêpêka qirkirina ermenîyan. Piştî wê salê, ji du mîlyon ermenîyên ku wê demê li nav sînorên Împeratorîya Osmanî de dijîyan, bi vî rengî 1,5 mîlyon kes hatine kuştin.

Ji wê demê ve zêdetirî sedsalekê derbas bûye û tiştên ku bi rastî jî bûne hîn jî li ser nakokî hene. Piraniya siyasetmedar û dîroknasên

tirk qirkirina ermenîyan înkâr dikin û dibêjin: tiştên bi serê ermenan de hatine mirov nikare weke jenosîd bi nav bike. Ew kuştina ermenîya înkâr nakin ku gelek ermenî hatine kuştin, lê dibêjin, ne bi qasî 1,5 mîlyonî ye. Her wiha diyar dikin ku li herêmê şerekî mezin rû da ye ku gelek kesan jiyana xwe ji dest dane.

Piştî ku şerê cîhanê di 1914an de dest pê kir, tirkên osmanî aliyê Almanya û Avusturyayê hilbijartin. Rusya, Îngilîstan û Fransayê ermenî li hemberî tirkan teşwîqê serhildanê



Ermenîyên ku tavilê nehatin kuştin bi *meşên mirinê* yên dirêj ve hatin derxistin.
Çavkanî: *Populärhistoria*, Foto: 1915 © Gamma/IBL

kirin. Ji ber vê yekê argûmana tirkan ev e ku dibên: wê demê pêwîst bû, ji bo pêşî li hevkarîya ermenîyan a bi rûsan re bê girtin, ji herêmê, dersînor bikin. Û komkujîyên rûdane, ne li ser bingeha biryarên hikûmetê, encama kaosa şer û biryarên lerleşkerên herêmi bûne.

Li gor dîtina ermenîyan ku tê de hevdengîyek berfireh di navbera dîroknaşên cihanê de ji heye, ew ji bi awayekî din tam beravajî ya tirkan e: – Piranîya ermenîyan rûniştvanên parêzgehên rojhilat bûn, di heman demê de gelek doktor, karsaz û siyasetsmedar li Stenbolê dijiyan – tirkan ew wek ajanên ji bo berjewendîyên rûs û birîtani diditin.

Îhtîmal e ku piranîya ermenîyên xiristîyan piştgiri dan Rûsyayê. Gelek ji wan di dema şerê rûs û osmanîyan yê sala 1877–78an de, dema ku Tsarê Rûsyayê hinek herêmên wek bajarên Qers, Ardahan, Artvîn û hinek deverên Erzirûmê kiribûn bin kontrola xwe, rêxistinên ermenî li aliyê Rûsyayê şer kiribûn. Ji bo ermenîyan, Rûsyaya xiristîyan li dijî tirkên misilman parêzvan bû. Ji ber di dawîya sedsala 18an de piranîya xelkên xiristîyan ên Balkanan xwe ji desthildariya tirkên osmanî azad

kiribûn, hêvîya ermenan ji ew bû ku xwe ji desthildariya tirkan azad bikin.

Divê li vir em vê ji destnîşan bikin ku wê demê yên ku împatoriya osmanîyan bi rê ve dibin, jon tirkên netewperest in, bi fikrên ku divê hemû kêmnîetew li Tirkiyeyek yeketnîkî û yekbûyî de yan bên asîmîlekirin an ji bêne tune kirin. Armanca wan Tirkiyeya nû ya homojen ”tirk” bû. Gava ku asîmilasyona bi zorê û veguheztina bi zorê ya hindikahîyên gayrî muslim ên welêt zû bi zû encam nedada, li şûna wê komkujî û zordarî bû modela wan a çareseriyê.

Jon tirk di sala 1908an de desthilatdariyê digrên

Hikûmetek nû ya **jon tirkan** piştî darbeyek sala 1908an li Împatoriya Osmanî hate ser kar¹. **Jon tirk** bi giranî ji efser, bijîşkên leşkerî û siyasetsmedarên netewperest pêk dihatin ku li dijî Sultan Abdulhamîdê duyemîn bûn. Talat Paşa (Wezîrê karên navxweyî û Wezîrê mezin yê pêşerojê), Enver Paşa (wezîrê şer) û Cemal Paşa (Wezîrê deryayî û waliyê Sûriyê) pêk dihat.

Van hersêyan, digel çend aqilmendin din ên wek Mehmed Ziya Gökalp, ku yek ji hîmdarê

¹ <https://www.levandehistoria.se/fakta-fordjupning/folkmordet-1915>

netewperestên tirkan e, navika hundurîn a rejîma jon tirka pêk dianîn û di dawîyê de berpirsiyarê plansazî û pêkanîna jenosîda li Osmanîya Turkiyê bûn. Ev endamên komîteya *Ittihat ve Terakki Cemiyetiyê* bûn. Di 1913an de li Tirkîyeyê desthilatdarîya împaratorîyê tevayî digrên bin kontrola xwe. Wan hêzên eskerî û polis ji hemû kesên dilsoz paqij kirin êdî dikaribûn jenosîdekê pêk bînin.

Bi rêxistineka taybet ya bi navê *Teşkilatî Mahsusa* ("rêxistina taybet" ya tirkî) di nav wezaretên Osmanî de xwedîyê otorîteyekê bû, ku ji hêzên taybetî pêk dihat û berpirsê kontra-îstixbaratê û pêşengê hêzên ewlekariya jon tirka bû. *Teşkilatî Mahsusa* di heman demê de berpirsiyarê pêkanîna qetlîamên li ser gelê ermenî bû. Ev rêxistin ji bilî ajan û leşkerên perwerdekirî, ji qetîl, çete, tecawizkar û sûcdarên din ên ku ji zindanan hatin berdan, pêk dihat ku yekîneyên taybetî, yên ku beşdarî komkujîya ermenîyan bûn.

Li dijî argûmanên dirokzanên tirkan sedemên komkujîyên herêmî, gelek delîl hene ku ne tenê ermenî, ew hemû kesên ku ne misilman in, gayrî muslim bi talîmata bilindciyê Împaratorîya Osmanî hatine

kuştin. Her wiha dadgeheke leşkerî ya Osmanîyan piştî bi dawîbûna Şerê Cîhanê yê Yekem, di derheqê serkirdeyên sereke yên jon tirkan, ên di qirkirinê de cîh girtine di şûna ku bîr cezakirin, piraniya ji wan ji bo ku ji cezayên xwe xilas bibin alîkariya wan hatiye kirin.

Ji cîh û warên xwe bi dûrxistin, surgunkirin û komkujîyên komî di valahîyeka şer de nehatine pêk neanîn. Şerê Cîhanê yê Yekemîn ji havîna navîn a 1914an destpêkirîye û di zivistana pêşîn de Împaratorîya tirkên osmanî ketiye nava şer li aliyê Almaniyayê. Împeratorê alman zext li Konstantînopole kiribû ku beşdarî şerê li dijî Rûsyayê bibe. Li hemberî vê ji tirkan re soz hatibû dayîn ku Almanya wê sînorê rojhilat ji bo tirkan sererast bike. Piraniya welêt li wê demê, ji xelkên ne misilman ve, wek ermenî û xiristiyanên din; sûryanî, asûrî, grekî, pontus û kurdên êzîdî ve pêk dihat. Wekî din, qûnaxa bakurê rojhilat – tevî bajarên weke Qers û Erziromê – ji aliyê Tsarê Rusyayê ve dihat kontrolkirin. Di dema derketina şer de ermenî li her du aliyên sînorê nevbera împaratorîya osmanî û ya rûsî dijiyan.

Komkujîya herî mezin di destpêka meha bihara 1915an de bi biryara ber-



Zarokên ermenîyan ên sêwî mabûn ji bo ku bên asîmîle û tirk kîrin di mektebên taybet de hatibûn berhev kirin. Ev wêne di 1918an de li Merzîfonê hatiye girtin.

Çavkanî: *Populâr Historia*

pirsê wezereta şer yê wê demê Enwer Paşa ku emir dide, li Erziromê eskerên bi eslî xwe ermenî ne, ji qîşleyên eskerîyê bên dûrxistin û bêne kuştin. Bi dû vê biryarê re di 24ê bihara navîn de li Konstantînopolîsê elîta siyasî û çandî ya ermenî tên kuştin.

Qonaxa din a qirkirinê di dawîya biharê, gulana 1915an de dest pê dike û heta havîna 1916an dewam dike. Pêşî biryara dersînorkirinê tête weşandin. Ermenî piştî bi zorê ji malên xwe hatin kîrin. Mêrên ji 12 salî wêdetir ji nava civakê hatine derxistin û bi guleyan hatin kuştin. Piştî jin, zarok û kesên salmezî di "meşên mirinê" de bêyî xwarin û vexwarin ber bi Helebê û Dêra Zorê, ber bi çolê ve

hatine birêkîrin. Piranîya enfalkirîyan eger ji alîyê eskeran ve bi lêdanê yan jî bi guleyan nehatibine kuştin jî ji birçîna, ji tîbûn an jî ji westanê mirîne. Hin zarok hatine revandin, kîrîne misilman û radestî malbatên tirk an kurdan hatine kîrin. Destavêtinên li jinan hatiye kîrin.

Dewletê wê demê ji bo kiryarên şidetê pêk bînin hin kes, bi şertê ku di beşdarî komkujîyan de amade bibin, ji girtigehan hatine berdan û cilên yekrengî li wan kîrîne. Di bin kontrola *Teşkilatî Mahsusa* de. Her wiha di nav wan de hinek endamên ji eşîrên kurdan, ereban, ermenîyan û ji gelên din jî cih girtine. Dewletê wê demê bi derxistina gelek fermanan



Nexşeya komkujî û sirgûnan

Çavkanî: www.folkmordet1915.se/kartor.html

rê li ber wan hemû kesên ku xwestine destê alîkarîyê dirêjî malbatên ermenan bikin bi cezayê giran tewanbar kirine. Li hember van kiryarên dewletê dişan hinek malmezînen kurdan ên wê demê, wek: Şêx Seidê Pîranî û Şêx Ubbedulahê Nehrî û gelekên din ev malbatên ermenî yên ku xwe avêtine bexta wan ji qirkirinê xilas kirine. (Ji bo hîn agahîyên zêde hûn dikarin lêkolîna Garo Sasunî ya bi navê *Kürt Ulusal Hareketleri ve 15. Yüzyıldan Günümüze Ermeni-Kürt İlişkileri* binêrin.)

Pîranîya kurdên din ji li dijî vê kuştinê derketine û cîranên xwe yên ermenî di malên xwe de veşartine. Delîlên wê di pir serpehatiyên ku heta niha, çî ji aliyê ermenîyan bin û çî ji aliyê kurdan ve hatibin

nivîsîn, pir vekirî tê qalkirin. Heta di pir stranên kurdî de jî meriv dibîne. Di vê sedsala dawî de ev qirkirina xelkên ne misilman, ên wek ermenî kurdên êzîdî, çî di edebîyata kurdî ya devkî de û çî jî di ya nivîskî de be, bi berfirehî cîyekî mezin girtiye.

Wê demê kurd ti xwedî desthilatdarî nebûne û di bin desthilatdariya tirkên osmanî de bûne. Ti rêxistinên bi navê kurdan jî tunebûne ku di qirkirinê de cîh girtibin. Îro hinek xwedîgravî xwe tirkên demoqrata rewşenbîr dibînin, di nivîsên xwe de kurdan wek berpirs an jî şîrikê qirkirina ermenan dibînin. Hinek kurdên me jî radibin li ser navê kurdan lêborinê ji ermanan dixwazin. Ev ne tiştê rast e, bêbingeh e û tu girêdaneka hukuqî jî di qada navnetewî de tune ye.



Ermenî ji Erzurumê derdikevin.

Çavkanî: Populär Historioa, 2019, © Victor Pietschmann

Wek min li jor jî got: tirkan ev qirkirina ermenan di bin rêxistina xwe ya taybet a bi navê Teşkilatî Mahsusa de bi organîzekirina tîpên taybet ku di nav wan de ji derveyî tirkan, ji xelkên din jî wek kurd, ereb heta ermenîyan pêk dihat. Îro çawa bi navî qorucuyan li hember hêzên kurdan ji xwe re grubên taybet bi rêxistinî kirine, ku piranîya wan ji kurdan pêk tên, wê demê jî her wiha kirine.

Yek ji şahidên girîng sefirê wê demê yê DY Ayê, yê li Împaratoriya Osmanî Henry Morgenthau bûye. Di havîna navîn a sala 1915an de telgrafekê ji Washingtonê re dinivîsîne: *"Zilma li ser ermenîyan bêminak e. Raportên ji navçeyên cuda nîşan didin ku bi girtinên kêfî, îşkenceyên xofdar, dersînorkirinên*

komî yên ji bo herêmekê din, bi bûyerên tecawiz, talan û komkujîyan hewlên sistematîk ên ji bo jinavbirina nifûsa ermenîyên aştîyane tê dayîn."

Morgenthau dide xuyakirin ku ev biryar ji Konstantînopolê hatine kontrolkirin û ji ber ku gelek ermenî tevli artêşa Rûsyayê ya li Kafkasan bûne û di nava tevgerên şoreşger ên çekdar de ne. Sefirê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Morgenthau hikûmeta xwe bi vê telgrafê agahdar kiribû, lê DY ku heta bihara 1917an tevli Şerê yekemîn yê cîhanê nebûbû, hê jî bêalî bû, lê belê Joe Bîden di 24ê bihara navîn de soza xwe ya hîlbijartinê bi cih anî ku wê bi awayekî fermî qirkirina komî weke jenosîd nas bike.

Di 24ê bihara navîn a sala 2021an de bi boneya bîranîna roja komkujiyên li dijî ermenî û xiristîyanên din ên li Împeratoriya Osmanîyan di sala 1915an de pêk hatiye, serokê Amerîkayê Joe Biden ev bûyer wek jenosîd bi nav kir. Li gorî pisporê hîqûqa navneteweyî Ove Bring, li ser vê mijarê pênc hikûmetan heta niha helwestên xwe eşkere kirine: DYA, Fransa, Arjantîn, Ûrûgûay û Ermenîstan û ji derveyê wan pênc hikûmetan li parlamentoyên 20 dewletan jî wek jenosîd qebûl kirine.


Hitler sûd ji jenosîdê wergirtiye

Hêjayî bi bîrxistinê ye ku Adolf Hitler baş dizanibû ku di sala 1915an de çi bi serê ermenîyan hatiye. Wî ev yek weke delîlekê dît ku wê piştî kes ji sûcên şer ên herî kirêt berpirsyar neyê dîtin.

Di qada navneteweyî de, qirkirin di destpêkê de hate nîqaşkirin, lê dîsa jî di rojeva siyasî cî negirt. Di danûstandinên aştîyê yên piştî Şerê Cihanê yê Yekem de, pir zêde cîh nedan vê pirsgrîkê. Adolf Hitler paşê ji bédengîya cihanê sûd werdigire. Di axaftineke xwe ya 22ê havîna dawîn a sala 1939an de, tenê hefteyek berîya êrîşa Almaniyayê ya li hemberî Polonyayê, li Obersalzbergê

de ji bo fermandarên komikên mirinê yên di nav SSê de weha gotiye: *"Min bêyî rêz û dilovanîyê fermana kuştina mêr, jin û zarokên ji nijada Polonyayê daye. Encax wê demê em ê bibin xwedî qada jiyanê ya ku em hewce dibînin. Argumana wî ji bo vê yekê ev bû: "Kî îro qala qirkirina ermenîyan dike?"*

Li hember komkujîyê **Raphaël Lemkin**, bi navê xwe yê eslî Rafał Lemkin hat wê encamê ku divê cihan li dijî vê cure kuştina nijadî û olî ya mirovên bêguneh qanûnekê derbixe. Qanûneke ku navneteweyî be û ti welat nikaribe komeke etnîkî ya di bin parastina 'serwerîya neteweyî' de tune bike. Lemkin profesorê huquqê polonî-amerîkî bû ku têgeha jenosîd (qirkirina miletekî) ku yekem car di mehkemeya li Nurnbergê de ji bo tawanparîya Nazîzmê hatiye bikaranîn. Lemkin li zanîngeha Lwów huquq û doktora xwendibû, û di salên şer de wekî nûnerê polonî beşdarî konferansên huquqqa navneteweyî li Parîsê di 1931an de, Madrîd di 1933an de û li Kopenhagê ji di 1935an de bûbû. Hê di sala 1933an de, wî têgehega jenosîdê formule kir ku tê de du beş hene, hem şîdeta li dijî mirovan (tawana barbarî) û vandalizma çandî, ango wêrankirina çandî ku jê re qirkirina çandî jî tê gotin. Wî yekemcarî



Raphaël Lemkin

têgeha jenosîdê di berhema xwe ya bi navê *Axis Rule in Occupied Europe* (*Li Ewropeya ku hatiye işqalkirinde idareya eksenê*) de destnîşan kir ku di 1944an de li Dewletên Yekbûyî weşand.

Qirkirina ermenîyan hema hema bi tevahî vekirî pêk hat. Dîplomat, leşker û mîsyonerên biyanî yên ku di cîh de xwestin xwepêşandanan bikin, ji cîh û warên xwe hatin tehdît-kirin û ji teref rayedarên tirk ve hatin tehdît-kirin. Rêxistinên alîkarîyê yên mîna Xaça Sor li welêt qedexe kirin. Brîtanya Mezin, Fransa û Rûsyayê di 24ê gulana 1915an de ultîmatoneka hevpar dan ku divê qetlîam biqedin.

Piştî bidawîbûna şer, li gorî peymana aşitîyê ya Sevîrê 1920an, gelek ji serokên jon tirk bi mirinê hatin mehkûmkirin, hinekan jî cezayên dirêj stendin. Lê heman

tevgera nû ya netewperest, bi serokatîya **Mustafa Kemal Atatürk** bû desthilatdar û di sala 1923an de Komara Tirkîyeyê ragihand ku ev mehkeme bîn sekinandin. Hemû gumanbar û mehkûmên berê hatin azadkirin.

Di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de, di bin serwerîya jon tirk de, komkujiyek li ser mîlyonek û nîv ermenî dest pê kir, zêdeyî mîlyonek grek û ji sedî 75–90 asûrî–suryanî yên ku di nav tixûbên Osmanî de dijîn ji holê hatin rakirin. Bi sed hezaran kurdên êzîdî ji cîh û warên xwe hatin bi dûrxistin û kuştin. Bi tevahî zêdeyî 3,5 mîlyon însan telef bûn. Nêçîra hindikayîyan di bihara navîn a sala 1915an de dest pê kir heya sala 1925an berdewam kir. Armanca sereke tunekirina ermenîyên xiristîyanan bû, lê jenosîd di heman demê de komên hindikayîyên din ên gayrî musulman wek kurdên ezîdî, keldanî, nastûrî, asûrî/suryanî, grekî û pontus jî hebûn.

Piştî hilweşîna Împaratoriya osmanîyan di dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem de, tenê kurd bê dewlet û bêhêvî man, tevî ku sozên berê jê ra hatibûn dayîn jî...

Çavkanî:

<https://www.levandehistoria.se/fakta-fordjupning/folkmordet-1915>

Arşiv Belgelerile Ermeni Faaliyetleri—Genelkurmay ATASE ve Genelkurmay Denetleme Başkanlığı Yayınları 1914–1918

Hecîyê Kêzikê ¹

Îbrahîm Korkmaz

Gundê Kelhasan, gundekî Anatolîya Navîn e. Gundekî canbega ye. Di gundê Kelhasan da pir qebile (malbat) hene. 70–80salî ber vê, nav malbata da tim şer derdiket. Di gund de aşitî tûnebû. Bi şev kesek nediwêrî derkeve der. Hevdu qurşun dikirin. Malê hevdu ji qurşun dikirin. Pir mala bi şev pencereyên xwe bi torbeyên qûmê digirtin sewa ku qurşûn derbas nebin û xwe li qurşûnan biparêzin. Wê demê di gund da axatî hebû. Axa zilm li merivên xizan û feqiran dikir. Nedixwaştin bila fiqareyek dewlemend biwe. Eger çikî di xwe da dihat, eşkalek dinandin serî wî û malê wî, nedixwaştin ew meriva di xwe da were. Tim dixwaştin ba hemû gundî di bin kontrola wana da biwin. Dixwaştin bila ew tim xwedanê mal û milk bin û di gund de tim gotina wan serdest be. Biryaran ew bidin, bi hukumetê re li ser navê gund ew muxatab bin. Xorta ew bişînin eskerîyê, erdê pîrî baş ew rakin. Li ber zilma axa di

gund da pir huzûr tinebû. Piranîya gundîyan xizan bûn û merivên gund li axa ra kar dikir û ji bo axa *yalanci şahitlik* (şahidê derewîn) dikirin li mehkeman da, sewa ku axa pênc qayme bi wan de. Yalanci şahitlik hinek merivên xizan ji xwe ra kiribûn meslek. Eger yek rojekê biçûya terla(kêlgê) ji hevalê xwe ra digotin, eger di gund da şerek dibe, navê min ji şahitlixîyê re binivîsîne û aman min ji bîr mekin!

Sewa pênc qayma diçûn di meh-kema da derew dikirin. Di gund de merivên baş û yên li dijî axa jî hebûn. Pir merivan li rewşa axa hez nedikirin feqet pir dengê xwe jî nedikirin. Bela axa zor bû, xwe li şerê axa xilas nedikirin û xwe pir tev tiştêkî nedikirin. Hinek malbat hebûn dijî axa derdiketin. Nav wan da merivên mirin didan pêş çavên xwe hebûn. Wan merivan tirs, xof nedizandin. Serê xwe li ber axa danedixistin. Eşîra Delala her demê li diji axa bûn. Eşîra Delala pir caran bi axa va şer dikirin

¹ Hecîyê Kêzikê kalê Îbrahîm Korkmaz e.

û merivên axa pir bûn û jinê Delala jî diketin nav şer û jinê Delala jî mîna mêran şer dikirin. Nav wan da merivên egît hebûn. Nav eşîra Delala da Hecîyê Kêzikê hebû. Hecîyê Kêzikê xwarziyê malê Kiftê bû. Hecî mérékî egît, tirs, xof nedizani û heqsizî tehammûl nedikir. Ji bo vê jî axa lê hez nedikirin. Axa Hecî didan hedefa xwe.

Rojekê axa û bi 9-10 merivên xwe va li ser kaniya malê Hecî Delalê doralîyî Hecîyê Kêzikê û pismamê Hecî, Mehoyê Êmê digirin. Axa bi merivên xwe va êrişê didên ser Hecî û pismamê wî Meho Êmê. Hecî bi pismamê xwe va piştê xwe didin hevdu li dijî axa û merivên axa şer dikin. Bi şiv û keviran li hev dixin. Hecî û pismamê xwe, li hemû merivên axa dixin û axa jî dikin komayê (axa bê XUT dikeve) û herdu pismam di vi şerî da xilas dibin. Axa bi eşîra Delala ra pir caran di gund da şer dikin. Paşê eşîra Delala li gundê Kelhasan bar dikin û terin zozana, li Yayla Delala (Bîra Osikê) dijîn. Hecîyê Kêzikê jî bar yayla Delal dike. Pismamên Hecî jî li mintîqa Susuzê dijîn. Tere pismamên xwe jî topî ser hev dike, hemû li Yayla Delala dijîn. Ew mecbûr bûn hemû warin tevhev bijîn, ew gîştîk xwedan



Hecîyê Kêzikê

dijmin bûn. Hecî di zozana Delala da xaniyê xwe çêdike. Bi karê xwe da dikeve. Yekcaran Hecî hez dike here nêçîrê. Rojeka qirê payîzê tere nêçîrê. Li qir tî dibe. Ava baranê di kaxê da vedixe. Av jî pir sar e wekî cemidîye. Hecî vedigere têye mal û nexweş dikeve. Wê demê berf dibare û hemû rê û rêz tèn girtin. Wê çaxê rê û wasite tunebûne. Zatûre li Hecî giran dibe û Hecî bi vê zatûrê dimire. Hecîyê Kêzikê 32salîya xwe da dimire. Hemû merivên zozana Delala xemgîn dibin. Pir rojan şîna wî dikin. Dotmama Hecî li gundê Kelhasan li mêr e, Eyşa Yîwo (Ayşe Korkmaz/Yaşar) dibîze pismamê xwe yî delal û egît miriye. Eyşa Yîwo bi peya tere yayla Delala û bi dengî bilind, rê da him şînê dike û him jî kilamekê li ser wî dibêje.

Eyşa Yiwo ev strana li ser pismamê xwe gotiye:

Lo Mîro

Lo lo mîro mîro, qurban mîro
Lo lo mîro miro, çol vezîro
Qurban te kim êlan û eşîrano
Ez ê bi qurban te kim, Kêzika ocak kûro

Ez ê oda kekî xwe pak kim, av kim
Ez pêlê nakim, ser ra gav kim
Serekî malê bavi min na ware
Ez ê na ber wî herim, bav bi bav kim

Yeko yeko, qurban yeko
Ew çi şevanî, çawbeleko
Ez ê bi qurban te kim
Va gelî dotmama, tek bi teko

Lawo lawo Hecî lawo
Qêmiş te nakim, mal belavo
Te mal mirato, mal belavo
Mala xwe bi jina mavo

Lo lo mîro mîro, qurban mîro
Mere avê, li vî qirî payîzê
Vemexe ava kaxê, mîna bûzê
Avê sar e, li singê texîne
A te li ser jûnîya da bêxîne

Hecî Hecî te soza xwe negirto
Lawo Hecî te soza xwe negirto
Te dikirî zeya xwe dawet ke
Enterekî çiko, li zeya xwe ke

Lo lo mîro mîro, qurban mîro
Lo lo mîro mîro, çol vezîro
Sêfrekeş î, kahve tîro kahve tîro
Ez a bi qurban kim Kêzika ocaxkûro

Mezelê qardeşî min, li kêleka rîyê
Hilnan daynan, li vê orteyê
Gotin kesekî wî tinîne
Mala xwe bi jina mavo
Lo lo mîro mîro qurban mîro
Ez a bi qurban kim Kêzika ocaxkûro

Gotin: Eyşa Yiwo (Ayşe Yaşar Korkmaz)
Berhevkar: Îbrahîm Korkmaz

Vîjdana Mexmikê

Îhsan Türkmen

Gava em 10–12 salî bûn, em ji bo hot leyistîne car caran diçûn mehla jêrîn. Him daku em ne li mehla me bûn û him jî ew ji me baştir bi top dilistin, me tim verê dikir û serî di ber da em vedigerîyan mal.

Ji havînan havînek, em dîsa ji bo maçeke hotê çûbûn mehla jêr. Me dest pi leyistikê kir–nekir, Mexmik hat û go; ez ê ji we ra bibim hekem. Mexmikê li nêzikî cîhê hotê karxaneyeke xwe hebû û ew bi salan ji me pir mesttir bû. Merivekî henekhez û xweşsohbet bû. Gotina wî, ne bi dilê me bû, lê me dîsa jî go; "erê". Dehpanzdeh xulek derbas bûn bi şûnve, çî bû, kesekî li ningî yekî xist, yan kesek li erdê ket, nizamim, Mexmikê li fîrîskê xist, go; "faul" û lêtîstika me da rawestî. Ji xorta bane Hecî kir û go; "were vira"! Hecî dengê xwe nekir û çû li ber Mexmikê sekinî. Em li hêviyê bûn ku, Mexmik karteke zer yan jî sor ê nîşanî wî bide – kart tune bû, lê wî rê lê bikira. Na, wer nebû. Pir neçû, em têgihiştin ku nêta wî

tişteki din e. Mexmikê destî Hecî girt, bire ber dîragî ceyrêne û ji paş ve destên wî girê dan. Hecî bi wî halê xwe dikenî, em jê pê ra dikanîn, tuyê bê qey zêrek pêva kirine. Me di serî tî dernexist, ka Mexmik dixwaze çî bike! Mexmike bi dengê req û tirkî go; "sıraya girin!" Bi gotina Mexmikê ra kenê Hecî lê bû mûriz. Paşê yekûyek me jî mûriz kira xwe. Xofekê girti bû ser wî û jî kesî deng dernediket. Em bi lez û bez mîna mîhên ku li dora kurnên avê rêz dibin, rêz bûn. Mexmikê go; "rahat" me ningê xwe dirêj kir, go; "hazır ol" me ningê xwe kişand, da kêleka yê din, singê xwe derxist û serê xwe jî berjor kir –wekî ku me li dibistanê hewisî-. Mexmikê go "Hecî bêşeref e! ning avêt ber hevalê xwe û ew li erdê xist! Divê em cezayekî bidin wî." Piştî vê gotina xwe wî îlana cezayê ku wî ji bo Hecî birî, kir: "Heryek ji we yî şelmaqekê li Hecî xwe. Deng ne ji me, ne jî ji Hecî derket. Mexmik bûbû ferman-dar, em jî leşker û Hecî jî sûcdar.

Mexmikê "Hûnê niha yekûyek Hecî şelmaq kin û dîsa werin di rêza xwe kevine. Ma şelmaqê we giran be! Kê şelmaq nekir, yan jî şelmaqa wî ne mîna şelmaqa be! ezê bi devî wî de tu kim" go; û bi destê xwe, wekî ku bêje "dora te ye", nişanî yê serî rêze kir. Reşkê gavek avêt û çû li ber Hecî sekinî. Hîka hîka wî bû. Destê xwe rakir, bi derewa yek da ser binguhê Hecî û pê ra jî kenî. Tam here dîsa di rêza xwe keve, Mexmikê di pîlê wî ra girt û go; "devê xwe veke!" Reşkê bi dengekî ku ji yê Mexmikê ne nizimtir go; "na!" Mexmikê got; "veke", Reşkê digot "na". Mexmikê meskir ê nabe, devê xwe tijî tûk kir û tûyî serçavên Reşkê kir û pînek li qûna wî xist ew şand. Piştî kutxwarina Reşkê, çend kesên din şelmaq li Hecî xistin û Hecî kelegirî kirin.

Lê hê jî baş nayê bîra min, ka çend kesan ji me wê rojê li Hecî xist, ka min jî lêxist, yan na û mesele çing bi dawî bû. Hecî ,wê rojê girîya bû, birîndar bûbû, yan na, çiqas di bin têsîra vê meselê da ma bû? Nayê bîra min! Herwiha nayê bîra min ku ka kes ji mala Hecî yan jî ji ya Reşkê hati bûn bi derîyê Mexmikê keti bûn, yan na.

Çi mezin, çi jî biçûk, ez ne kesekî ku zûbizû qewimîyan ji bîrdike me. Lê ev mesela, nayê bîra min. Wekî

xewneke nîvçe mayî û bê dawî.

Mexmikî ku wekî kesekî ku jîr û jêhatî dihate naskirin! çing keti bû vî halî û ewqas bê vîjdan bûbû û me çima bi gura wî kiri bû, nizanim! Derûnnasek wê bikanibin bi hûrgilî sebebên îtaatkirina me ya bê jêpîrsîn û bêwîjdanîya Mexmikê îzah bike, lê kurikekî deh–danzdeh salî nika-ne ji nav derkeve. Dibe ku sebeb jibîrkirina min a vê meselê ev e: Nikanî ji nav derkevî, bîrbike!

Di wexta kuriktîya min da têsîra vê meselê li ser min qet çê nebû û nayê bîra min ku me careke din li ser vê meselê bi kesekî din ra deng kiri be. Heta berî deh–danzdeh salan.

Piştî sêzdeh salan, cara yekê bû ku min kanî bû herim gund. Li gund, piştî roja duduya yan jî ya sisîya bû, danê nîvro sela hate xwendinê. Demeka ku sela ji xeynî rojê inê dihat xwendinê me dizanî bû ku kesekî mirîye. Em çar–pênc kes li ser soka nê rûniştî bûn. Li gund çend nexweşê giran hebûn, lê ji wan kîjana? Piştî ku mele sela xilas kir, wekî edet navê kesê mirî vexwend; "Mexmikê wefat kir. Xwedê rehma xwe lê bike! Ewê piştî nimîya berêvarê were çal kirin" Yê li ba min gotin; "Erê lê, ew jî giran nexweş bû, kula pîs lê derketi bû" û bi hev ra gotin "Xwadê rehma

xwe lê bike."! Bi refleks ji devê min "ma neke" derket. Birayê min ku, piştî vegerîna min a bi salan şûnve ji Almanyaya, tim ji min ra "Tu çima ver bûyî lo! Tenkê mîna ometê bibe! Bi kurmanciya me deng'ke!" digot, mîna ku ji ber min fedî kiri be, di bin çavan li min mes kir, lê dengê xwe nekir. "Wî berî sîh salî tiştêkî pir xirab anî serê min û hevalên min. Ji ber wê ji ne li ser erdê, ne ji li binê erdê Xwedê rehma xwe li wî neke" Ez bi her du gotinên xwe poşman bûbûm, lê carekê ji devê min derketi bûn. Husikê, hevalê birayê min, wekî xwe bigihîjîne alîkarîya min go; "Xa, ya bi we îş dane kirin, ya jî hûnê eqîs bûn,

wî li we xist. Tuyê bê, qey serê we radaye qulê maran." Yê din kenîn, ez jî kenîm. Min xwest du gotinên di bikim lê, birayê min gihîşte hawara min: "Ka rabe, enaxtarê erebê bîne! em hêdî hêdî herin ser mezela." Ew rabûn çûn, ez bi tenê mam.

Mirov, çi jîyîye ew e û çi kiri be, ewê were rojekê li wî biqelibe. Kê dîgo ku, di roja wî ya herî reş da, ev meseleya nexwaş wê bê bira min. Xweska jî qe nehatiba bira min. Deh-danzdeh salan piştî mirina Mexmîkê, ku tu hestên min yê nêyînî li hemberî wî nemane, ez rûniştîm, min ev nivîsa nivîsand. Li xwevegerîn û dixwederanîn e navê vê.



AGAHDARÎYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmancîyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopîyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlemediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr binin.

Redaksiyon

Dîroka novelê û çend problemên wê

Hesenê Metê

Novel: bi qasî romanê rê nade nivîskar ku qelpî û zexelîyan bike, cêwî an jî hêwîya romanê ye, di prosayê de kakil e, xwedîyê formeke şidiyayî û guvişandî ye, tekstekî intensîv e, dihêle ku xwendevan zûtir û kûrtir têbigêhîje, di prosayê de desthilatîyeke hunerî ye.

Novel¹

Li gor lêkolîneran, novel peyveke îtalî ye û tê maneya **nûçe** û **nûyînê**. Etîmolojîya gotina **novelê** bi maneya xwe ya îtalî weke **nûçe**, **nûyînê** tê zanîn. Ev gotin cara pêşîn di deftera rêdarên keyser Justinianus de peyda bûye. Li wir di wê deftera rêdarê de weke **novellae** derbas dibe û dibêjin di wê demê de, di binê evî navê **novellae** ye de biryarên nû hatine nivîsandin.

Dûre ev terma novelê bi maneya **bûyer** an jî **bûyerên nû** di antolojîyên qesrên Italiya kevin de derdikeve pêş. Ew novelên di wan antolojîyan de, weke **nûçe û bûyerên nû** hatine nivîsandin. Tê gotin ku piraniya van nûçe û bûyerên nû bi zimanekî edebî hatine hûnandin. **Il novellino** yek ji van antolojîyan e ku li dor salên 1250î derketiye. Yeke din jî bi navê

Cento novelle antiche ye ku ew ji li dor salên 1300î derketiye.

Lê di salên 1350î de bi navê Giovanni Boccaccio nivîskarekî îtalî sed novelên kurt bi hunermendî û pîvanên novelên îroyîn bi awayê prosayî dinivîsîne û bi navê **Novelên Decameron** belav dike. Û herweha ev di tradisyona ewrûpî de dibe cara yekem ku bûyer, çîrok û serpêhatî bi rengê hunereke bilind û edebî tene nivîsandin û di lîteraturê de bi navê **novelê** cîyê xwe çêdike.

Ew novelên ku îro bi gelek reng, stil û ekolên nû û cuda hemû jî deyndarê evê **Decameron** Boccaccio ne an jî em bibêjin novela hunerî ji wir, ji wê demê û ji cenabê **Giovanni Boccaccio** belav dibe.

Formên novelên wî kurt û mijarên wan têvel in: Metranên xerifî, rahî-

¹Ev nivîs cara pêşîn ji bo koferanseke edebî di sala 1995an de li "Biskopsarnö"ya Swêdê hatibû pêşkêşkirin û di gelek kovaran de çap bûye.

beyên doxînsist, mezinên kêmaqil û sed babetên weke van tîpan ji novelên wî re bûne histûn û tîpolojîyên girêdanê... Weke tradisyon di piraniya wan novelan de motifên çîrokên orientali û fablên dewra navîn hatine hûnandin. Mîna ku em pê dizanin di sedsala yanzdehan de bi awayê prosayî romanên şovalyeyan jî dest pê kiriye. Lê dema ku **Boccaccio** di demeke humanîzmê de dest bi van novelên xwe dike, di prosayê de bi formeke **nû**, bi formeke **kurt** û **întensîv** dinivîsîne. Ev **kurtîya** ha ji bo novelê dibe pîvaneke bingeîn û di lîteraturê de bi navê **novelê** rûdine.

Herweha meriv dibîne ku novel jî bi romana wê demê re weke babetekî prosayê geş û berfereh dibe.

Piştî ekola **humanîzmê** vê carê jî tevgera **ronesansê** pêşîyê li hertiştî dikêşe, dûre jî ekolên **klasîzm** û **romantîzmê** dide pey. Lê wusa diyar e ku ji humanîzmê û heta ekola **realîzmê** jî guhertinên welê radîkal di form û hunera novelê de çênebûne. Loma ev forma kurt, ev nav û navaroka novelê heta dema realîzmê jî bêtî serêşî û bêtî sergêjîyekê didome û tê.

Di ekolên **realîzm** û **naturalîzmê** de, bi gotineke din, di navîna salên 1800 û 1900î de di warê form û navaroka novelê de ronesanse-

ke hunerî dest pê dike. Novel bi Pûşkîn, Gogol, Maupassant, Çêxov û gelekên mîna wan di lîteraturê de dibe xwedîyê cîyekî balkêş û xwe davêje sedsala dawîn.

Li gel van ekolên realîzm û naturalîzmê di vê sedsala dawîn de du ekolên din jî bi reng û kirasên din derdikevin ku jê yek **expresyonîzma** Kafka, Strindberg û James Joyce e. Ya din jî ew e ku bi vê ekola **expresyonîzmê** re em dibînin ku bi navê **existensîalîzmê** şaxekî felsefeyê û ekoleke nivîskarîyê derdikeve holê ku di berhemên gelek nivîskaran de reng vedide. Bo nimûne weke pêşengê vê ekolê J.P. Sartre û gelekên mayî.

Her ekol bi serê xwe reaksiyonek e, serhildaneke ekola berîya xwe ye, felsefe û tevger e, rewş û haletekî rûhî ye ku li ba xwedîyê wan ekolan e. Û béguman heyîn û derketina her ekolekê jî gaveke nû ye, ji bo geşbûna lîteraturê gaveke ber bi pêş ve ye. Ji ber vê yekê ye ku meriv nikane bibêje novelên kîjan ekolê çêtir, baştir, an jî xweştir in. Û ne tenê ekolên nû, di roja îroyîn de xwendevanên hemû ekolên buhurî jî hene. Li gel van hemû ekolan jî, îro meriv rastî gelek nivîskar û novelên wan tê ku ne tenê ekolek, herweha reng û bêhna çend ekolan jî ji berhemeke wan tên.

Lê di kîjan êkolê de dibe bila bibe, pîvanên novelê ne **xweşikîya** novelê ye. Bi gotineke din, peyva **xweşik** peyveke relatîv e, peyveke îzafî ye, ji bo novelê peyveke pûç e, hîsî û bêmane ye. Pîrî caran ji bo motîfa novelê tê gotin û dibêjin: **noveleke xweş** e. Bêguman ev xweşî xweşîyeke hîsî ye, şexsî ye û ji bo **wî** an jî **wê** xwendevanê welê ye ku ew dibêje: **xweş** e. Ev nabe pîvana noveleke **serketî**. Peyva serketî bêtir li pîvanên novelekê digunce.

Noveleke serketî: ji **konflikt**, **kon-sentrasyon** û **klîmaksa** xwe pêk tê û ew jî: Diyalog, monolog, sembol, stîl, ziman, nîgar û hinek tiştên mîna van tiştan e. Ku bi hunereke bilind ev mefhûmên ha li hev werin hûnandin û bi cî û wext bibin, ji bo novelê **serketinek** e. Eve ye pîvanên novelê. Bi gotineke din, motîf ne girîng e. Ji ber ku pîrî caran motîfa noveleke serketî, dikane motîfeke bêmane be jî. Em dizanin ku jîrîya hunera nivîskarekî dikane maneyeke gelekî xurt û bilind ji bêmanetîyekê ava bike. Ji xwe huner jî eve ye û serketin jî eve ye.

Çend problemên ku di novelê de hîn jî safî nebûne

Li gel ku di ser nivîsandina forma novelê re nêzikî 650 sal buhurîne jî, lê ev term û ev forma novelê hîn jî

zelal nebûye. Ne di nava lêkolînerên lîteraturê de, ne di nava zimanên navnetewî de û ne jî di nava nivîskaran de. Gotin û dîtînen li ser novelê safî nebûne. Ez ê li vir çend xalên bingeîn destnîşan bikim:

a- Ji alîyê formê ve (kurtî û dirêjayî): Piştî ekola humanîzmê û novelên Boccaccio heta demekê jî ew kesên ku evê babeta prosayê bi navê novelê dinavînin, wekî pîvan **kurtbûyîna** wê didin ber çavan û heta derekê jî li ser vê yekê zelal dibin û hemfikir in. Novel bi vê forma xwe heta sedsalên 18 û 19an jî diherike û bêtî sergêjî, bêtî serêşî tê. Lê jê û pê ve novel deforme dibe. A wê çaxê serê gelek lêkolîner û zimanzanên lîteraturê tevlihev dibe û pîrî caran nivîskarê novelê bi xwe jî nema ji nav derdikeve. Bi gotineke din, ew pîvana tradîsyonel ku digot di novelê de karakterê herî bingeîn **kurtbûyîna** e, ji navîne radibe.

Ji ber ku li dor salên 1830î bi navê novelê berhemên 138, 226 û 600 rûpelî derketine. Û di van demên nû de jî, demên ku êdî em jî pê dizanin bi navê **Duelloyê** noveleke Çêxov 170 rûpel e, novela wî ya bi navê **Beyarê** 121 rûpel e, **Stocholma** Bavê Nazê 122 rûpel e.

Ev nimûneyên weha ji didin diyarkirin ku ji bo novelê **kurtbûyîn** êdî ne karakterekî bingeîn e, an jî ev pîvana forma kurtbûyînê sergêjîyekê çêdike. Ji bo ku ji vê sergêjîyê bifilitin, hinek rabûne li ser pîvana **kurtî û dirêjayîya** novelê pêşniyar jî kirine. Weke nimûne: di nava nivîskarên almanan de hinekan gotine: Ew prosayên ku di hunera edebî de heta 50 hezar pîtan dirêj bin, em wan bi navê novelê binavînin. Lê ku ji 50 hezar herfan zêde be, bi îxtimaleke mezin ew ê bibe roman. Lê ez bi xwe van pîvanên mekanîk tîr nabînim û loma li ser vê yekê nasekinim.

b– Ji aliyê cî û wextê ve: Îro di hunera nivîsandina prosayê de **cî û wext** jî alikariyê nake ku meriv berhemeke hunerî bi navê **novel** an jî **romanê** binavîne. Ku em bibêjin: **novel**, motîf an jî figûrekî xwe di cî û wexteke teng û kurt de dihûne, em ê nikanibin ji çewtîyeke mezin derkevin. Lewra novelên ku bi wexteke panzdeh salan hatine hûnandin jî hene. Weke nimûne: novela bi navê **Peyman** ji Anton Çêxov di panzeh salan de diqewime. Novelên bi deşt û çiya, novelên bi gund û bajaran hene. Ji aliyê din ve romanên bêwext, romanên tenê di nava nivînan de an

jî li ber mirinê hatine nivîsîn û van romanên ne **cî û ne jî wext** girtine. Herweha ev pîrsa novel û romanê bi **cî û wexteke** diyarkirî jî safî nabe.

c– Ji aliyê struktur û avabûnê ve: Ji aliyê struktura xwe ve novel jî **konflikt, koncentration, klimaksa** prosayê pêk tî. Bi gotineke din: Novelistekî serketî nakokîya bûyerekê (**konflik**) digire (carina ji destpêkê, carina ji nêvî û carina jî em bibêjin ji kuderê pêwîst bike) tevayîyê bal û zelalê wê bûyerê dicivîne ser hev, diguvêşe ser hev (**koncentration**) û ber bi qest û mebesta xwe bilind dike (**klimaks**) û jî wir bi harmonîyeke pêwîst weke sembolekê ber bi dawîya novelê dadixe.

Motîf, dîalog, monolog, sembol, fakta û fîktion, figûr, bûyer, cî, wext, ziman, nîgar û ew hemû tiştên ku ji bo novelekê pêwîst bikin, divê di test û çarçoveyeke weha de nerm bibin, bibine weke hevîr û dûre mîna peykerekî were çêkirin.

Di hûnandineke weha de pîrî caran gelek tiştên li kêlekan, li hawurdorê bûyer an jî lehengê novelekê vala û veşarî dimînin û divê bimîne jî. Ji ber ku novel bi xwe formeke guvîşandî ye, zelal û kakilê bûyerekê ye, bi desthilatîyeke hunerî daxwaza dayîna

mebestekê ye. Gotin û vegotinên zêde, zimandirêjîyeke wusa ye ku di novelê de kubarî û xisûsiyeta wê nahêle. Figûr, motif û mijarên nepêwîst ji bo novelê paç û pîneyên serêşê ne. Li ser valahî, veşarî, pêwîstî û nepêwîstiya van tiştan Guy de Maupassant weha dibêje: «*Dema ku hunermendek portreyekî me çêdike, îskeletê me nişan nade.*»

Û di vî warî de Anton Çêxov jî nimûneyeke weha dide û dibêje: «*Dema ku meriv bixwaze ji latekî mermer rûyekî çêke, meriv ê wan hemû aliyên ku êdî nabin rû tiraş bike û bavêje.*»

Ku ez têngêhîştina xwe ya ji bo novelê bibêjim: ji bo ku meriv li jineke bedew binere, pêwîst nake meriv tevayîya laşê xwe çerx bike, berê xwe bide wê û bibîne. Têr dike ku meriv di ser milê xwe re jî lê binere û bedewiya ewê jinê bibîne. Bi gotineke din tiştê ku bedewiya wê jinê bibîne, çav in, ne tevayîya laş e ku em xwe çerx bikin. Lê ev pîvanên weha di roja îroyîn de ne tenê di novelê de, herweha di romanê de û nemaze di romanên kurt de jî baştir diyar dibin. Û di warê hûnandina avakirinê de jî herwekî ku meriv dibîne, cudayîyeke berbiçav di navbera noveleke dirêj û romanekê de ne diyar e.

Bi kurtebirî û bi qasî ku ez bi ser ve bûme, **wext, cî, form** (weke kurt û dirêjayîya xwe), **struktur** û heta derekê ez dikanim bibêjim **nîgara** (teswîra) prosayekê jî ne pîvanên zelal in ku meriv bi navê novel an jî romanê bi nav bikin.

d- Ji aliyê nav û zimanî ve: Ji bo ku vê tevlihevîyê piçekî zelal bikin, hinek zimanzanan li gor zimanên xwe hinek peyvên nû peyda kirine, lê dîsa jî ev dudilîya li ser nav û navaroka novelê bi tevayî çareser nebûye. Novela ku me bahsa wê kir, ji bo ingilîzan **short story** ye an jî **taleyê** bi kar tînin. Ji bo ku cudayîyekê têxin navbera kurtbûn û dirêjayîya prosayê navê **novelettê** jî bi kar tînin. Û evê peyva novela ku em pê dizanin û anuha bahs dikin, ew bi maneya romanê bi kar tînin.

Herweha di fransî de jî ji bo novelê sê peyvikên cuda bi kar tînin: **nouvelle**, ji bilî vêya **récit** û **conte** bi kar tînin. Di swêdî de: **novell, historia, berättelse, skiss** heye. Di zimanê almanî de peyva **kurzgeschichte** û **ärsellung** bi kar tînin ku mîna **kısa** û **uzun öykü**ya di tirkî de heye.

Wek gotinên dawîn dixwazim bibêjim ku nivîskarê swêdî Ivar Lo

Johansson li ser novelê bi me dide zanîn ku: "Novel, weke maneya xwe ya îtalî nûçeyeke nû ye, ewqas nû ye ku pêwîstî bi lêkolîna vê nûçeyê heye."

Li gor dîtîna hinekên mayî jî: di lîteratura paşerojê de geşbûneke bêtir ê vê tevlihevîya novelê ji hev safî bike. Û ez... ez jî hêvî dikim welê be û welê bibe.

Herwekî ku diyar e gelek tişt li ser vî babetê prosayê, li ser novelê hatiye gotin. Ez naxwazim, nawêrim û min dil nîne ku ez jî tiştekî li van tiştan zêde bikim. Lê ez vê gotara xwe tenê bi pêşniyarekê, pêşniyareke ji bo zîmanê kurdî berhev dikim û dibêjim: Ev tevlihevîya norm û karakterê novelê bêguman ji bo me jî problemek e. Di warê gotina zimên de ev problem jî bo kurdî gelekî mezintir e.

Mezinîya vê problemê jê yek ew e ku: Em pirî caran peyva **çîrok** bi kar tînin ku ev peyv ne bersiveke van peyvên xelkê ne jî. **Çîroka** me **masala** tirkî ye, **sagaya** swêdî ye, **fairy taleya** îngilîzî ye. Bi gotineke din, bûyer û lehengê **çîroka** me berhemeke kolektîf, berhemeke anonîmîtetê ye. Lê novela ku em anuha bahs dikin tiştekî din e. Loma jî bi gumana min ev peyva **çîroka** ku em bi kar tînin bersiva novelê nade. Ez dizanim gelek kes peyva **serpêhatî** jî bi kar tînin. Lê ez nawêrim vê peyvê jî bi kar bînim. Bi bawerîya min heta zîmanzanên me di warê zîman de bi ser nekevin, ji bo evê babeta prosayê weke bersiveke rastir û têrtir peyveke nû nebînin, divê em jî **novelê** bi kar bînin. Bi kêmanî ez wusa dizanim.



Kurtehîkayeke bi almanî

NAN

Wolfgang Borchert *

Wegera ji zimanê almanî: Nuh Ateş

Ji nişkava ew bixwe hesîyaye. Saet dudu û niv bû. Ew fikiriye ku çima ew bixwe hesîyaye. Aha, min fehmkir! Li aşxaneyê kesek li sendeliyê ketibû. Wê guhê xwe berve aşxaneyê kiriye. Bedengî bû. Pir bêdengî bû û gava ku destê xwe li ser nivînê li hêla xwe gerandiye, wê ew vala ditiye.

Sebeba bêdengîya ewqas zêde tunebûna nefesa wî bû. Ew rabûye serxwe û birêçûyîneke bêdeng di nav mala tarî ra çûye aşxaneyê. Wê

tişteki sipî ditiye, yê ku li ber dolaba aşxaneyê sekinibû. Wê çira vexistiye. Ew bi kirasan li hember hevûdu sekinibûn. Bi şev. Seat dudu û niv. Li aşxaneyê.

Li ser maseya aşxaneyê tebaxa nan hebû. Wê dît ku wî ji xwe ra parçek nan jê birîbû. Kêr hîn li kêleka tebaxê bû. Û li ser rûberê maseyê kurtêl hebû. Û kêr li wira bû. Wê hîs dikir, gava ku sermaya telaşan hêdî hêdî bi bedena wê da

**Nan kurtehîkayeke nivîskarê alman Wolfgang Borchert e. Wî ev di sala 1946an da bi dawî kiriye û nixxeya wê ya yekemîn di 13ê meha mijdarê da ji aliyê Weşangeha Serbest ya Hamburgê da hatiye çapkirin. Hikaye bi ser wêjeya wêranîyê da tê hesibandin. Motivên wê bi pirsîgîrîyên piştî şerê dunyayê yê duyemîn va girêdayîne. Tiştên xwarinê pir kêr hebûne û di vê hikayê da bi derewekê weşartina xwarina parçeyek nan ya bi dizîki bihevbaewerîya cotekî dike gumanê.*

berve jor dikişîya. Û wê berê xwe ji teboxê wêda kir.

„Min digot, qey li wir tiştek heye“ wî gotiye û li aşxaneyê li derûdora xwe nihêriye. „Min jî tiştek bihîst“ wê bersiv daye û pê ra jî dîtiye ku ew bi şevê di kirasê da pir kal xuya dibû, bi qasî ku ew bi nav salan da çûyiye. Şêst û sisê. Bi roj carcaran ew cîwan xuya dibû.

Ew difikiriye ku ew ê di kiras da pir pîr xuya dibe. Belkî ji avûrûyên por da ye. Li ba jinan bi şevê por tim wer dike. Ew bi carekê ra weha pîr dide xuyakirin. „Gerek e ku te pêlav pêkirina. Wengina pêxwas li ser telaşan. Tu ya niha sermayê bigrî.”

Wê li wî nedinihêriye, ji ber ku nedikanîye tehamul bikira, gava ku wî derew dikirine. Sî û neh sal in ku ew zewicîbûne û wî tim derew dikiriyê.

“Ez difikirîyam, ku li wira tiştek heye”, wî carake din gotiye û dîsa bê mane virda û wêda mêze kiriye û gotiye, “min li vira tiştek bihîst. Hîngê ez fikirîm ku li wira tiştek heye.”

“Min jî tiştek bihîst. Lê ew ne tu tişt bû.” Wê tebox ji ser maseyê helnaye û bermayiyên li ser sifrê berehev kirine.

“Na, ew qet ne tu tişt bû”, wî bi neemînî deng vedaye. Wê alîkariya

wî kiriye û gotiye; “Mêro were. Ev li derva dibû. Mêro were nav nivînê. Tu ê niha sermayê helinî. Li ser telaşên sar.”

Wî ber bi pencereyê mêz kiriye. „Erê, bêşik e ku ev li derva qewimiye. Min digot qey ev li vir bûye.”

Wê destê xwe ber bi bişkovka eletirîkê kiriye. Gerek e ku ez çirayê vemirînim, wekî din ez mecbûr im li teboxê mêze bikim, wer difikiriye, nabe ku ez ber bi teboxê mêze bikim.

„Mêro were“, wê gotiye û çira vemirandiye, “ew li derva bû.” Çirika banîyê ku ba tê tim li diwar dixê. Ji sedî sed çirika banîyê bû. Kînge ku ba hat ew tim dike şîkinî. “Herdu bi hev ra giran giran di korîdora tarî ra çûne odeya raketinê. Lingen wan yên xwas li ser herdê dikirine şepûşîp.

„Erê ba ye“, wî gotiye. „Bitûnî şevê ba hebû.” Gava ku ew ketin nav nivînê, wê gotiye: “Erê bitûnî şevê ba hewû. Erê ev çirika banîyê bû.”

“Erê, min digot qey ev li aşxaneyê diqewimî. Lê ev çirika banîyê bû.” Wî wer digot, mîna ku bibêjî ew nîv di xew da bû. Lê wê ferq dikir, dengê wî çiqas sexte dihat, gava ku derew dikir.

Wê bédeng bawîşk radinane û gotiye, “sar e, ez dikevîm bin lihêfê, şevxwaş.” Wî gotiye, “ya te jî xwaş”

û wer dewam kiriye: “Erê, sar e him jî pir.” Paşê bûye kerûlalî.

Ji pir deqîqeyan bi şûnda wê dibihistiye ku ewî bi dîqet dicûyê. Wê bi qestî kûr û wekîhev nefes heldinaye sewa ku ew pê nehêse ku ew hîn payî ye. Lê cûyîna wî ewqas rêzberêz bûye ku ew pê giran giran ketiye xewê.

Gava ku ew êvara din hatiye mal, wê çar parçe nan dirêjî wî kirine. Wekî din wî tim dikanîbû sê parçe bixwarana. “Tu dikanî bêminet çaran bixwî”, wê gotiye û ji lambeyê bi dûr ketiye.

“Ez nikanim vî nanî rind hezm bikim. Tu yekê zêde bixwe. Ez wî baş hezm nakim.” Wê niheriye ku wî çava kûr xwe bi ser tebaxê da xwar kiriye. Wî li wê nedinihêriye. Di wê demê da dilê wê pê şewitiye.

Wî, bi ser tebaxa xwe da xwar ve hatî, gotiye; „Tu nikanî tenê du parçeyan bixwî“.

„Lê belê. Êvaran nan rind li min nayê. Meriv bixwe. Meriv bixwe“. Piçekî bi şûnda, ew li bin çirayê li ber maseyê rûniştiye.

Çend çarîn

I

Carek din narim nav dildara
Guh nadim ser
Dengbêj û stranên evîndara
Hatin xarê dil û hinav
Bi nalîn û hawara

II

“ Kevire mezela reşegir in
Ne bar tewin ne têwirin”
Nizanin
Yên ew li ber balgih
Ji wan çiqas mezin û bilindtir in.

III

Dara bî
Guliya şe dike li ber avê
Êdî ew jî min sîya xwe de nake xewê
Emir çû pelê dara payîzê ye
Kuçe bi kuçe berba ye.

Mem Xelîkan

Jana zimên

Mem Xelîkan

Zivîstan bû. Sê rojan li serhev, bênavber berf dibarî. Li nav bajarê, kûçe û kolanan kûtigên berfê çêbûyî bûn. Derva, herder berf û cemedê bû, meri li ser xwe bi qar dadiwestî û bi qar bi rê diçû. Eyamekî pir sar hebû. Remo û xanima wî Eş, hetanî sibê bêxew li ber balgîya dayika xwe rûniştibûn. Ji çavên herduyan, xew dirijî. Hetanî sibê li ber balgihê dayika xwe, bêdeng girîbûn. Xeca dayika Remo, pîreke salmezin bû. Li bajarokê gundê wan tê girêdayî, li cem lawik, bûk û du neviyên xwe diji. Çend roj in nexwaş ketibû û di nav nivîna de bû. Rojên dawîyê deng dîkir, lê gotinên wê pir fehîm nedibûn. Mîna ku zimanê wê li hev digerî. Çavên xwe, tijî xwe jihevkiyî li derdora xwe mîs dîkir; wek xatirê xwe bixwaze. Wê şevê nexwaşîya Xecê her çû giran bû, devdeve sibê rihê xwe teslîm kir û çû ser heqîya xwe.

Remo ji hundir de, kûr kûr bêdeng digirî û hêstir dirijandin. Êşa wî giran bû. Rojên bi dayika xwe ve derbaskirî, di ber çavên wî re diçin û dihatin. Tenakê guh da ser xwe şuva, ji Eşa xanima xwe re:

– Tu xwe amade bike, em ê meyt bibin gund.

– Ez î amede me. Kincê kurikan lêkim, wana bipêçim eyam î sar e.

Remo, xwe pêça, bi lez ji mal derket. Çû ber mala cîranê xwe Hecî. Li ber sokanê dawestî. Li ser xwe bi zorê dadiwestî û ji serma dicirifî. Hecî jî, ji gundeki din ku girêdayî wî bajarokî bû, kurd bû.

– Hecî, Hecî! Remo bane Hecî kir. Hecî, derî jihevkiyî, bi derket.

– Remo, bi xêrhatî! Xêr e îşalla, vê sermê çî bû?

– Welle qe ji ne xêr e. Min dayika xwe, Xeca Rehmê Gozelê wenda kir. Xeca min rehmetî bû, çû ser heqîya xwe.

– Na lo, xwedê rehma xwe lê bike, cihê wê bihuşt (cinnet) be.

– Hecî, dixwaze em cinazê (meyît) wê bibin gund.

– Xêre, vê berfê di vê sermê de em ê çing bibin? Em li vir di erdê kin, nabe?

– Na na, min soz dayê, zati wesîyet kiribû. Tiştêk nabe. Rêya gundî me yê dûz e. Em ê çend bêra heynin. Min soz da wê, ez ê meytê

wê li pişt a xwe bar kim. Dîsa bigîhînim goristana gund.

– De tu dizanî. Tu here mal, ez herim mala Hec Ehmed. Ku çavên wî dibirîne, ew motorê (traktor) xwe qoşke, em bibin.

Bavê Remo, Hec Elîyê rehmêtî li gundê xwe şivan bû. Ji xêr Remo keçeke wî jî hebû. Meriyekî bi dil û xatir bû. Cîran û hevalan jê hez dikirin. Li dilê cîran û hevalan nediket, zikê kesî nedêşand. Pir dixwast Remo bixwîne. Ji cîran û hevalan re tim digot: “Remoyê min, bi xêr mezin bibe, ez ê wî bidime xwendinê. Hetanî xwendina xwe xilas dike, ez ê şivanîyê bikim. Dûva jî ew ê me xwedî bike.” Lê mixabin Remo qet jî dibistanê (mekteb) hez nedikir. Ti çavî wî li xwendinê tinebû. Dibistana serete xilas kir dûva, Hec Elîyê rehmêtî ew li dibistana navîn qeyit kiribû. Lê Remo, ji pola (sinif) yekemîn şunda dev ji xwendinê berda. Heta çû eskerîyê (leşkerî) li gund şivantîya berxan kir. Ji eskerîyê şunda jî çû Ewrûpayê. Hetanî bavê wî rehmêtî bû, 7–8 salan şuxilî. Tenak pere jî gihandibûn hev. Dû mirina Hec Elî, Ewrûpa berda hat li bajarokê gund tê girêdayî de dikaneke xwe ji hev kir û dest bi bazirganîyê kir.

Remo, vegerîya mal. Saetekê şunda cîranê wî Hecî û Hec Ehmed bi traktorê hatin ber malê û dawestîn. Bi lez, meyîtê Xecê di betanî û geltekê nûr kirin, avêtin ser tentê traktorê. Eşê kurik qêr pêçayî bûn, lê dîsa jî bo ku bi rê de li wî eyamî neqefilîn çend betanî û du lihêf (yorgan) jî anî bûn. Eş, kurik, Hecî û xanima Hecî di tente de, Remo û Hec Ehmed li ser trektorê bi rê ketin. Ji berfê kêlekê rê xûya nedikirin. Hêdî hêdî diçûn. Gund nêzik bûbû. Havînê di eyamê xwaş de navbera gund û bajarok 15 deqqe bûn. Lê ew roj, rojek ji rojên ku digotin „zivistana Romê“ bû. Rêwîtiyê du saetan ajot.

Traktor, kişandin ber mala Xecê. Gundî, bi mêr û jinan li ber mala wê civiyabûn. Keça Xecê, xwanga Remo por û biskên xwe rûçikandin, rû li xwe kirin dûrme. Wê hat destê xwe di stuyê Remo re avit, li ser dayika xwe kilam strî û şîn kir. Xec, çiqase salmezin be jî, dayik bû. Navê mirinê yê sar e. Li her astengîyeka wê, pişt baza wê bû. Keça Xecê, bi dengêkî zîz mîna berxa ku dû dayika xwe dikalî, distira, kezeb li meriya perçe perçe diki. Jinên gund jî li sîng û junîyên xwe dixistin tev wê digirîn û şîn dikirin.

Meyît hate şuştinê şuva, mêran meyîtê Xecê, di wê berf, şilî û şe-

peliyê de, bi çileke mezin birin goristanê û ew binax kirin. Keça wê, ji bo azcîya deriyê mala xwe ji hev kiribû. Jin, li mala wê rûniştibûn û şîna Xecê dikirin. Mêr jî, ji goristanê vegehrîn şunda, dihatin ber malê. Keça Xecê, şara Xecê di dest de ber-ve Remo çû, dest bi kilama kir:

*Xeca min, li xerîbîyê bi tenê maye
Nale nale, nexwaş e, westîyaye
Rojek ji rojên zivistana Romê
Hat li goristana gund ramedîyaye
Nizanim digirî, nizanim şa ye*

Jin hatin ketin piyê wê, ew birin hoda jinan, mêr jî derbasî hundir bûn, xwe dane derdora Remo. Ji cimatê kalekî ji Remo re:

– Bavê te, rehmetî Hec Elî pir mêr bû. Meriyekî civata, xêrxwaz bû. Qe dilê cîran û hevalekî neşikand. Gund giştik jê razi bû, wek Xeca dayika te. Xwedê herduyan jî bi rehma xwe şa bike, cihê wan cînet be. Hec Elî, rehmetî pir dixwast Remo bixwîne.” got.

Remo:

– Erê, rehmetî pir dixwast ez bixwînim, lê min qe xez nedikir. Xalo, ez î biçûk bûm, kurik bûm ji du tişta pir ditirsîm. Yek, dest bi dibistanê kirin, yek jî çûyîna leşkeriyê bû. Tîrsa min ew bû, min tirkî nedizani ez ê çi bikim. Eynê jî wer bû. Me tirkî nedi-

zani, mamoste kurdî nedizani. Rojên siftê, me li çavên hevdu mês dikir. Ne wî ji me, ne jî me jî wî fahm dikir. Li dibistanê dengkirina kurdî qedexe bû. Paşê, „li mal jî dengkirina kurdî qedexe ye“ gotin. Em dihatin mal, me nedizani, em ji dayika xwe re bêjin „ez î birçî me“ an jî „tî me.“ Em bê-jin jî, dayikên me fehmedikirin. Bi ser de jî, guhbel/ajanên xwe girtibûn. Dora din a royê em diçin dibistanê, wan guhbelan, navên me didan mamoste, wî jî em ciza dikirin. Li me dixistin û em diêngavtin. Carcaran, em çend heval li malekê dicivîn, me ji hevdu re çîrok kat dikirin, an jî me ji dorê de stran distiran. Mamoste bi şev li ber pencera digehrîn, li dibistanê ji bo wê jî em ciza dikirin. Em ji însanetî derxistibûn. Lîstikên xwe, me nedizani bi tirkî çîng bileyzin. Em ê bi tirkî çîng bikenin, çîng bigirîn, me nedizani. Ya hûn bizanin, hetanî zimanê xwe bi bermexin, me fêrî zimanê xwe bikin, em bêzar û ziman, em lal kiribûn. Vaya, êş û janeka mezin bû. Heşê me nedigêştin, mezina jî nedigot “hûn bi zimanê xwe wana fêr dikin, lê hûn ji zimanê me çi dixwazin, çima qedexe dikin.” Zêde dirêj nekim. Em kiribûn nav tarîtiyekê, me nedizani çi bikin. Ji bo wê jî, min dibistan qe hez nekir.

– Remoyê xwarzî, rast dibêjî. De rabin, xwarin tê. Mêvan xwarina xwe bixwin, em Remo û wanan bi rê kin. Eyam î sar e, rêyê neçê ye, ma nemên derengîya şevê.

Dû xwarinê ve, ji bo vegeerê Remo û cîranên bi wî re hatibûn gund, xatir xwastin. Li vegeerê mal, xaltîya Remo û xwanga wî jî bi wanan re dihatin. Ber êvarê eyam hê sar bû. Li gora sibê, rê hê jihev kirî bû. Dû hatina wan ve, berf nebarî bû û şopa traktora sibê nehatibû girtin. Remo û ew, dû nimêja êvarê gêştibûn mal. Remo, ji herdu cîranên xwe re spasdarî kir û herkes çû mala xwe.

Dora din a royê, cîran û heval ji bo sersaxîyê dihatin mala Remo û diçûn. Ji ber ku zivistan bû, eyam sar bû, mala şînê xewle bû. Ji gundan jî kes nedihat. Dû nîvro, Remo û cîranê wî Hecî, di hodekê de li ber zoba komirê rûniştibûn.

Hecî, ji Remo re:

– Dema te li cimata gund, qala dibistanê fikir, mîna ku te qala he-kata min fikir. Tiştê hatiye serê te û şagirdên (telebe) gund, li gundê me jî eynê bû. Destê me jî li quranê dixistin ku em kurdî neaxifin.

– Ji bo xatirê bavê xwe, min li dibistana navîn jî qeyda xwe kir, salekê jî xwand. Em ji gund hatibûn vî

bajarokî. Em çar heval di malekê de dimanî. Dapîra hevalekî jî ji bo xizmetê me bike, bi me re dima. Li vir, em ji dibistanê derketinî şuva, li nav bajêr an jî li mal kurdî dengkirin ne qedexe bû. Lê telebeyên tirk bi me qerfên xwe dikirin. Digotin “ka boça we?” Em biçûk diditin. Zati ez bê dil hatibûm xwandinê. Bi ser wê de, rokê mamosteyê mûzikê, devdeve dibistan werin girtinê, telebe yek bi yek radikirin texte, ji bo ku notê bide me. Ji me re got: “Yên dizanin, dikarin stranekê bistirên. Yê strana nizanin jî Îstiklal Marşîyê bixvînin.” Dor hate min, ez rabûm. Min got: „Qadin dîne lê lê... ..“ Cî lê xûlî bû û got: „Otir, sifir (rûne, sifir).“ Min fedî kir. Heval bi min kenîn. Rûmeta me dişkênan. Bi ser wê de, dibistan hatin girtinê şunda, em çûne gund, ez carek din nehatim dibistanê, min dest ji xwandinê berda.

– Erê, te gotibû ez ji eskerîyê jî ditirsîm, ez î esker bûm. Fermandaran ders didan me. Rokê, fermandarekî bi tirkî got: “Kesek ji we du zimana dizane heye?” Min destê xwe rakir, wî got: “Kîjan zimanan dizanî?” Min jî got: “Kurdî û tirkî.” Hêrs bû û got: “Rûne magî bi eqo, tu jî kurdîyê ziman dizanî? Zimanî dewleta yê hebe. Dewletine

navî xwe kurd hene ku kurdî bibe ziman.” Ez pir bi wê gotinê bi ber xwe ketim û pê êşîyam. Pir dera, min fedî dikir ez bêjim „ez kurd im.“

Xwanga Remo tewaxa çayê di dest da kete hundirê hodê. Çaya Hecî û Remo da wana şûva, xwe da erdê rûnişt. Ji Remo re bi dengekî xemgîn û kovanbar:

– Birango, Xeca min, li berê mirinê tiştek got an jî wesîyetine xwe kirin?

– Çi wesîyeta bike? Fiqara min tim di wî quncikî de rûniştî bû: wext hat nimêja xwe dikir û tizbîya xwe dikişand.

– Hecî, te pir îsrar kir ku tu cinaze bibî gund.

– Erê, wesîyeta xwe ew bû. Heftekî deh roja ber vê, dema nexwaş ket, kete nav nivîna, min jê re got wesîyetine te hene? Ter tirsî ku em kurik bûn di dilê me de, di dilê Xeca min de jî hebûye. Him jî li herdu dinêyan. Bi ser wê pirsî min ve, got çî, hûn dizanin?

– Ez mirim, min bibin goristana gund di erdê kin. Ez tiştekî din naxwazim.

– Min jî got: „Çîma, goristana vir çî pê hatî ye?“

Dayika min a delal bersiv da min û got:

– Ez qurban, lawikê min, ez î bi tirkî nizanime. Di goristana tirkan de bê ziman ez a çî bikim?

Helebce

adarno dibêje

”piştî auschwitzê şûrnivîsandin barbarî ye”

ez te fehm dikim adarno!

lê hîn kes fehm nekin û qet jî yê fehm nekin

jî bo wê jî ez ê binivîsînim...

ez ê bi hemdî xwe binivîsînim...

ez destên xwe nekime ber xwe!

stuyê xwe xwar nekim!

bejna rindê min dara genim

destê min î nerê ku te bi nav bikim.

Seyfi Dogan

Klamên şinê ji gundî Mikaîla/Polatli

Berhevkar: Dr. Mîkaîlî

Şare: **Zera Yîwiş** (Şerife Yıldız Gemalmaz)
Bavê wê di 46-saliya xwe da miriye û li ser wî sitraye.

*Min go bimbarek musadeke
Ew bave Kenên û Pullêye
Bave min çû nav pezî qurbanê
Lo qurbano va çi yi
Gidî ezê
Hesavê male bavî min î giran e
Eptilayî telebe ye pê nîzane
Şevkiyi çûki danî ber pêz e
Te bîra min dîkir
Ez nîzanim dîgo feleka xayîn e
Li helâ rê ye
Sîlavê gundîya gişka lê ye
Go ya bimbarek musade ke
Ew bave Kenên û Pullê ye
Bave min e, çûye nav pez e*

*Miradî bavî min
Lo qurbano va çi
Ji deh ewlada yek neda ber qedayê te
Eyvax eyvax cigera me qul kirin*

Şare: **Rehma Osikê**
Li ser birangê xwe Yîwişî Osikê şrandî.
Ew terî ser kerîya, serlêdana şivana û li wir di 46-saliya xwe da bi qirîza dil dimire.
1ê nisana 1965an/gundê Mikaîla

*De berdê berdê, felek berdê
Berdê berdê felek berdê
Çimi pelto medi erdê
Ezet, Meho malûmilîkî xu gî bifroşin
Kekî min î axa bi gencî mekin erdê.
Bîra bîra Yîwiş bîra
Ezê çûm qire bellâ
Şivana ser dayî ser kevîra
Bîra bîra
Bîra xangê te bîmîra bîra bîra
Erew rawî kem herin mezelî gazê
Lê dixê bayî talazê
Kekem sala çûnê dîgeriya eyda qurbanê
Xelke îsal li ser dîke bayram nemazî.
Bîra bîra
Bîra bîra Yîwiş bîra,
Bîra xanga te bîmîra
Ezê çûm qire bellê
Şivana seri dayî ser kevîra
Tême tême qardaş tême
Bîra bîra.
Rîya Kanîya Dûmên dirêj e
Ez nagême bîra bîra!
De bîra bîra Yîwiş bîra
Bîra xangê te bîmîra
Bîra te şîne min bîkîra!*

Ezê çûm qire bellê mi go va çi deng e
 Dora xu nêrî, gî çiçek e kesk û reng e.
 Ezê bi diyara qardaşi xu ketim
 Qurban li bir qelba xu raketî canik reng e
 Dev lêvê girtî pas û zeng e.
 Ezê çûm qire bellê
 Şivana ser dayi ser kevira
 Bira bira
 Bira bira Yîwiş bira
 Bira xangê te bîmîra.
 Bira ware yekî nîsan ê ji mal mere!
 Bira! ruhi xangê li ber te digere
 Kekî min î axa li ser koma xu da vegere.
 Bira bira
 Bira bira Yîwiş bira
 Bira xangê te bîmîra
 Bira te şîna min bîkîra.
 Ez çûm qire bella mi go:
 Fazîl, Beko!
 Ka xadane mîya?
 Go nîzanim anê î way serî xu dayi seri rîya
 Çav dîki vesayite ku herî xadîya!
 Bira bira Yîwiş bira
 Bira xangê te bîmîra.
 Bira te şîna min bîkîra.
 Qonaxa qardaşi min bîlînd e
 Serra hêrge bîn ra gund e.
 Felek bira mala te bişewite
 Te çîma nego Îbîş Efendî axe gund e.
 Bira bira
 Bira bira Yîwiş bira
 Ezet bira, Hecik bira
 Bira xangê we bîmîra
 Bira we şîne min bîkîra.

Curukî, xezîneya keşfnekirî

Îhsan Türkmen

Osman Alabay, bi navên xwe yên nivîskarîyê Curukî yan jî Hewedî, re-
weşenbîr û wêjehezekî ku zû ji nav me
barkirî bû. Wî di salên 40î da dest bi
tomarkirina nivîskî a ştranan, kilamên
şînan, çîrok, mesele û metelokan
kirîye. Di wan salên ku hê ku hereketa
kurdî ya siyâsî bi rêk neketi bû, haya
wî ji Kurdiştanê û ji kurdûna xwe
hebûye û piştî salên 60î jî di nav hinek
partî û sazîyan da doza fikir û ra-
manên kirîye. Osman Alabay bi
hezaran berhem berhev kirine. Heta
îro tenê çend berhemên wî di kovara
Roja Welat, Özgürlük Yolu û
Bîrnebûnê da hatine weşandin. Xeba-
ta wî ya li ser ferhengê ku ji 40 hezar
peyvên pêk te û nehatîye çap kirin,
hêjayî behs kirinê ye. Wî di saxîya xwe
da hewl daye hinek ji berhemên xwe
bîke kitêb û biweşîne, lê ji ber hinek
sebeban wî nikarîye.

Yekemîn kitêba wî ya bi navê
“Qamişê Qul» di sala 1999an jî bo
çapê de hatîye hazir kirin, lê mixabin
nehatîye çapkirin.

Kitêba “Destana Qamişê Qul,
helbest û berhevokek ji çanda herêmê”

berî çend mehan hate weşandin. Di
kitêbê da Destana Qamişê Qul cîhekî
teybet digire. Her çiqas biçûk—mezin
herkesî navê vê serpehatîya dilşewat
bihîsti be jî, pirr kesan haya xwe ji
mesela Mircê û Xinto tune. Herkesî
ew newaya bilûrê yan jî zirneyê guh-
darî kirîye, lê pir kes nizanin Mirca
sêwî, keça Alişan Beg û Xintoyê hes-
inkar kî ne. Dibe ku navên wan jî pir
kez nizanin. Min jî nedizanî, yan jî ji
bîr kiri bû, heta ku ew textên wî ketin
destên min.

Osman Alabay, mesela Mircê
û Xinto bi du awaya nivîsiye: Yek,
mesela ku bi salan hatîye ji aliyê gel va
vegotin, ya duduya, bi awayekî destanî
ku mirov tama Mem û Zîna Ehmedî
Xanî jê werdigire. Destan bi awayekî
rêzên diwanî ku ji du rêzikan pêk tê,
hatîye nivîsandin. Destan ne tenê
neçûyînasêrî ya dilê du evîndaran e.
Curukî di wir da diroka kurdistanê,
bi taybetî jî ya eşîra Canbegan ya
sedsalan ku ji Musil û çîyayê Şengalê
bigre, bi war û war di ser Xarpêt û
Meletê ra heya deşta Konyayê bi
zimanêkî xweş neqş kirîye.



1933 - 1998

Koman heye ziman dev
Pêş da here gav bi gav
Zimanê me dayik û bav
Camêr rabe, bes e xew

Zimanê dayik, hingiv
Dibiriqe min a ziv
Ziman, ayam, av û şiv
Rêya rawat, kirî hîv

Hu bikin zimanê hev
Jin dibeze lehi av
Ronî xwe ra meke şev
Dilbirin, dilertze lêv

Kom zimanê xwe zani
Dawisti hemî banî
Çar avzem, yek e kani
Binatê Kurdistanî

Destana QAMIŞÊ QUL

helbest û berhevokê ji çanda herêmê

Osman Alabay
(Curukî)

Osmanlîya rabû dest bira'k
Singê Kurdan xistî tîrek
Kurd kirîn bişt û heşt kerîya
Holhol û zêr ketin berîya
Curukan pîrr heşp û mehîn
Dijmin gotî, Kurdan durxin
Pez û naxir, heşp dest girtin
Zarûzêç Firat rabirtin
Şah û sîltan, serok bûn hut
Xişîf da ser, qûn derva rût
Camêr û jîr, singê ket tîr
Zana kuştin, teva bûn jîr
Rawat helî, tune welat
Pê ra Firat, pa ra tîr hat
Musul, Xarput, çiya Şengal
Canbeg hatin, çiya Mangal
Per golê xwe, axzêk Sakar
Ne dewirî diz û binar
Dûr Malatya, vir Hayman e
Rê da mirî ne hezar can e

Min ew destana –ku nêzikî
50 rûpelê kitêbê ye– kêmîr 10
cara xwend û her carî ta' meke
zêdetir jê wergirt. Piştî her
xwendinê ez pirtir têgihîştîm û
min zêdetir jê hez kir. Herwi-
ha, helbestên wî yê din jî bi wî
awayî ne – hinek kurdistan, hi-
nek welatparêzî, dîrok û evînî.

Kitêb keti be destê we,
bixwînin û hewl bidin çenda ca-
ra bixwînin. Neketibe destê we,
hûnê bikaribin bi hêsayî yekê bi
dest bixin. Gava we xwend, hûnê
him ta' ma helbestên Cegerxîn û
him jî yên Ehmedê Xanî bigrin.

Hezar car mixabin ku min
ew kesa zûtir nasnekirîye û he-
zar carî jî kêfxweş im ku hê ji
bo bi dehan kitêba tekstên wî li
benda weşanê ne.

Çend rêzik ji beşên Mircê û Xinto

Mirca qenc

Mirc pijîqî, bihar havîn
Pêşîr hêkîn, kelmisk û bîn
Heval hogir, delal û şeng
Bejnê dirêj, bazin pîl teng
Li avzemê vexwarî av
Biskê dirêj, belek in çav
Bejna delal, pozî pij e
Dilî evîn, serî mij e
Zimane xweş qise digot
Tev bişqoriya manga didot
Sûkê gerîn, berbî û bûk
Birîye qil, sor in nenûk
Keçik û bûk, tevhev gerîn
Dilê sivîk, hişk hil rîn
Mirc û Xinto, çav hatin hev
Helîn hundir, negerîn dev

Xinto

Xinto sêwî, li hindê kal
Ketîn rêzê, çûne bişt sal
Camêr sûkê dûkan vekir
Hesîn kuta, tevşo çekir
Dibistanan kelem xwandî
Tiştî neçê, dil dawşandî
Pîl vekêşan, hişk avet gav
Şor axeftî, hingivî dev
Ketî dilê, xwaştêk xurî
Dikê sibe xweş diqirî
Mîr dewletî, çîya girê
Çavê belek, neçûn bîrê
Xewn û xilmaş, hêvî dur e
Hundir bi jan, dil ket tîr e
Hatî payîz, rabirtî sal
Mirc û Xinto, nehewîn mal



Ji xortekî Altîlarê kitêbeka lêkolînî

Adem Özgür

Kitêba lêkolîner û akademîsyen î xort Hacı Çevik, “Mali Konyayê kurd hene?” (*Konya’da Kürt mü var?*) ji weşanxaneya Îletîşimê derket.

Hacı Çevik xortekî ji Altîlarê ye. Ev çend sal in li ser koçberî, siyaseta û entegrasyonê lêkolînên akademîk dike û kitêba wî ya dawî jî teza wî ya zanîngehê bû.

Hacı Çevik, di kitêba “Ma li Konyayê kurd hene?” de qala pêvajoya damezrandina civaka kurdên Anatoliya Navîn dike û mela me dide ser koçkirina welatên Ewropayê.

Pîrsa wî ya sereke ev e: “Kurdên ku li Anatoliya Navîn bi cîh bûne, di nava netewperest û oldarên tirk da çawa xwe parastine û bi siyaseta re e-

leqeder bûne?” Hacı Çevik, di kitêba xwe ya nû de bersiva van pirsan dide û bi hevpeyvînan jî xebata xwe berfireh kiriye.

Her wiha kitêba wî di weşanxaneyê de girîng de derketiye.

Hacı Çevik, di serî de sipasîya xwe ji xwendevan û koma Bîrnebûnê re jî şand û wer got:

“Kovara Bîrnebûnê ji bo lêkolînê li ser kurdên Anatoliya Navîn berhevokeke girîng e. Dema ku min kitêba xwe dinivisand, min ji Bîrnebûnê pir sûd wergirt. Li aliyê din, bi piştgirîya kesên ku li dora kovarêne, min xwe gîhand zêdetir kesan û bi wan re hevpeyvîn kir. Ez

dixwazim bi vê fersendê sipasîya xwe ji nivîskar û xwendevanên kovara Bîrnebûnê re bikim.”

Hacı Çevik, li gundê Altılarê hatîyê dinê. Lîsansa xwe li Zanîngeha Kocaeliyê, li ser Zanista Siyasî û Rêveberîya Giştî temam kir. Mastera xwe jî li Zanîngeha Enqereyê, li ser Zanista Siyasîyê qedand. Têze xwe ya doktorayê jî li Zanîngeha Potsdam û Zanîngeha Hacettepeyê, li ser beşên Lêkolînê Xebata Civakî-Koçberîyê de didomîne. Têze wî li ser nasnameya siyasî ya kurdan, kurdên Anatoliya Navîn, entêgrasyon û koçberîyê ye. Makaleyên wî di kitêb û kovaran de tîne weşandin.





Bi Hamo Celikan re li ser muzikê

Adem Özgür

Ez û Hamoyê mala Hemkê Mûsê, yanê Hamo Celikan, ji gundê hev in. Ev şeş sal in em hevdu nas dikin. Sala ku min deşt bi rojnamegerîyê kir, wî ji kilamên xwe parve dikirin. Şeş salan berê min di heftenameyaka kurdî de deşt bi kar kiribû. Min bi piranî li ser çand û hunera kurdî nûçe çêdikirin: Li kuderê ştranbêjek, derhênerek, wênesazek an jî şanogerek kurd hebû min bi wan re hevpeyvîn dikir. Naskirina min a Hamo jî bi vî şiklî deşt pê kir û ji wê salê û vir ve em karên hevpar dikin.

Me bi hev re belgefilmek bi navê “Dara Mestê” amade kir û ev kara ji

bo me herduya jî karê yekem bû. Ji xeynî wê me di çend qliban da kar kir. Ew ji bo her xebatên mûzikê dibêje, “Bêguman li ba kurdên Anatoliya Navîn kilamên ku heta niha hatin ziman rêyên girîng vekirine lê tiştên nû jî lazim in! Divê, kurdên Anatoliya Navîn mûzîka modern jî nas bikin. Ez kilamên xwe veng çêdikim.”

Li gor Hamo Celikan, ahenga mûzîka modern û ya kurdî pir baş e. Bi vê minasebetê qala karên profesyonel jî dike: “Bi ya min eger tu karekî cidî bikî, tu dê wek profesyonel werî qebûlkin. Ya ku

ez dikim jî ev e. Ez çend meh in li ser kilamên xwe difikirim, dixebitim û wana derdixim holê. Loma, kesên ku guh didin ser min, ahenga mûzîka modern û ya heremî dibihîzin û jê hez dikin.”

Hamo Celikan, di sala 1979an de li Danimarkayê ji dayîk bûye. Li wir mamoste ye. Mêla wî li ser kilamên kal û pîrên xwe ye: “Heval û dostên min, malbat û gundiye min ji kilamên min pir hez dikin. Di kilaman de xwe dibînin. Ji ber vê yekê ye ku ez ne bi zimanê Danimarkî, bi zimanê dayîka xwe kilaman distirê.”

Hamo Celikan, di her sohbetê de balê dîkşîne ser diyalekta ziman û bi ya wî mûzîka herî serkeftî ji diyalekta heremî ye: “Divê mûzîk siruştî be! Ez wek kurdekî ji Anatolîya Navîn, stranên xwe bi gotinên dêûbavê xwe tinim zimên. Çimkî; ew ji gotinên min fam dikin. Di kurdewariyê de rojhilatî-rojavayî nîne lê ziman fenomenekê taybetmenîyê”

Havîn, ji bo xelkê me yê li Ewrûpayê ger e, dawet e, sohbetên li ser balkona ye. Lê Hamo Celikan, li havînan karên din jî dike: Li çol û banîyan, li der û deştan, li kanî û zozanan digere û şivan û cotkaran ziyaret dike. Ji bo xebatên xwe çavkanîyan lekolin dike. Ji ber vê yekê ye ku ez dikarim

bibêjim qîmetê dide kar û barên xwe! “Kal û pîrên me li vir bi şûn bûne. Ev der em in. Eger tu dixwazî bo kurdên me kare kî baş bikî, heqê xwe qlibên xwe jî li warên xwe bikşîni. Ez jî wer dikim.” Her wiha li ser belgefilm û anîmasyonên kurmancî jî fikrên wî yên nûjen hene: “Dinya tê guherîn! Dem derbas dibe û kurd li her derê ne. Divê em ji bo pêşeroja xwe, ji bo nîfşên nû jî karên dokumenter û anîmasyonan bikin. Karên klasîk heta cîhekî, gotin/şor heta cîhekî... Dîmen jî divê!”

Hamo di her sohbetê de qala kovara Bîrnebûnê dike. Ew ji bo her xebatên xwe ji kovarê sûd werdigre û her hejmarê bi dilgermî dixwîne û ber bi zarokatîya xwe ve diçe. Naskirina xwe ya kovarê veng tîne zimên: “Ji bo bernamêyekê, li 2005an bi hevalên xwe ve çûne Almaniyayê. Birayê min, ji wir hejmareka kovara Bîrnebûnê jî bi xwe re anîbû mal. Min ew hejmara di nav kitêban de dîtibû. Min mêla xwe dabû resimê bergê. Mîna gundê me xuya dikir. Min kovar vekir, dest bi xwendinê kir. Qala me û zimanê me dikir. Bi devoka me bû. Hekê, helbest û çîrok bi zimanê dê û bavê min hatibûn nivîsandin. Ez pê şa bûm, pir çû xweşîya min.”

Hamo, serpehatîya xwe ya ko-
varê didomîne:

“Li ser vê meselê re 5–6 sal der-
bas bûn. Min roke, ji lawikê xwe
re çirokeke danimarkî dixwand
û lawikê min pirseke girîng ji min
pirsî: ‘Tu çima çirokên bi kurmancî
naxwîni!? Li ba kurmancan çirok tu-
nene! Min lê mêze kir, şaş bûm ku
jê re bêm çî! Di ser wê re deqeyek
neçû, Bîrnebûn hate bîra min. Di wê
hejmarê de çiroka ‘Lawikmar’ hebû.
Min ew çiroka ji lawikî xwe re xwend
û pir çû xweşîya wî! Êpê meraq kir
û şa bû! Ew ro va roka ye xwendina
Bîrnebûnê ji min re bûye rûtîn. Ez
ji hevalên xwe yên nêzik re dibêim:

Bîrnebûn hafiza û dînamoyê pêsve-
birine zimanî me ye. Ji bo vê yekê ye
ku divê em qîmeta Bîrnebûnê biza-
nin! Ji Bîrnebûnê feyde heynin û di
her aliyê de hilberînin.”

Qlibên Hamo Celikan li ser
Youtubeyê tîen belav kirin. Qlibên
wî yên ku heta niha hatin weşandin,
ev in:

Lê levendê, 2015

Bûkê, 2015

Dayê, 2016

Şivano, 2017

Kezê, 2019

The Breath of the Hills, 2020

Dil, 2020



Qerfo

Stîleke nu ye. Bêhed, bêsansur û otosansur e. Rexne û henek in.
Bêtirs in, lê zik û hîsên kesî naêşînin. Çav û mêjo vekirî ye.

Seyfi Dogan

herkes li ber derîyê xwe
korona
li ber her derî

yustisiya delal
çavên xwe veke
hesinê zengarî

herkes rastîyan dibêjê
gelo pêyva derew
çawa xulk bûye

rexnên kurdan
bar giran in
hewa aramî

li ser kitêbên tarîxî
konê pîrikê
mûmên vemirî

rengên kitêbên
ronakbîrên kurda
reş û sipî ne



Quto

li ber dikanê qesap
pisik û kûçik
berî boş

baran barî
cole mê xenê
kenê zaroke

ha îro ha sibê
dereng man
gulên sor

sermê tama
biharê nehişt
keçike bi kezî

vîzyon
hîlbêjêre
hêvî

Henek

Ferîdun

Ramo û Hes ê bi şev di kêlekê goriştên re derbas dibin.

Herdu ji yê bizdiya ne.

Ki hişnîyekê dibîzine xwe bi hevdu da dinûskînine.

Hes, sewê ku tirsê berteraf û xwe rehat bike çexê Ramo dibe:

– Ramo, bi te li ser dinê mirî pir in, an jî zindî?

Ramo ji bo ku tirsê ji bîr bike ji xeyalan dinêke xwe ava kiribû!

Ji ber wê yekê jî Ramo dengê Hesê nebihîst.

Hesê carak din jê pirsî.

Ramo heşyarî xwe bû!

– Tu tewê yî çî?

Hesê dîsa pirs kir.

Ramo doralîyê xwe mês kir, çî rind! Ji xwe re ezman temaşe dikir û ketibû nav xem û xeyalan.

Ramo xwe bi xwe “Magî!.. Va ji ku derket”?

Ramo çexê Hesê bû:

– Yên mîna te jî bêjmirî û teve hesêp bikî zindî pir in!



Zivîştana, Ramo û Hesê li odê Osî Malê Heydar rûniştine. Zivîştanî hema hema li her mehelê odek hebû. Heval, cîran, dost û ehbab li wir digêştine hevdu.

Suhbet, henek dikirin û diketin rû hevdu. Odê wê demê wek xeberajansîyê bûn! Çavkanîya xeberan bû.

Qala serpehatîyên xwe dikirin.

Carcaran jî dengbêj dihatin û heta berbangê kilam distiran. (Xwedîyê odê hêjîr, mûj, xoşav hwd îkram dikir. Xizmetî salmazinan xortan dikir.)

Hesê dîsa dest bi pesandina xwe kir û demeke dirêj da pê.

Hesê li dawîya pesandinên xwe, dest bi qala jîrbûnyîna xwe yê demê zevîyan kir.

- Dema ku ez î ciwan bûm, fatilê tirpanê min î mîna devî biçerekê fere bû.
- Ne weng e, Ramo? Ramo bi salan emsalê min e, ma Ramo bê!
- Ramo, giran û giran serê xwe hilda û civat temaşa kir bi şunda
- Hesî mino! Ez wê wextê hîng nehatibûm dinê!



Hesê bi Ramo re got:

- Ji partîyê me siyasetmedar ê werine gund, em herin temaşe kin. Tevda terin ortê gund cîhê mitîngê. Pir kes nehatibûn. Ji xwe gundekî biçûk bû. Nufusî gund sedûpêncî kes bû. Siyasetmedar dest bi dengkirina xwe kir:
- “mala we ava be!
- Bi hezaran însan hatine! Em, vê piştgirtîya we ji bir nakin!
- Partîya me ê alîkarîya we bike!
- We çi xwest em ê amade ne!
- Li ser seran, ser çavan!
- Bes, hûn bixwazin!”
- Gundî destan li hev têxine.
- Ramo jî destan li hev têxe û hundirî destên xwe yî sor dibine.
- Piştî mitîngê, Hesî ji Ramo dipirse:
- Tu neyî ji partîya me yî te çima alîkîş fikir?
- Ramo bersiv neda Hesê. Hesî ji pîst nabe!
- Ramo yî dizane ku ji Hesê xelas nabe û çexê Hesê dibe:
- Magî, ji heqê derewan dihat!...

Helbest

Seyfi Dogan

bîhnên gihîştî li ser rêwîtiyê
li gor dil, mêjo, tama dev û zimanî xwe
hêdî û hêdî hîlbijêr
dûma dinê dûmake dirêj e
barî tecrûban giran in
li zanatiyê hewês bike
ma hîn bûn te mest, zewq û kêf bi te de
fîkrên teze bicerîbîne
rengên nû xulk û serpêhetîyên xwe qelaw bike
ma herdem peyvên bi tam li ser zimanî te gul vekin
piştî peyvên xweşî qalîng e
deme ku bêhn teng bû jî
ji ewran wênan
ji leylanê jî ji xwe re dinêke xwe ava bike
ma şev bi terazîya te be



dema pandemiyê
ez şer dikim ku li derve wenda nebim
ez ji xwe re dilsoz bim
her sibe ez xwe ji cîhe ku ez lê me hiltînim
û nêzê agir dikim
ez herroj hewl didim ku pirên rengîn
di navbera beden û giyanê xwe da bi dialogên
ramanên maqûl ava bikim

Etê

Hızır Akbina

Wextak jinan tu bi rê kirin
Ez li dû te girîyam
Min got “dayika min mebin”
Gotin “megirî, dayika te diçe” biheştê
Ya bi evarê were
Tu natî
Te ez xapandim
Bê te xewa min nehat
Min kincên te kirin hembêza xwe û pê raketim
Bavê min ji min pir hez dikir
Hetak’ çû Xatik anî
Got “Xatik êdî dayika te ye”
Tu ê ji wê ra jî bê “Etê”
Ez birim hemberî Xatikê
Min nikari ez bêjim “Etê”
Çavên min tiji bûn, tu hatî ber çavên min
Min çavên xwe girtin lê
Dîsa jî min nikarî bêjim “Etê”
Xatikê mîna te ji min hez nekir
Nebû dayika min, nebû
Ez îro rabûm
Sandîqa te vekirîye
Û kincên te yên wek herîr
Dayîne elekçiyê
Ez bi dû elekçiyê ketim
Min got: xaltiyê, kincên dayika min mebe
Wana li te nabin, mebe!”
Elekçî li min çex bû got: “yavruum, kuzuuum”
Û ew jî giriya
Tenê kitana te ya spî ya dor bi morî da min

Bêhna te jê dihat
Ez her roj bi wê raketim
Ooofff ooofff etê derd û kulên min pir in
Dayika min, ez hatim wan bi te ra parvekim
Etê, îro Xatik li min qirîya
Got: “tu îza dayika xwe çûyî!”
Got: “kur sêwî” û ez ji mal qewitandim
Ez jî hatim ser gora te, mezelê te
Giliye xwe bi te bikim
Rabe! gilî min daxe
Bêje! sewîya min ê hatiye
Bêje! xezala min ê hatiye, bindesta min ê hatiye
Oooyyy, min pir bîra te kiriyê
Rabe! min bi ser dilê xwe de
Eyamî pir sar e
Ez qefilîm, ez cemidîm etê!
Min di hembêza xwe ke!
Dayika min, ji te bi şûnva
Bavê min jî sêwî ma
Duh hat oda min
Kitana te dît
Û bi ser da girîya
Got: “hawarr bermalya min
Hawarr şorxweşa min
Hawarr jîra min»
Sewê te pir girîya
Ew dilê te yê germ
Ew şorên te yên xweş
Oyyy, Eta min
Rabe! êdî em herin mala xwe
Em ê damîşa te nabînî
Rabe! tu hertim di dilê me da yî
Dayika min, Eta min.

Henek/Yaranî

Hizir Ateş

Xwendevanên hêja di navbera evqas derd û kulan da nivîsandina pêkenokan karekî zor e. Em çi bikin ew jî gerek e. Şoreka bi kurdî heye: “Ken bê, ara te li qula dîwar e.”

Bijîjkê kurd

Me hîro etik bire doxtir. Doxtir muayene kir. Dêrde wê gotin. Reçeta wê nivîsand. Dor hate perên muayene dayînê.

Doxtir got: Teyzeciğim 120 lira

Etê got: Çoxtir qurban

Doxtir got: Senden 60 lira alayım

Etê got: 60 lira gîştikê?

Doxtir got: O zaman 20 lira ver yeter

Etikê di ber xwe de kire timetim, “kûçikî wê jî negire nabe!”

Doxtir bi kenekî bilind kenîya û got: Etê ez wan jî ji te nagirim.

Etik mehçûb bû, fedî kir û got: Weey! Qurban tu kurmanc bûyî?

Ji ba min jî doxtir gîştik tirk in.

Nava zirav

Doxtir ji meta Fatik pirs kir: Kudera te dêşê.

Meta Fatik fikirî û got, gelo bi nava zirav re çi dibêjin?

Çexe tirkî kir. Bi naz û diz got “benim ince belim ağrıyor.”

Doxtir li çavên meta Fatik mêze kir, kenîya.

Got: Oooo! Ne demezsin belin de çok inceymiş.

Z (RH) negatîv

Hemşîre hat ba nexweşê me û got:

– Sê çar şûşe xwîn gerek in.

Bavê nexweşê me li çavên me mêze kir.

Me got: Em ê bidin!

Hemşîrê: Her kes gruba xwe ya xwînê û navê xwe bêjin.

Min got: A Rh pozîtîv.

Hemo got: B Rh negatîv.

Dor hate Hesê, min mêze kir ku serê xwe kişande nav milên xwe, paşta paşta terê.

Got: Ya min nabe, ya min nabe! Ya min Z Rh negatîv e.

Zörtö Beyler

Li gundên me yên li Anatolîya Navîn piranîya kesian leqebên xwe hene. Tu kes ji wan leqeban xulî nabe. Car caran navên wan tî jibîrkirin û bi leqeba xwe tîne nasîn. Ji wana yek jî li gundê me Hesên bû. Leqeba wî Zorto bû.

Rojekê Zorto tere dibistanê ku rewşa xwendewanê xwe bêvîse. Li ber derî xwendevana nobedar dibêje: *Kiminle görüşeceksiniz?*

Zorto: *Müdür beyle görüşeceğim.*

Nobedar xwe bi xwe difikire û dibêje gelo bi tirkî ji Zorto ra çî dibêjin?

Nobedar tere hemberî Mudirê dibistanê û dibêje:

Zörtö Beyler sizinle görüşmek istiyor.

Dengê bavê min!


-1-

Hayrettîn Güven

Bavê min, Mihemmedê Seîd, xizan bû, sewî bû ji ber ku bavê xwe zû miribû. Xwendin û nivîsandin nedizani.

Lê tim digot: “Min nexwend, hûn bixwînin kurê min. Merîyên ku nexwendî kor/kûr in.”

Kurikên xwe gîştik bi xwendin da. Ez bûm bijîşk û lekolinêr li ser kanserê. Xûşk û birayên min jî piraniya wan lîse xilas kirin.



Mihemmedê Seîd

“Piştî roja qiyametê”

Wê rojê qiyametê bi çûk teqîya li mala me. Qiyamet li ser serê min teqîya.

Salên min belkî 7 belkî 8 bûn.

Hezret Îsrafil pifa sûrê kir lê deng tenê li mala me hat bihîstin.

Min bihîst.

Bavê min bihîst.

Dayika min bihîst.

Roj roja piştî qiyametê bû.

Sibê zû bû. Melê azan xwendibû.

Dikancîyek diçû, dengê pakijkirina qirika xwe dihat guhê min.

Derîyê mawênê bi qirçe-qirçekê vebû.

Dengê bavê min hat!

Bavê min: “Mokê, lawik rabû?”

Dayika min: “Na, î hîng raketî”

Min bêdeng bang kir: “Na, ez raneketim, ez payî me. Lê dilê min zîz e, cênigên min zîngezîng in.”

Dengê lierdêxistina ling nizîkê odeya min dibû.

Derî vebû.

Bavê min ket odeyê û li balgîyê min rûnişt. Destê xwe li porê serî min gerand û bi dengê giran got: “Tu raketî Xoyratîno?”

Min her tişt dibihîst lê min xwe ji wan deran nedikir.

Salên min belkî 7 belkî 8 bûn.

Qiyamet li serê min teqîya.

"Qusûra min mês meke lawîkî min. Ez duh pir bi hêrs bûm, min li te xist. Ez poşman im. Ez carek din nakim. Ez lêborîna xwe dixwazim ji te"

Min çavên xwe venekirin lê min rûyê xwe guherand alîye din. Ez nizanim çima lê min pir fedî dikir bo rewşa bavê xwe.

"Ez lêborîna xwe dixwazim ji te"

Ji min?

Ez 10 salan bi hev ra mezin bûm wê rojê.

Salên min belkî 7 belkî 8 bûn.

Şîna li şaneşînê

Salên min belkî 9 belkî 10 bûn. Dayika min şîn dikir li ser şaneşînê. Min qet tu tişt fehm nedikir, çima bavê min li dayika min bi hêrs bûbû, lê girîyê dayika min û bêkesiya xwe qet ji bîra min neçû.

Dayika min got: "Here lawîkê min, bangê xalê xwe Cewcet ke."

Ez çûm, min bangê xalê xwe kir û em hatin li odêyê rûniştin.

Xalê min got: "Ênîşte, va çi eyba zeyba, çir bû dîsa?"

Ji dengê xalê xwe yî Cewcet yê nermik min fehm kir ku ev tiştêkî normal e, li malan. Piştî bîskeke xalê min çû ba dayika min. Ew hatin

li hundir rûniştin, dayika min çay çêkir, me vexwar.

Sedema qîr û barê şiveka sar bûye.

Tu carên din min bavê xwe bi hêrs, dayika xwe bi çavên girî nedît.

Salên min belkî 9 belkî 10 bûn.

Bavê min wek şagirtê min

Heta 15 salîya min, ez şagirt, bavê min mamosteyê min bû. Piştî 15 salîya min, ji ber ku min pir dixwend, ez bûm mamoste û ew bû şagirt. Û di vê derbasbûn û rolgûherandinê da qet kesî ji me rola xwe ya nû ecêb nedihasiwand.

Bavê min ji min re behsa pêxemberan, eshabên wî wek Xalid bîn Velîd dikir. Digot "Lawîkê min, şerdên îslamê ne pênc in lê şeş in û ya şeşan, edeb e." Ji ber wê jî min şerdên îslamê wek şeş şerd qebûl dikir û dişopand.

Qala Mihemmed Elî dikir, destê xwe digûfîst û digot "a ha Mihemmed Elî weng lê dixist." Destê diavit hewayê. Bi bavê xwe va min jî lê dixist. Em dibûn sê kes: ez, bavê min û Elî. Gawir yek kes bû û navê wan me nedizani lê ne girîng jî bû.

Paşîngê ez gir bûm, min zanîngeh xilas kir û birayê min Cemîl jî bû hafîz. Rojekê kesekî ku min û Cemîl ji hev dernaxe got: "Mihemmed, ji

lawikan kîjan î hafiz e?” Bavê min Cemil nîşan da û got ”Ê hafiz veya ye” paşîngê ez nîşan dam û got ”lê îlmê vî hîng mezin e”.

Min fehm kir ku ji ezber da xwendina Qûranê ji bo wî ne girîngtir bû ji zanîna îlmê Quranê.

Li şevên ”Katê” yên reş da, li bin kelekela havînê da em bûn heval. Me sûwax dikir tevhev. Ew hoste bû, ez jî karker. Ji roja mektebê paşî da heta roja vekirina mektebê me tevhev kar dikir. Rojek ji rojên Xwedê min nedît ku wî camerî hîle yan jî xapandin kiriye nav karê xwe. Pir caran ez heldikişam ser karên sûwaxê û min jê re nivdîwar lêdixist. Camerî belkî 3–4 saetan ew çamûra dûz dikir, ber diwaran tiji dikir. Sebra min jî pir bû û heta ku ew sûwaxê dike, min çi rojname, xet û berat ditîtin min dixwend.

Bavê min kerpîç jî çêdikirin. Qalibê kerpîçan erebek çamûr pê nedikir. Qalib ji çamûrê tayand, ji ber wê pê nedikir. Paşîngê me bi wan kerpîçan dûwar radikir. Her qûl û qawalên dûwar ji çamûrê tiji dikir. Li der vê çi hilik hene min jê re li ser îskelê qûç dikir û wî jî pê ber dûwaran tiji dikir.

Rojekê diya min li hêrs bû û got: ”Mihemmed, te dûwarek çêkir xelandina wî jî hesaw/hisab bike. Paşîngê dûwarên te nêne xelandinê.”

Şîretên ku nên jibîrkirin

Wexta ku me ji xelkê re kar dikir, me nanê nivro dida ser wana.

Salên min belkî 15 belkî 16 bûn.

Ber her karî bavê min şîret dida digot:

”Te tişteke xwest, ji keçka malê mexwaze, ji jina malê bixwaze.”

”Ji xwarin û wexwarinê tenê avê bi devê xwe bixwaze. Tiştên din ku wana bi xwe binin/hunandin em ê bixwinî.”

”Ku tu çûyî tişteki ji malê bixwazi, hîng tu neketî hûndir bikuxe ku ma bizanin tu têyî.”

”Jin di hêla te re derbas bûn, li erdê mez ke ku ma fedî nekin. Ma tu ne yî çavpêl bi!”

Bawerîyek bêdawî

Bawerîya bavê min bi ola îslamê tam bû. Bi terîqeta Qadîrîyan va giredayî bû. Rojekê ji gundê Babo yê Eqse-rayê, ji gundê Êrkeçîgan gimgimek av una mal û got: ”Mokê, va ava gundî Babo ye. Şîfa ye. Bi kurikan de ma vexwin. Lê bi xwe her roj çend caran vedixwar. Ji ber wê jî av di heft rojan da teva bû. Carek din çû gundê Êrkeçîgan. Her çûyîn birek pere digirt. Di mehekê da cara sisêyan dayika min aciz bû û ser gimgim her carê ku av kêmbû jî kanîyê tiji dikir. Av bi mehan teva nebû. Bavê min got: ”We

dî, ava gundê Şêx çiqes bi bereket e?”.
Em kenîyan lê wî fehîm nekir.

Salên min belkî 22 belkî 23 bûn lê
bawerîya wî bêdawî bû.

Kurdîyek bêşerm

Bavê min rojekê hat û got: ”Xoyratî-
no, ê tewîne li Enqere xwelîya zevîya
analîz dikine. Were heyran, em jî ya
xwe pewin pê mezkirin bidinî?”

Di bin kelekela havînê de em li
motirsîkletê sêtekerî siwar bûn û
çûn zevîya me li jêr Bîradirêj li Katê
ye. Me ji her koşê tîskeke/hinek xwelî
girt û em hatin mal. Roja din em li
postayê siwar bûn çûn Enqereyê. Li
termînalê em dehatin û li dolmîşên
Enqere siwar bûn. Min zanîngeh dix-
wend wê çaxê. Di hûndirê dolmîşê
da bavê min dest bi kurmancî kir.
Dengê xwe qelew bû. Dengê xwe yê
bilind, kurmancîya xwe ya bê peyvên
tirkî, di dolmîşa heta qirikê tiji da.

Ez nizanim çima lê ez di erdê da ha-
tim xwarê. Min got: ”Bavo, xwedîkî
dengê xwe bilind meke bi kurmancî,
kes te fêhm nake. Eyb e!”

Piştî çend deqqan ji ber kelacana
analîzê dîsa dest pê kir bi kurdî bang
kir. Min mêze kir çareserî tune, min
jî mina bavê xwe bi dengê bilind
dest bi kurdî kir. Qe min digot, heger
em herdu jî mina hev bibin belkî eyb
neyê girtin.

Salên min belkî 21 belkî 22 bûn.

Rojekê lawê min î 5 salî got: ”Ba-
vo, wexta ku tu hatî mekteba min
(diçû hêlûna zarokan yanî *dagîs* bi
swêdî) bi min re bi kurmancî deng
meke. Eyb e! Kes te fehîm nake.”

Wê demê bavê min hate bîra min,
li dolmîşa Enqerê min gotibû ”bavo
bi kumanci deng meke, Eyb e! Kes te
fehîm nake.”

Salên min belkî 36 belkî 37 bûn.



Di vê sedsala nû di wêje de, bi taybetî jî di warê helbestê de rêbazeke nû, şêwazeke nû dest pê dike. Di berîka herkesî de telefonê mobîl ku wêneyan diqşîne heye û em her kêlî û rewşa xwe bi wan telefonan diqşînin û car carna jî li bin, li ser, li hundir van wêneyan çend

gotin, helbest û hwd. dinivîsin. Ji ber ku gotin yan jî helbest ligel wêne ye, wêne bi peyvan re alîkarî dike û wateya hevo-kan temam dike, xurt dike. Bi vî awayî jî stîleke nû, şêwazeke nû di wêje de li cîhanê destpê dike. Min navê vê rêbazê li ba xwe kir "wênename".

Holik

(Bi devoka kurdên reşwan)

Dilgeş li zozanê li siya xêni rûniştîye, zarokek heft salî ye. Ew dixwaze tiştêkî bike, dem dema lîstîkê ye.

Li zozanê kevir pir bûn, Dilgeş kevir berhev kirin. Xweli jî pir bû, wî xweli gihand ser hev, ka li xweliyê qelivand, av lêkir, ew li hev xist û kir çemûr. Yek bi yek kevirên xwe bi çemûrê dan ser hev û xaniyek çêkir, dîwar biqasî bejna xwe helçînî, pencere û derî jî çêkir, text anîn dan jor, ser text çemûr lêkir, naylon kir û ser naylon dîsa çemûr kir, bi vî awayî ban jî çêkir û xaniyek ava

Mûlla Evîndar

kir, xaniyekî ku firehî û bilindiya xwe biqasî bejna wî.

Dilgeş bi kêf, bi şanazî, bi serbilindiyekê li xaniyê xwe nêrî pê şa bû. Heyam pir germ bû, ro diqijiland, xanî yên ku ji çemûr û kevira çêdibin pir hênîk in, Dilgeş kete hundirê xaniyê xwe, lingên xwe bi dirêjî dan ser hev, ji xwe re rûnişt û vesîniya xwe heyna. Berxa belek hat li siya xaniyê wî mexel bû, çûçikeke ewr hat li ser bana xêni dawestî.

Dilgeş pir dilgeş bû.

Senfonîya mirinê

Berîvan Keskîn

Bihar e, hêdî hêdî gîyayên di ber dîwarên hewş û xanîyan de şîn bûyî xetên xwe xêz dikirin. Gulpikên bi şaxên hişk ve mezin bûyî mîna ku la êdî der bibe û bikeve lê hatîbûn û berf ji kolanên gund ber bi serê çiya û giran ve vekîşiyabû.

Berî nîvroyeke biharê bû hewş bi dengê her çar birayên min ên bi ser xarên mîna gerestêran li erdê belav bûyî xwar ve hatî û bi galegala mêrên gund yên li ber dikana bavê min ya bi ser hewşa mala me ve bû kom bûyî tijê bûbû. Meta min di hewşa mala me de bêyî ku haya wê ji xweşikîya biharê hebe mîna morikan diçû û dihat. Min demekê ji dûr ve li çûyîn û hatina meta xwe temaşe kir, pişt re min biryar da ku biçim ba meta xwe, dibe ku rojbûyîna min hatibe bîra wê. Lê mixabin rojbûyîn çî halê çî ji ber xwîna daraftî ser spîkê çavên wê rondikên di çavên wê de kombûyî sor dikirin. Te digot qey volqanek e li ber teqînê ne çavên wê. Ez ji meta xwe vegeyriyam çûm ba birayên xwe. Min mista xwe li nav xarên wan xist yek ji xaran girt û min bazda. Lîstika me ya her carê bi girîyê zaroyekî bi

dawî dibû dest pê kiribû, heya ji min hat ez bezîyam di dor xanîyê me û di ber aşxaneyê meta min îro ji xwe re kirî cihê tawafê re di nav bêhna darsincan re em gehîştin pêş dikana bavê xwe. Min xwe di nav galegala mêran re kişand û min xwe avêt paş pişt bavê xwe, destên wî yên di nav porê min de bigeriyên şemaqek li binguhê min da û bi wê şemaqê ez dernexûnî erdê kirim. Birayên min ji tirsan wekî xaran belav bûn her yek bi alîyekî ve bazdan. Ez demildest rabûm ser pîyan û min pişt bavê xwe da bavê xwe ku biçim. Bavê min ji paş ve rahişt milê min û ez hembêz kirim. Dema ez hembêz kirim çavên min bi çavên wî yên renghingivîn ên ji girî sor bûyî ketin. Min xwe ji hembêza bavê filitand bi girî berê xwe da malê.

Wê rojê ji bilî dapîra min Edûlê ya her roj bi çend jinên hemsalên xwe ve li malekê kom dibûn û bi awayeke efsûnî behsa serpehatîyên xwe yên bi êş û zehmetîyan dagirtî dikirin. Haya tu kesî ji hebûna min jî tunêbû. Dema ez bi alîyê hewşê ketim bi zorê bişirî min, ez jî bi çavên girî bişirîm wê û min berê xwe da malê.

Hingorîya çarê nîsanê bû, roj di şaneşîna doralîyên wê bi cam û şivên hesinî hatî girtin ve perçe perçe diçû ava. Dapîra min dîsa bi pîrejinên cîranan ve li tenîştî diwarê hewşa me rûniştî bûn. Çar jinên şarareş bi ser kitanên xwe yên spî ve gîredayî li hevdu kom bûbûn û axaftina xwe bi destên xwe yên qermîçî, mîna ku her destekî wan şefê orkestrayekê be bi vir û wir ve dilivandin, axaftina xwe gur dikirin. Min bi çavên girî hewl dida ji lîva destên wan yên qermîçî ya di navbera şivên hesinî ve bir bi bir dixuyan bigihêjim mijara suhbeta wan. Ji alîyekî ve jî bi mereq li benda çûyîna wan jinan bûm, teqez dapîra min rojbûyîna min ji bîr nekiribû. Lê tu niyeta wan jinan ya çûyîne tunebû. Pê re ji mizgeftên gund li pey hevdu dengê melayan bilind bûn. Lê ew jinên serbişar ji şûna xwe nelivîn her ku diçû lîva destên wan ên qermîçî hişk û leztir dibûn, her ku diçû jinên şarareş bi ser kitanên xwe yên spî ve gîredayî li dora dapîra min pirtir bûn. Spîkê çavên meta min yên xwîn daraftî û galegala mêran jî beşdarî senfonîya jinên serbişar bûn. Por û kezî hatin qetandin. Rû û hinarik hatin rûçikandin û senfonîya mirinê qêriya û got: dayîka te mir.

Kurmancî

Navê xwe şîrîn e
Xweşik û rengîn e
Stran û evîn e
Zarê Mem û Zîn e

Helbesta Xanî ye
Nalîna Feqî ye
Bi giştî evîn e
Rêza Cîgerxwîn e

Şîr û şekira dev
Pê hez dîkin ji hev
Distirên em pê tev
Bi zîman û bi lev

Mûlla Evîndar

Ji çarînên Omer Xeyam

Wergera ji farisî: **Ehmed Mîlan**

Di dayira asîman da ne peyda ye xor¹
Meyê vexwe bi xweşdîlî ku dor bibe cur²
Nobet³ carak digîhêjê te ax û nale meke
Cama⁴ ku hemûyan bo meze⁵ dicivîne ber dor

Ey dil hemû malê dinê xwestibe bigire⁶
Baxê şahîyê bi gul û çîmen xemilî be bigire
Û hînga ser wan hişinayan şeveke wek şevnem⁷
Rûnin bi şevan û serê sibê wek şevnem rabe

Lêv ser lêvên kûzikê⁸ daynim ji mebesta niyaz
Heya ji wê bixwazim bo emrê dirêj û rêz
Lêv ser lêvên min dadinî û digot bi raz⁹
Meyê vexwe ku bi vê cîhanê nayî dîsa baz¹⁰

Em lo'bet¹¹ in û felek lo'bet e dîsan û baz
Li ser heqîqetê ne ji ser xiyal û mecaz
Çendekî me li ser vê mebestê lîstik kirin
Em çûn bi sendûqa edem¹² yek yek baz

¹ xor: tava rojê, roj, xorşîd.

² dor bi cur: xeta lêva piyalê ku tiji mey e.

³ nobet: dor, rêz, sef.

⁴ cam: piyale, qedeh, kûzika şerabê.

⁵ bo meze: mezekirina badeyê, vexwarina meyê di camê da.

⁶ xwestibe bigire: dixwazî dinê milkê te be û bistîne.

⁷ şevnem: şebnem, şevcem.

⁸ kûzik: cêrê şerabê, îro wek şûşa şerabê.

⁹ raz: sir, esrar.

¹⁰ baz: dîsa, dubare, ducare, careke din.

¹¹ lo'bet: dilbera genc û ciwan, wek bûk, evîndar, delal, rind û bedew.

¹² edem: nebûn, ne hest, nîstî, tunebûn.

Ey dil wek heqîqeta cîhanê hebûna mecazî¹³ ye
 Gelekî, çi dixwî vê xem û rencên¹⁴ dûr û dirêje
 Can bi qeza¹⁵ bispêre û bi derd ra hev bike
 Ku ev qelema çûye ji bo xatirê te nahê dubare

Dipirsî ku ev nexşa¹⁶ mecazî çi ye
 Heke ji heqîqetak heye bêjim dirêj dibe
 Nexşeke pedîd¹⁷ hatiye ji deryayê
 Û hîngah dikeve bêbinîya¹⁸ deryayê cardinê ye

Ji hemû kesên ku mirin û çûn ji vê rîya dirêj
 Dîsa werin, divên ku me ra bibêjin raz¹⁹
 Agahdar bin li ser vê du rîyan ku pêwîst e
 Tişteki cî da nehêlin, ku cardinê nahî dinê baz²⁰

Ev çerxa ku bi kesekî ra navêje raz
 Kuştîye bi sitem²¹ hezar Mehmûd û Ayaz
 Meyê vexwe ku nabexşe bi kesî re emrê dirêj²²
 Û kesê ku diçe ji cîhanê dîsa nayê baz

¹³ mecazî ye: beşer ê herin û cîhan ê bimîne.

¹⁴ renc: xem, derd, nîgeranî.

¹⁵ qeza: qeder, rûdaw, qewûmîn, serhatî, sernivîşt, ênînivîs.

¹⁶ nexşe: resm, xerîte, rê û revîş, rê û nexşe, rêbaz, terh, proje.

¹⁷ pedîd: peyda bûn, eşkere bûn, keşf kirin û bûyîn, zahir û aşkar.

¹⁸ bêbinî: derya bêbinî yanî kûrahîya binê deryayê.

¹⁹ raz: raz û esrara vê dinê, raza ku heya îro ne qewûmîye kesek were dîsa.

²⁰ baz: dubare, ducare, dîsa, yanî dîsa nahî vê dinê.

²¹ kuştîye bi sitem: yanî çerxa felekê zalim e û hezaran mirov kuştî ye.

²² dirêj: diraz (dirêj ku bi soranî û farsî ye). Dirêj ku j bo xatirê qafiyê ye.

Hevkara me Mehtab Îdelî ji bo vê hejmarê hevpeyvînek bi Beyhanê Şahîn re kiriye: Dîtî û gotinên wî yên li ser zimanê kurdî pirsîye. Ji ber vê yekê jî me destkarî di gotin û zimanê Beyhanê Şahîn de nekîrîye. Bersivên wî çawa bûne, me jî weng weşandiye.

Red.

“Hemû zmanên Kurdî ji Proto-Kurdî tîn û Proto-Kurdî 3770 salî ye”

Hevpeyvîn: Mehtab Îdelî

Beyhanî Şahîn kengê û çawan dest bi nivîsîna kurdî kir?

– Di destpêka salên 1990an da min bi giştî bala xwa dayî bû zmanê kurdî. Vê mijulîya min bi vî hawî heta sala 1995an berdewam kirî bû. Paşê di sala 1995an da min li ba Zangeha Zürichê (Swîsre), li ba Prof. Dr. George Eugene Dunkel û pêra jî degal Prof. Dr. Michael Janda dest bi xwandina beşa “Zmannasîya Hindî-Ewropî Ya Rûberîhevkirinê”, du sal paşê jî min di sala 1997an da li ba Zangeha Bernê (Swîsre), ligel Prof. Dr. Roland Biemeier dest bi beşa “Filolojiya Hindî-Îranî’yê” kir (Indoiranische Philologie).

Te di vê navberê de xebatên xwa yên li ser zimanê kurdî dan berdewam kirin yan na?

– Herê, ji wê gavê û pê da min ligel xwandina xwa dîsan dest bi “Bêjenasîya Zmanê Kurdî Ya Dîrokî” jî kirî bû. Pêra pêra min dest bi berhevkirina meteryelên bingehîn yên jibo bêjenasîya zmanê Kurdî kir. Min digel bêjeya Kurdî ya sereke dîsan peyvên ku di zmanên din yên Hindî-Ewropî da pê va girêdayî bûn, yan jî heman peyv bûn, bêtî ku ligorî hoyên zmannasîyî zêde pê ra mijul bibim, di bin peyva Kurdî ya sereke da tomar dikirin. Di vê navberê da di nav van bîst û şeş salên buhurî da li ba min nêzzîkî çar sed rûpel meteryel hatî bûn ba hev. Her çendin ev jibo min cîyê dilxwaşiyê bûyî bibe jî, lê li hêla din jî xeternakîya ku ez van meteryelan ligorî pîvanên zmannasîyî yên akademîk di ber çavan ra derbaz nekim, bi hêvîya ku rojekê dîsan lê vegerrim, hilo li şûna xwe bihêlim û destê xwa nedimê jî, hee’bû. Ji piştî van salên dûr û dirêj ez careke din lê vegerrîyam û bi wan meteryelan ra mijûl bûm. Û min mijar careke din ji nuh va di ber çavan ra derbaz kir. Lê axir di dawîyê da, ji piştî vê pêvajoyê, di serê min da birryara lêkolîn û weşandina ferhenga “Bêjenasîya Zmanê Kurdî Ya Dîrokî” bi temamî cîyê xwa girt.

Tu dikarî ji me ra hindekî behsa naveroka ferhenga “Bêjenasiya Zmanê Kurdî Ya Dîrokî” biki?

– Ferhenga “Bêjenasiya Zmanê Kurdî Ya Dîrokî” ne ligorî rêza elfebaya zmanê Kurdî ji tipa “a”yê deşt pê dike û bi ya “z”yê jî bi dawî dibe. Her çendin ev vegotin wekî bê planî xuya dike jî, lê ji ber îmkânên heyî yên bi sinorkirî rîyeka mecburî ye.

- Zaraveya “Kurdîya Kurmancîya nuh” ewê wekî zaraveya sereke were bir kar anîn.

- Bêjeyên zmanê Kurdî yên resen ewê bingeha vî karî pêk b’înin, wm.:

bask, mîh, mehîn/meyîn, hêl, bijîşk, deşt, nahal, nimêj/nivêj/limêj/nimê, keç, jin, jî/jîn/jîyan, ga, mange, xwang/xuşk/xuç/xweh, derî, mal, çav, çem, dîtin: di-bîn-e, havitin: t-avêj-e, pez, şivan, nav, raştû hwd.

- Peyvên zmanê Kurdî yên bingeîn û resen ewê tenê ligorî rastnivîsa/ortoxrefîya zmanê kurdî, xronolojiya dîrokî û zmannasiyî werin nivîsîn, wm.:

aştî (ne aşitî/aşitî!), hêl (ne alî), bend-ik(ne ben-ik!), parastin: di parêz-e (ne paraztin!), kuştin: di-kuj-e (ne kujtin!), ezman/esman/asman (asîman!), herê (ne erê!), henî (ne enî!), peyv/peyvî (ne peyiv!), nahal (ne newal!), handa/henda (ne wenda!), dîsan (ne dîsa!), çawan/çiton (ne çawa/çito!), hêsan(ne hêsa!), kun (ne qun!), xwandin: di-xwîn-e (ne xwendin!), standin: di-stîn-e (ne stendin/sitendin!), strîn/striyan/strandin: di-strîn-e (ne sitirîn/sitirîyan/sitirandin!), raşt (ne rast!) û hwd.

- Peyvên ku di zaraveya Kurdîya Kurmancîya nuh da tunin, lê heger di zaraveyên din da heyî bibin, ewê wekî bêjeyên sereke di ferhengê da şun bigirin, wm.:

Kukirdkî. *dew* n./*dewe* m. “gund” <ku Kirdkiya kevin* *dahyu* <proto-Kurd.**dasyu*- (Avestiya kevindaxiiu-m. “welat”, Avestiya ciwan. *dayhu*-, *daighu*-, daxiiu- “welat, nişteciyên welatekî, gel/xelk” <arpaş. **dasyu*-, Farsiya kevin *dahyu*-m.“welat, herêm, dever”, Farsiya nuh *dih*“ welat, gund”, ved. *dasyu*-n. “dijminê xwadeyan, dijmin, dêv/hefrîd/hut”û hwd.).

- Peyvên ku ji zmanên biyanî ketine nav zaraveya Kurdîya Kurmancîya nuh, ewê wekî bêjeyên sereke di ferhengê da neyên bi cî kirin, li berevajî vê li şûna wan (heger heeyî bibin) ewê heman bêje ji zman û zaraveyên Kurdî yên din werin bi şun kirin.

Kurdiya Kirdkî. *dês* n. “diwar/dîzar” < Kurdiya Kirdkiya kevin **daysa*- (Avestiya ciwandaêsa- n. “nişan, şanî, elamet” < Ariya paşîn **dayça*-< Hîndî-Ewropî **deyk*-o-, ji kiriyara **deyk*-“nişan dayîn” (pehl. *uz-dēs*“put” < Medî, ved. *desa*-“herêma cîhanê, cî, war, şun, herêm, dever” û hwd.

- Peyvên zmanên biyanî yên ku paşê ketine nav zmanê Kurdî, ewê ligorî giraniya xwa ya di zmanê Kurdî da di nav ferhengê da werin bi şun kirin.

Kurdiya Kurmancî *tofan* < Çîntai *fung* “bayê mezin”.

Kurdiya Kurmancî *meşk* < Aramî *maška*- “çerm” û hwd.

Di ferhenga te da hindek peyvên ku cuda hatine nivîsîn bala min kişandin. Tu ê ji me ra hindekî behsa sedemên wan bikî? Mînak: Zman (ne ziman), hee’bû (ne hebû), heeyîbibin (ne hebin), baa (ne ba), xwa (ne xwe) û hwd.

– Bêguman ev mijareke dîrokî û fonolojîk e. Jiber ku ez formên van peyvan yên kevin dizanim û her weha bi fonolojiya zmanên Kurdî yên nuh bi hay im, loma hewl didim ku teşeyên resen yên Kurdî bi kar b’înim. Mixabin di vê sedsala dawiyê da sistemên dagirker yên Tirk, Ereb û Farsan ziyaneke mezin dan zmanê Kurdî. Hindî tşkiliya Kurdan û zmanê Kurdî gêhiştîya asteke pêrûpêrîşan. Divêt rê li ber vê tşkûnê were girtin. Teşeyên raşt yên di nav devokan da divêt werin zelal kirin, daku bila bikarin di nav zmanê rojane da bikevin nav bazarê.



Ji bo te ziman çi ye? Pîvanên zimên çi ne? Kengê mirov dikare ji zimanekî ra bêje ew ziman e?

– Zman aleta herî esasî ya xwa îfadekirinê ye. Bê zman meriv hew dikare di vê asta ku em îro tê da ne, bijî. Ruhî û psîkolojîk meriv hew dikare bê zman li ser tendurustîyeke saxlem jiyana xwa bidomîne. Zarok bê tşkiliya axaftinî nikarin bijîn, dimirin. Li ba mezinan jî eynî pîrgirêkên tendurustîyê ruidin.

Zman aleteke biyolojîk û zindî ye. Ne meriv dikare bê zman bijî, ne jî zman dikare bê axaftin bijî. Jibo ku zmanek jî tunebûnê xelas bibe, divêt meriv tekez bi wî zmanî bipêyve, tenê û tenê wî zmanî di nav jiyana da bi kar b’îne. Li benda filan û bêvan rojê mayîn, seqetîyeke mêjiyê ya eletewş e, manîpulesiyonên bi hêşab in.

Heger di zmanekî da li dor 1.500 peyvan û her weha gramereke wî zmanî hee’be, ew wekî zmanekî serbixwa tê qebûl kirin. Di nav tekstên hemî zmanan da sed heb peyv ji % 50 wan peyvan pêk tîn. Yanî gava meriv di nav her zmanî da hinî peyvên ku herî zêde tîn bi karanîn dibe, dikare niviyê hemî tekstên bi wî zmanî fam bike.

Hinek peyvên birêz Şahîn wekî rasttir dibîne û di kurdîya Anatoliya navîn da jî tîn bikaranîn:



– Baar (ne bihar), bendik (ne benik), çakuç (ne bivir), dutin (ne dotin/doşin), ezman (ne asîman), hanîn (ne anîn), herd (ne erd), hêl (ne alî), hîro (ne îro), kuştin (ne kujtin), narî (ne naçî), nîvan (ne mêvan), şandin (ne şendin), xwandin (ne xwendin).

Tu ê ji me ra hindekî behsa zimanê kurdî û dîroka wî bikî?

– Zmanê Kurdî ne ji zmanekî pêk tê. Bi dehan zmanê Kurdî hee ne. Kurdî hemî van zmanan di nav xwa da dihevine. Hemî zmanên Kurdî jî ji Proto-Kurdî tên. Proto-Kurdî teqabulî 1.750 salên berî mîladê dike. Em vê yekê dikarin bi alîkariya fonolojiya zmanê Kurdî û zmanên din yê Aryanî pesend bikin. Kurdiya kevin teqabulî dema navbera 500 û 1.000 salên mîladê dike, ango tuşî serdema zmanên Medî dike.

Wekî zimannas (indocermenîst û indoîranolog), tu dixwazî li ser zimanê kurdî çi bibêjî? Tu rewşa zimên ya niha di rêziman û standardbûnê da çawan dibînî?

– Zmanê Kurdî zmanekî pirr bi hêz e, zengîn e. Lê mixabin Kurd jî vê zengîniyê bê hay in. Kurdan nekarî C. Berdirxan jî fam bikin. Bêguman Kurdan jiber nezaniyê zirarekî mezin dan xwa û zmanê xwa. Tevî ku haya kesî jî xususiyetên zmanê Kurdî tun e û tune bû jî, herkesî ligorî baweriya xwa “serraştkirineke şaş” kir, herkesî jî **hêlekê va zirareke mezin** daa zmanê Kurdî. Herkesî xwa zmannas hesiband. Li

ciyê ku ti zmannasek tune be û herkes jî xwa zmannas bihesibîne, ev tişteki pirr normal û kambax e.

Tu dikarî hindeki jî qala pirtûka xwa ya li ser “Nivîsarên Farsiya Kevin Yên Dariyus” biki? Te çima xwest van nivîsarên Dariyus wergerîni kurdî, armanca te pê çi bû?

– Min ev nivîsar jiber bûyerên diroki yên di dema Medya’yê da wergerrandin. Zilma ku doh hatiye kirin, îro jî berdewam dike. Doh Dariyus rêvabirên Kurdan li Hewler’ê bi dar va kirî bû, îro jî heman qetlîem di nav gund û bajarên Kurdan da berdewam dikin. Divêt Kurd vê yekê ti carî wekî qedera xwa qebûl nekin. Kurdan heta hîro deşt ji zmanê xwa bernedan, loma hîn ji hee ne. Lê rewşa îro ya zmanî bêbextiyeke mezin ya Kurdan nişan dide.

Dariyus 1. kî bû û jiyana wî çawa bû?

– Dariyus bi xwa dibêje ew Fars bûye. Lê navê bavê wî (Vištašpa) bi Medî bû. Çima? Em nikarin bi zelalî vê yekê vebêjin. Gelo ev tenê tesîra zmanê Medî bû li ser Farsan yan bi raştî jî ew bergîl Med bû? Heta ku belgeyên din peyda nebûne, meriv hew dikare tişteki bibêje, jixwa çi bûna wî ne girîng e, karê ku wî kiriye, girîng e.

Di derbarê jiyana wî da em tiştan nizanin, hemî înforsiyonên diroki yên mewcud di nav wan nivîsaran da hatine tomar kirin. Hêdî şîrovekirina wan jî li benda diroknasan e.

*Dârazava.us: xsâyaviya vazrka, xsâyaviya: xsâyaviyânâm xsâyaviya dahyunâm, xsâzaviya ahyâyâ bumiya Vistâspahyâ puça, Haxâmanisiya.

“Ez im Dârayava.us, keyê/şaxê mezin, keyê keyan, keyê welatan, keyê vê herdê, lawê Vistâspa, yekî Haxâmanis.”

*Vasnâ A.uramazdâha adam xsâyaviya abavam.

“Li ser niyaza/daxwaza Açuramazdâ ez bûm key.»

Ew nivîsarên Dariyus tenê bi farsiya kevin hatibûn nivîsîn yan bandora zimanên din jî li ser wî hebûn?

– Herê, bi zmanê Farsiya kevin hatine nivîsîn. Lê di nav van nivîsaran da meriv li gelek ciyan peyvên Medî jî dibîne. Jixwa ev pirr normal e, jiber ku demeke pirr drêj Fars di bin deşthilatdariya Medan da bûn, Medbûn şanaziyeke pirr mezin bû di dema xwa da.

Di van nivîsaran da mexseda Dariyus çi bû, dema te wegerrand, te kîjan mesaj tê da ditîn?

– Bi van nivîsaran Dariyus dixwaze tenê xwa nemir bike. Meriv nikare înkare bike, heta aştêkê kir ji. Hêdî em çi dikin bikin, ev nivîsar hee ne û girîng in jibo serdema hê bihata nîqaş kirin.

Bandora medan li ser farsan û xelkên din yê li dorhêlê çi bû, di warê zimên û mijarên din da?

– Medan li ser hemî xelkên li Rojhilata Navîn tesîreke mezin kirin. Ne tenê zmanî, mesele siyasî, dinî, ekonomîk, zanyariyî, leşkerî, çandî û perwerdeyî. Di nav hemî zmanan da tesîra zmanê Medî mewcud e, mesele Medî **pari-dayza*- “bihişt” (ku îro di Kurdî da wekî *parîz/parêz* e), him derbazî zmanên Rojhilatî bûye (**İbrani** *partêz*, Erebi *Firdaws*) û him ji Yunaniya kevin *paradeis*, û jê pê va ji derbazî hemî zmanên din yê Ewropî bûye. Yan ji Medî **magu*- “sêrbaz”, ku îro di nav hemî zmanan da tê bi kar hanîn, peyveke Medî bû.

Mesele hemî sistêmên perwerdeyîyê yê li Rojhilata Navîn û Ewropê, li ser sistema perwerdeyîya Zerdeştî hatine ava kirin. Cihu bi xêra vê sistêmê henda nebûn û piştî du hezar û pênc sed salan vergerriyan welatê xwa. Heger Talmud’a Cihuyan ya ku li Babil’ê hati bû hafîrandin, nebûya (ku hingê Babil di bin desthilatdariya medan da bû), aniha me yê qet behsa Cihuyan nekira.

Gelo debîrên ku ew nivîsar nivîsî bûn med bûn?

– Di nav wan debîran da him Med û him jî debîrên ji milletên din hee’bûn, wm. Yunan, Asur, Akad, Aram û hwd. Lê ev sistema nivîs nivîsînê ji Medan hati bû girtin. Pişeya nivîs nivîsînê di dema desthilatdariya Medan da hee’bû û wekî pişeyeke esasî di nav sistêmê da ci girtî bû.

Ma farsan ji medan elfebe û nivîs wergirtî bûn û ji medan hînî nivîsîn û xwandinê bûn?

– Farsan di nav hemî nivîsaran da peyva Medî *ni-pišta*- “yê/ya nivîsî” (Kurdî *nivîşt*) û *ni-pays*- “nivîsîn” bi kar anîne. Peyva Farsiya kevin ya jibo xwandinê jî peyveke Medî ye, angê wekî *pati-fras*-“xwandin” e. Lê di eslê xwa da ev peyiv jî peyva *fras*-“pîrsîn” hatiye hafîrandin, kiriyara Kurdî *pîrsîn* heman peyv e. Di vir da mentelîteyeke pîr girîng xwa dide der, angê hînbûna *xwandinê* bi *pîrsan* va girêdayî bûyî ...

Te him di pirtûka xwa ya li ser nivîsarên Darîyus da û him jî di ya li ser “bêjenasîyê zimanê kurdî ya dîrokî” da qala pêwendîya kurdan û medan kirîye. Wek mînak te gotîye, “Di dema desthilatdariya împêratorîya Medan da li Medyayê bi dehan zman û zarave û devokên Kurdiya kevin hebûn.” Di pirtûka xwa ya li ser nivîsarên Darîyus da jî te gotîye, “Ew nivîsar bi qasî sê kilomêtroyan dûrî bajarê Kermanshah’ê, li navçeya/gundê Behistên ê ne. Di dema desthilatdariya Darîyus da ev der herêm û nişteciyeke xelkê Med bû. Wekî wê demê, hîro jî med, angî kurd, li vê herêmê nişteci ne”. Med kurd in yan kurd jî wekî gelên din xelkekî di nav medan da bûn? Wekî ku tu jî dizanî hindek kes jî dibêjin, med ne kurd bûn, yan jî eleqeya kurdan û medan bi hev ra tunebû. Te di van pirtûkên xwe da xwestîye hindekî bersivên wan jî bidî yan na? Tu ê bikarî vê mijarê jî bo me hindekî berfirehtir biki?

– Na, min nexwaşt ez bersiva kesekî bidim. Ev karên akademîk yê zmannasîyê ne. Di vê mijarê da bawer nakim ku bi kesên ku haya wan jî zmannasîyê, jî zmanên dema Îraniya kevin, jî zmanên Aryanî u Hîndî-Ewropî hee’be, ez bikevin nav axaftinên vîk û vala. Jibo axaftinekê, kême be jî, divêt zanîneke esasî hee’be. Med Kurd bûn û Kurd jî Med bi xwa ne. Ez mînakeke pirr, pirr piçûk bidim. Mesele di pirtûka Kârnamag ya bi zmanê Pehlevî (ango Frasiya navîn) da weha tê gotin: “Prensê Kurd Madîg”. Yanî navê prensê Kurd Madîg e û ev peyv jî raşterast mahneya “yê Med-î” dide, jî Mediya kevin Mâda-ya-ka- “yê Med-î” tê.

Med angî Kurd milletekî Hîndî-Ewropî bûn û Hîndî-Ewropî ne. Divêt Kurd rê nedin ku hindek xêrnexwaz di serê Kurdan da mebestên xwa yê fêlbaz cî bikin.

Ez hêvîdar im ku ewê bi lêkolîna min ya bi sernavê “Zmanên Medan” ev sefseteyên li ser kuçe û kolanan werin safî kirin.

Di dawîya sohbeta me da dixwazî çî bibêjî?

– Heger haya Kurdan jî zengîniyê wan yê dîrokî, zmanî, çandî, dînî, civakî, siyasî, leşkerî û zanyariyê hee’bûya, ewê Kurd ti carî di nav vê sefeletê da nebûna, Kurdan ewê ti carî ev sefeletî qebûl nekira.

Pêwistiya Kurdan bi çîrokên Kurdî hee ye. Pêwistiya Kurdan bi zmanê Kurdî hee ye. Ti milletekekî ku bê zman hee’be, tun e. Bê zman ti millet nikare hee’be. Yê ku milletekî dike millet, tenê û tenê zman e. Azadî û xelasiya kurdan ne bi îdyolojiyê heebû-tunebû va, lê bi axaftina zmanê Kurdî va girêdayî ye. Ji derî axaftina bi zmanê Kurdî Kurd ti carî nikarin jî tunebûnê xelas bibin. Ti berxwadan

nikare ji axaftina bi zmanê Kurdî mezintir û girîngtir bibe. Tenê şensekî Kurdan hee ye jibo ku tune nebin, ew jî bi rik û kîn axaftina bi zmanê Kurdî ye. Axaftina bi zmanê Kurdî ne luks e, bilakîs zeruriyeteke dîrokî, însanî û wîcdanî ye. Divêt Kurd ti carî tişteki tecawîzkarên xwa (psîkolojîk, fîzîkî û ruhî) qebûl nekin, meşru nekin di nav xwa û mala xwa da. Azadiya herî rewşa û mezin di zmanê meriv da veşartî ye.

Beyhanî Şahîn kî ye?

Beyhanî Şahîn di sala 1969an da li Bakurê Kurdistan'ê, li Orçil'a herêma Qoçgiri'yê (Erzingan) hatiye dinê. Di sala 1988an derketiye der, çûye Ewrupe'yê. Li Swîsre'yê li ba Zangeha Zürich'ê beşa zmanên Îndo-Ewropî, Îndolojî û li ba Zangeha Bern'ê jî Fîlolojîya Îndo-Îranîyê xwandîye, ango zimanê Aveştî, Farsiya kevin, Partî, Pehlevî, Farsiya nuh, Sogdî, Khotansakîya navîn, Vedî, Sanskrîtî, Palî, Prakritî, zmanên Nuriştanî, Hititî, Mitannî, Lîdî, Yunaniya kevin, Latînî û Gotî.



Beyhanî Şahîn

Di sala 2004an da têza xwa li ser zmanê Medî nivîsiye (bi Elmanî: Die Sprachen der Meder, Zmanên Medan).

Pirtûkên Beyhanî Şahîn:

1. *Lêkolîneke Qicîk Li Ser Zmên*, 1995, **Weşanên Firat, Stembol**
2. *Bêjenasîya Zmanê Kurdî -1- Ya Dîrokî*, 2020, **Weşanên NA, Îzmîr**
3. *Nivîsarên Farsiya Kevin -1- Yê Daryus*, 2020, **Weşanên NA, Îzmîr**
4. *Die Sprachen der Meder* (bi Elmanî: "Zmanên Medan" 2021, **Weşanên NA, Îzmîr**

Tiliya di kunmozê de!

Seyidxan Anter

Li dibiştana Brynäs, bi Eva re em ketin dersa polê çaran. Dersa me li ser mîtolojiya swêdiyan bû. Eva gelekî ji xwe razî bû û ewqasî jî bi xwe dadiket. Bêhemd, li şûna wêneyên mîtolojîk, yên nevîya xwe nîşanî şagirtên xwe da. Dûra lêborîn ji şagirtan xwest û dest bi dersê kir. Xala bingeîn ya mîtolojiya swêdiyan xweda û xwedawendên ASA ye. Di mîtolojiya girekîyan de Zeus çawa be, di mîtolojiya swêdiyan de jî Oden wisa ye. Li gorî mîtolojiyê, ji bo zanyariyê bi dest bixe û wê ji binê bîrê derîne, Oden çavekî xwe kiriye gorî.

Van demên dawî zana, lêkolîner û nivîskarên kurd wekî Bahoz Şawata, Evîn Çiçek, Mihemed Erzurumî û gelek kesên din, dest avêtine mijarên dîrokî, serpêhatî, wêje û mîtolojiya xwe bi xwe dinivîsin. Yek ji van berheman, di roja pitûkan ya UNESCO de, weşanxana APECê bi navê *Mala Zalê û Teyrê Sîmir* berhemek çap kir. Nivîskarê pirtûkê Amed Tîgrîs e. Amed Tîgrîs bêhtir bi berhemên xwe yên di derbarê ziman û perwerdeyê, kitêbên bi navên

Licê û Amedê naskirî ye.

Bi bejneke kin, gotinên giranbiha, meraqdarîyek zarokan û zanyariyek pîran, bi karê xwe rabûye û tiliya xwe kirîye kuna mozan. Wa xuya ye Ristemê Zal "xortê lîcî" terkîdinya" kiriye.

Tirkan bi filmê "Zaloğlu Rustem", Ristem kirine xizme xwe, ne tirk lê turkmen. Faris Ristemê Zal wek lehengê xwe dibînin. Hin nivîskarên kurd jî, bi kefteleft li dijî wê texrîbatê derketine û tûşî çewtîyên mezin bûne. Ristemê Zal anîne çiyayên dora Licê, çiyayên himber Farqîne, an jî mîna Amed Tîgrîs dibêje: "Ristem anîne Amedê, birine ber Pireya Dehderî, li Mizgefta Mezina ya Amedê pê nimêja îne dane kirin. Birine Xana Hesen Paşa ya ku di navbera salên 1572 û 1575an de hatiye çekirin çay dane wî..." Helbet mafê mirov û fantaziye heye, lê heyra Zerdest li ku û Mihemmed li kuderê!

Amed Tîgrîs, amedî birine Zibistanê an jî Sistanê, nêzikî Xorasanê, warê Mala Zalê. Û çaxa wan dibe wir,

em fêrî peywendîyên cîvakî û aborîya serdema kevnar dibin: "Ji her derê welêt û heta ji Amed, Hatûşa, Nînovayê dîwarbend, dartiraş, hesinkarên herî bi navûdeng û xwedî huner kom kiribûn. Bi sedan kole û dîl li ber destên wan dixebitîn. Bi gilare, qitor û mencenîqan kevir û mermerên mezin derdixistin qatên jorîn. Ji ax û xîz (qûm) rêyên evrazî çêkiribûn." Helbet mirov nikare bi çavên îro li doh binêre.

Dibêjin dîrok ne wek kopya xwe, lê mîna alimê rûs gotîye: bi kiras û rengêkî din xwe dubare dike. Çaxa em bala xwe bidin serpêhatîyên Kawayê Hesinger û Mala Zalê, em vê yekê dibînin:

Em carek din dibînin, di warê egîdî û kahramantîyê de ne hêsan e kes lingên xwe li yên kurdan bide.

Em carek din dibînin şahid, ji serdema mala Zalê û vir de, kurd ji xwe bêhtir bi kêrî xelk, ol û netewên din hatine. Û hîna jî, ji wê toz û gemarê me xwe têr daneweşandiye.

Nivîskarê *Mala Zalê û Teyrê Sîmir*, li nav bexçê ol, evîn, adet û folklorê kurdan derketîye seyrane.



Diyaloga bi Zerdeşt re, alîkarîya me dike ku em ola wî binasin. Ji derhêneran re matêrîaleke film û tiyatro pêşkêş dike. Vê pirtûkê, hestên evînî yên ji kurahîya dilên kurdan carek din fûrand...

Amed Tîgrîs nexşeyek pêşkêşî me kirîye. Nexşeyek ku piranîya me hay jê tunebû. Li hespê xwe siwar di nav sînorên mîtolojî, dîrok, çand û wêjeyê, di navbêna bûyer û fantazîyê de diçe û tê. Hespê wî lê germ bûye.

Îca te dil hebe ku tu mîtolojîya kurdan çêtir bizanibî û "moz bi te venedin" pirtûka *Mala Zalê û Teyrê Sîmir* ji te re alîkar e!

Rêya dirêj

Xizan Şîlan

Tîrêjên roja berbangê di awirên min de diçîrûsîn, dinya li min ronî dibû. Bayê serê sibehê rûyê min nermik nermik mizdida.

Li ser rêya dirêj û bêveger, bi gavên giran hêdî hêdî diçûm. Gêrikan li dû hev lez û bez dabûn xwe. Min gavên xwe bi baldarî diavêtin û nedixwast gêrik di bin gavên min de bimînin û bimirin.

Lê xelasbûna wan tunebû, hinek di bin lingên min de dihatin pelixandin. Ez dibûm kujerê gêrikên mesûm û hestên tawanbarîyê giyanê min dagirtibû.

Dengê pîpika keştiya li nav pêlên deryaya har asê mayî di guhên min de dikir zingezing.

Xişexîşa pelên daristanên dirinde nava dilê min diqetand.

Wiçewîça çûkên li ser daran wek nalîn û hawara dayikên şehîdan bû.

Rêya dirêj, hezkirin û xweşbînî li pişta xwe siwar dikir, şewqa çira

hesret û bêrikirinê vêdixist û agirê dilê evîndaran lê geş dikir.

Rêya dirêj, kirasê ramanên heqîqetê li mêjiyên kor dipêça. Ala azadî û serkeftinê li asta zinarên bilind li ba dikir.

Rêya dirêj, çirûskên dîlovanî û wijdanîyê pêşkeşî cihana derewîn dikir. Tovên hêvî û bawerîyê li hişkebeyaran direşand.

Govenda bûk û zavayan li meydana şahîyê digerand. Stranên egîd û mêrxasan li ser çîyan dilorand.

Rêya dirêj, bêhna kulilkên bihara rengîn li derdora çaxên genî belav dikir. Êşa birîna laşên sedsalan dikewand û jiyana bi rûmet li mirovahîyê dibexşand. Dergehên aramî û kêfxweşîyê li ber mezlûman vedikir.

Rêya dirêj, ber bi rizgarîya rengê keskesora asoya welatê min ve diçû.

Ez li ser rêya dirêj û bêveger, bêwestan û bêrawestan dimeşim.

Rojên xurbetê

hevîrê şev û rojên xurbetê
bi kul û keserên bêderman hatiye
strihandin
çavên heyva melûl
êşa firmêskên westiyayî
dirijîne
çûkên xewna şevên rût
ji hêlîna qefesa qelişî
fîrar kirin
xeyalên baskşikestî şeveder man
ji pozê serdemên genî hêrs û zilm
diçilike
qeyika daxwaz û bêrikirênên zelal
li peravên gola şêlû
asê ma
xumîna bayê nermik
di guhên demên ker û har de
qîreqîr e
çermê enîya bîranînên ciwanîyê
qermiçî
pelên hestên şeşemîn
li ber pêlên bayê deryayê
berba bûn
peşkên barana bereketê
li ser zevîya hesreta salan
nebarî

di hinavên min yên peritî de
okyanus dikelin
ji parzûna hêviyên şên û şîn
xemgînî dipale
kulîlkên baxê rûkenîya zarokên sêwî
zerikîn
dergehê meyxaneyan
ji min re bûn rawestgeha
êvarên sergêjok
janeke zirav di dilê perpitî de
hate meyandin
ez
nivhelbestvanê reşguliyên
sîya şevistanên melûl im
li çolistanên ziwa gerokê
dilperîşan im
li tenêtiya ramanên eşgiran
kûr kûr diponijim
her şev
bi sîya bêdengîya lal û fetisî re
dikevim nav galegalan

Xizan Şîlan

Peyv êdî xwedî hejmar in

Rojvan Enes

Êdî tenê biqasî min peyv hene
Biqasî dilê min.
Rêya peyvên xerîb ji m' pir dûr e
Di nav demên wek sedsalan,
Ez qet fêrî peyveke nû nebûm.
Pir qels ma zimanê min,
Nikarim ya dil da ji te r' bibêjim.
Teyîsîna ruhê min,
Çi dabe min,
Ez ew im.
Dinyayeke din nizamim.
Eger tu zimanê min meraq bikî,
Xwedî hejmar in peyvên min
Yek bi yek dikarî bihêjmerî.
Bîr bûne;
Hezkirin, xweşî, şadî...
Gewrîya min de olan didin peyvên;
Tenêtî, reşbînî, xemgînî...
Ez ê wan jî ji bîr bikim
Ji nû ve fêrî zimên bibim.
Ji nû ve,
Hez bikim.

Cotek gulî*

Muzaffer Özgür

Di deştêpêka sedsala 19an de li deşta Îslahîyê û di nav herêma Çiyayê Kurmênc de eşîrên kurdan wek koçber dijîn. Eşîra celika jî wek eşîrên din, li zozana Guruna Sêwasê û herêmên ku zivîştan lê derbas dikirin, diçûye û dihatîye. Li germîyana deşta Îslahîyê jî eşîrên kurdan hedî hedî gund ava kirine û niv niştecih bûne.

Demek hatîyê, desthilatdarîya Osmanîyan ji bo eşîra di bin rêvebirîya xwe de bihêle û ji wan bac û leşkeran bigire, ferman derxistiye û li ser vê fermanê eşîr belav bûne. Malbat bi du-sê alîyan bûne. Birek li Çiyayê kurmênc, yek li deşta Îslahîyê û yek jî li zozana Sêwasê maye. Talankirina mal û milkê wan ya ji aliyê dewleta Osmanî ve qet xelas nedibûye. Perîşanî, belangazî û bindestîyê, eşîr birîndar û şelpeze kiriye.

Wê demê lawê Silê Qizê, Heso û malbata wî, ji ber tevlêkirina pezê xwe yê xalanê xwe û bi wan re jî çûyîne zozanê, li wir mane. Ji

malbata xwe ya Îslahîyê bi dûr ketine. Ap û malbata wî li Îslahîyê, xalan jî li zozanê bûne niştecih.

Dem derbas bûyê û Osmanîya bi fermaneka nû eşîr carek din kirine koçber û Celikî jî wek eşîrên din, li deşta Haymanê gund ava kirine. Demsal hatine, çûne û sal derbas bûne, Dewleta Osmanî belav bûye, şer xelas bûye û li Anatoliyê dewletek nû hatîye avakirin.

Li deşta Haymanê, li gundê Celika, Heso wek gundî û merivên xwe bi pez re mijûl bûye û şivantî dikirîye, sê lawên wî jî alikarîya wî dikirine.

Ji rojan rojekê lawên Hesê, Mehmet, Omer û Mestê di nav çêra li ber Çalî Sor de kerîyê pez û bizin diçêrandine. Bi hewte hewta kûçikan re ew dibinin ku rêwîyekî berva wan têye. Ew kûçikê xwe yên pêz aşî dîkin û rêwî nezî wan dibe û silavê dide wan. Rêwî bê hal û birçî bûye. Ew ji wan av û xwarinê dixwaze lê, ew ji ber ku bi cilên leşkerîyê bûye, hersê bira tirsîne. Kesê hatî li şûna

*Va hekata ji jiyana malbata min e.

xwe rûdine û ew ji xwe didin kêleka wî. Mehmet ji têra li ser kera xwe, kûzê avê tîne û dirêjî rêwî dike û pirs dike:

“Tu qaçax î? Siftê ji me re bêjî, tu kî yî, ji ku têyî, terî ku, çima ji leşkeriyê revîyayî?”

Rêwî kûz dadine ser xwe û têra xwe avê vedixwe. Bi qulteqluta avê re her sê bira li çavên hevûdu mêze dikin, dilê wan bi rêwî dişewite. Rêwî dema ji avê têr dibe, dest bi bersiva xwe dike:

“Ez î ji Îslahîyê me û heft sal in li merkeza Konyayê leşker im. Ez ji leşkeriyê revîyam. Ez î herime Haymanê gundê Celika, li wir xwanga min, merivên min hene.”

“Merivên me ji li Îslahîyê hene”, dibêje Omer.

Xorta dizanîn ku malbata wan û xalên wan li welatê jêr in. Lê çûyîn hatin qet tunebûye. Dayika wan her êvarê bi dilekî zîz ji wan re wek çêrok behsa malbata xwe; dayik, bav, bira, ap, xalan, pismam û yên din, behsa eşîra xwe dikirîye û şîna xwe qet kêm nedibûye. Mehmet dipirse:

– Ji we re mala kê dibêjin?

– Li Îslahîyê ji me re dibêjin Mala Qizê.

– Em ji mala Silî Qizê ne!

– Navê dayik û bavê we çi ye?

– Bavê me Hes e, dayika me ji Fat e.

– Navê min Selman e. Ji min re dibêjin Kazankiran, ez xalê we me.

Dema navê wî dibîzin, ew kelecânî dibin û kurik terin destên wî û eşkere dibe ku xal û xarziyê hev in. Xwarina xwe derdixin didin xalê xwe û bi ser hev de digirîn. Ji nuşka va Mest radibe berva gund dimeşe. Tere mal, dibîne ku li ber sîya dîwarê mala xalê Çavûş jin, mêr cimâtî rûniştiye. Ew bi kelecaneke dibêje:

– Etê xalê min Selman î hatiye! Birayê te!

– Selman çi ye lawooo? Were solixa xwe bigire, ka çir bû ji me re bê!

Mest qala hatina xalê xwe ji malbata xwe re dike. Her kes di nav kelecaneke de dimê. Li çolê ji Mehmet, li ber pêz dimê û bîstekê bi şûn ve Omer û xalê xwe tên gund. Li ber mala wan galegalek belav dibe. Dema Fata jina Hesê, birayê xwe dibîne li ber deriyê mala xwe bîlva (bîrva) tere. Jin, wê tevûhev digirin dibin hundirê malê. Mezinên gundê Celika tên ber mala Hesê. Her kes ji wî pirs merlixên xwe dike. Ji ber ku ew heft sal in leşker e, nikane bersiva wan bide. Bîstekê bi şûnve Fat tê ba birayê xwe, ew dikevin hembêza

hev. Ew hesreta salan, bi şînê di nav dilopên girî de dirijînin. Fat Selmanê birayê xwe yî biçûk li kêleka xwe de dide rûnişkandin û destê xwe dide ser milê wî. Ew wî paç û bîhn dike. Selman ji wan re qala gund û eşîra wan ya heft sal berê bidûrketî dike; yên mirî, yên mayî... Yek pismamê xwe dipirse, yek xalanê xwe dipirse, yek xaltîya xwe dipirse. Pirs û bersiv heta evarê didin du hev.

Selman hesretîya gundiyan Celika kêr dike. Êşa wan sar dike. Ew salekê li mala xwanga xwe, li gundê Celika dimîne. Teve gundiya kar dike. Êdî dibe yek ji wan. Mezinê gund daxwazin wî bizewcînin, lê ew qebûl nake. Her dem dibêje: “Ez ê herim welat, dayîka min û malbata min li benda min in.”

Rojekê ji rojan ji qeza Haymanayê leşker tî gund û behsa efkirina kaçaxan dikin. Mixtar evarê xeberê dide Selmên. Dema Selman vê xeberê dibîze, şa dibe û bi mezinê gund re dibêje: “Edî ez herim welat, rêya min vebû.” Çend rojan xwe amade dike, xatirê xwe ji gundiyan dixwaze, derdikeve rêwîtiya deşta Îslahiye.

Roj derbas dibin, Selman digihîje gundê xwe, Karahoyûka Kulxêş. Ji ber ku heyşt salan zêdetir derbas

bûne û ew bi şûnve vegehiyayê, mezinê gund li mala bavê Selmên tî ba hev. Bi jin û mêran şîneka giran dikin. Ew jî, hekata xwe bi kelecaneke re ji malbata xwe û gundiyan xwe re qal dike. Paşîya pirsan xelas nabe. Nêzî du heftan her roj bi qalkirina xwe, hesretbûna gundiyan ya ji bo merivên xwe yên di koçberiyê de wenda bûne, kêr dike Selman. Pismam, pismamên xwe, xal, xarziyên xwe, met û xaltiyên xwe dipirsin gundî û merlixa wî. Hesreta bêwelatbûnê, êş û kulên surgûn û koçberiyê, di nav gundiyan de carek din derdikeve holê. Ji wan re behsa gundê Atkafasiyê, Kirkpînarê, Hesarê û Kutuga dike. Behsa mezinên sax û miriyan dike. Rewş û gund avakirina wan, deşt û zozanên wan dike. Qala eşîrên cîran û gundên wan dike.

Dayîka wî Qizîk, ji ber ku malbata keçîka xwe koç û surgûnî Haymana bûne, kezeb şewitî bûye. Ji ber ku birîn û êşa wê vebîye bi rojan şînê dike. Qet ranakeve. Bi şîn û girî li ber mala xwe digere, bîhna xwe teng dibe, nakeve mal. Malbat li ber xwe dide ku wê aş bikin, lê nikanin.

Demsal derbas dibin, di şeveka zivistanê de Selman û dayîka xwe Qizîk biryarê didin ku herin

Haymanayê ba Fatê. Bihar tê, li deşta wan kulîlk derdikevin, tîna ro dinyayê germ dike. Daxwaz dikin ku biryara xwe bi cîh bikin. Selman tere gundên Komira, Kemeza, Ketrancîyê û Toplemê bi merivên xwe re li ser rêwîtiya xwe agahdarîyan digire. Rêwîti dûr û dirêj e û mirin û kuştin heye. Ji bo pîrejinekê jî hîn bi tirs û zehmet e.

Selman bi rêya merlixa xwe li Entabê hebûna nas û merivên xwe dibihîze. Tere Entabê ba wan. Kesekî merlixa xwe li gundê Kutuga dijî, nas dike. Ew kes merivê mala Gumê bûye. Carcaran bi xwe jî bi karwanên xwe berve deşta Anatolîyê çûbûye. Tucar bûye û bi karwana hêştiran ji deşta Anatolîyê xwê dibirîye Helebê. Selman li ba wan dimîne û daxwaza xwe bi wan re dibê. Ew şert û mercên rêwîtiyê tînin zimên û ew qebûl dike.

Selman vedigere gund û du hespan bi zîn û zengîyê amade dike. Qiz ji bo merlixa xwe tune, hevreşîmê ji Şamê hatî, tizbî, nênik,

çend cil û berga dike çalekî ku wek dîyarî bide wan. Ew roj tê û bi karwana xwê re derdikevin ser rêya deşta Anatolîyê. Roj terin, hefte terin, digihîjin merkeza Canbegan. Bi alikariya çend kesan jî, li dor êvarekê tîna gundê Celika.

Li gundê Celika carek din şîn tê kirin. Hesretîya koçberîyê, êş û jana wê, wan diêşîne. Qizik û Selman çil roja li ba merlixa xwe dimînin. Lê rojek tê, dema vegeerê ye.

Qizik gulîyên xwe dibire dide keçika xwe Fat ê, Fat jî gulîyên xwe dide dayîka xwe. Qizik di nav malbatê de, bi şîna kirî re bi keçika xwe re dibêje: “Ez mirim, ma gulîyên te dînin ser sîngê min. Fat jî vê daxwaz dike. Ji gundîyan, malbat û merlixa xwe xatirê xwe dixwazin û bi karwana xwê ve derdikevin rêya Îslahîyê.

Çend salan bi şûnve li gundê Karahoyûka Kulxêş, Qizik tere ser dîlovanîya Xwedê. Malbata wê cotek gulîyên Fatê didin ser sîngê wê û wê kefen dikin.

Kitêbên kurdî yên dersê ji weşanxaneyê Apecê

NEWROZ

Mala Zalê û Teyrê Simir

Ma tu Mam Mendo û Findo Nas dikî?

Pirtûka xebatê ya Mem û Zînê

HÊSTIRÊN GRANIYÊ

Ansiklopediya Zarokan

Pîyî Kûrêwîdîrî

Edebiyata kurdî

Xwendin û Xebatê Bêdeng

Lisa otobusê dîpê

Nîsa Nêkîzîdîyî

KURDÎ

HEYWAN

Nivîsên xwendekarên - ji dersên kurdî - J. Ihsan Espar

Herfên alfabeya min

Manga Bîrûndar

Efsaneyê Werzan

GILOK

GOTÎNÊN MIN ÊN PÊŞIN

Pippiya

Morîs

Bîrêyê Emmayê nexweş e

Pirtûka RINDO

Ture

GILOK Pirtûka min a xebatê

Xuşka min li ku ye?

Sîyabend û Xecê

Pirtûka xebatê ya Sîyabend û Xecê

a apec forlâb

<http://apecpublishing.com>


Postadress
Box: 8121
S-163 08 Spånga / Sverige

Besöksadress
Mjölнарstigen 1-3
163 41 Spånga

Telefon
08-761 81 18
E-post: info@apectryck.se



Ni som vill stödja Stiftelsen–KAN
swishar till nedanstående nummer.
**Xêrxwazên ku bixwazin alîkarîya Waqifê bikin
ji vê numra Swishê re bişînin.**



123 356 67 91

Swish–nummer

www.stiftelsenkan.com • info@stiftelsenkan.com

www.birnebun.eu